



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**LI GORÎ RÊBAZA VLADIMIR PROPP, ANALÎZA ÇEND ÇÎROKÊN
HERÊMA COLEMÊRGÊ**

Yasin Duran

16711010

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa Öztürk

Mêrdin - 2019



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**LI GORÎ RÊBAZA VLADIMIR PROPP, ANALÎZA ÇEND ÇÎROKÊN
HERÊMA COLEMÊRGÊ**

Yasin Duran

16711010

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa Öztürk

Mêrdîn - 2019



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**HAKKARİ YÖRESİNİN BAZI MASALLARININ VLADİMİR PROPP
YÖNTEMİNE GÖRE ANALİZİ**

Yasin Duran

16711010

Danışman

Doç. Dr. Mustafa Öztürk

Mardin - 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ’NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Li Gorı Rêbaza Vladimir Propp Analîza Çend Çîrokên Herêma Colemêrgê*” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

20.06.2019

Yasin DURAN

KABUL VE ONAY

Yasin DURAN tarafından hazırlanan “*Li Gorî Rêbaza Vladimir Propp Analîza Çend Çîrokên Herêma Colemêrgê*” adlı çalışma, savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oy birliği / oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

Başkan : Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ

Danışman : Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Yukarıdaki İmzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

Doç. Dr. Yunus CENGİZ
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

PÊŞGOTIN

Tiştta ku nasname û zimanê gelekî zindî digire folklorê wî gelî ye. Folklorê kurdan gelekî dewlemend e û tiştta herî girîng e ku heta niha jî nasname û zimanê kurdan zindî digire. Ji ber ku kurmancî heta niha nebûye zimanê fermî, di bin bandora zimanên din de roj bi roj bi ber jibîrkirinê ve diçe. Ji bo ku kurmancî dewlemendir bibe divê lêkolînên li ser folklorê kurdan dihêne kirin zêdetir bibin. Heta niha li ser qadên cuda yê folklorê lêkolîn hatine kirin. Ji qadên folklorê yekê herî girîng çîrok in. Li ser çîrokên kurdî di mijarên cûrbecûr de lêkolîn yê hatine kirin bes lêkolînek rêk û pêk li ser mijara me nehatiye kirin. Lê ev lêkolîne têrê nakin. Divê xebatên komkirina çîrokan û hêmanên din yê wêjeya devkî gelek zêtir lêbihên û bi lez bihêne kirin ji ber ku heke di wextekê zû de ev xebate nehatine kirin hêdî hêdî dê hemî hêne jibîrkirin û tiştêk namînîtin ku bihête komkirin.

Ev lêkolîne li ser çîrokên derasayî yê herêma Colemêrgê ye. Armanca vê lêkolînê ew ku em bibîbin ka çîrokên derasayî yê herêma Colemêrgê li rêbaza Vladimir Propp diyarkirî tê an ne. Ji bo vê lêkolînê li gund, navçe û navenda Colemêrgê ji 12 kesan 40 çîrok hatine berhev kirin. Lê ji ber ku lêkolîna me li ser çîrokên derasayî ji van 40 çîrokan 10 çîrok hatine hilbijartin. Çîrokên hatine hilbijartin ka çîrokbêjî çawa gotibe wisa hatine nivîsîn çî guherîn lê nehatine kirin. Piştî nivîsîna metnê çîrokan rêbaza Propp lê hatiye tetbîq kirin.

Li gorî vê lêkolînê em dişên bibêjin ku çîrokên derasayî yê herêma Colemêrgê hin kêmasî hebîn jî bi piranî li rêbaza Propp tî. Ji bo ku em bişên bibêjin ka rêbaza Propp li hemû çîrokên kurdî yê derasayî tî an na divê li gelek herêmên kurdan ev lêkolîne bihêne kirin û rêbaza Propp li gelek çîrokên dî bihête tetbîq kirin.

Ji ber harîkarî û rêberîya di her merheleya vê lêkolînê bo mamoste Doc. Dr. Mustafa Öztürk gelekî spas dikim. Ji bo parêzkarên folklorê kurdî vebêjên çîrokan, ji ber vegotina çîrokan û harîkarîyên wan gelekî spas dikim.

Yasin DURAN

Mêrdîn – 2019

KURTE

“Li Gorî Rêbaza Vladimir Propp Analîza Çend Çîrokên Herêma Colemêrgê”

Ev lêkolîn, li ser çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê ye. Armanca vê lêkolînê ew ku em bibîbin ku çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê li rêbaza Vladimir Propp diyarkirî tê an na. Di vê lêkolînê de deh çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê, li gorî rêbaza Vladimir Propp hatine analîzkirin.

Lêkolîn ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de di derbarê çîrok û çîrokên derasayî de agahiyên giştî û rêbaza analîza çîrokan a Vladimir Propp cih digire. Beşa duyem beşa herî girîng a lêkolînê ye. Di vê beşê de rêbaza analîza çîrokan a Vladimir Propp li çîrokan hatiyê tetbîqkirin û li gorî vê rêbazê analîza çîrokan hatiye kirin.

Di encamê de li ser analîzên çîrokan nirxandineke giştî hatiye kirin. Di encama vê nirxandinê de xalên ku li rêbaza Propp tên, nayên û xalên li rêbazê hatîne zêdekirin, hatîne diyarkirin. Lêkolîn di derheqê mijarê de bi hin pêşniyaran hatiye qedandin.

Peyvên Sereke: Vladimir Propp, Fonksîyon, Çîrokên derasayî, Analîz, Colemêrg.

ÖZET

“Hakkari Yöresinin Bazı Masallarının Vladimir Propp Yöntemine Göre Analizi”

Bu çalışma Hakkari yöresinin olağanüstü masalları üzerinedir. Çalışmanın amacı Hakkari yöresi olağanüstü masallarının Vladimir Propp’un masal çözümleme metoduna uyup uymadığını tespit etmektir. Bu çalışmada Hakkari yöresinin on olağanüstü masalı, Vladimir Propp’un masal çözümleme metoduna analiz edilmiştir.

Araştırma iki bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde olağanüstü masallar hakkında genel bilgiler ve Vladimir Propp’un masal çözümleme metoduna yer almaktadır. İkinci bölüm masalın en önemli bölümüdür. Bu bölümde metinleri verilen masallar Propp’un masal analiz metoduna göre analiz edilmiştir.

Sonuç bölümünde yapılan masal analizleri üzerine genel bir değerlendirme yapılmıştır. Yapılan değerlendirme sonucunda Propp’un masal analiz metoduna uyan, uymayan ve metoda yapılan eklemeler belirtilmiştir. Araştırma konu hakkında bazı öneriler ile sonlandırılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Vladimir Propp, Fonksiyon, Masal, Analiz, Hakkari.

ABSTRACT

“The Analysis of Some Hakkari Region Folk Tales According to Vladimir Propp Method”

This study is on unusual folk tales of Hakkari region. The aim of this study is detecting whether unusual folk tales of Hakkâri region suit on Vladimir Propp Method or not. In this study, ten unusual folk tales of Hakkâri region are analysed according to Vladimir Propp Tale Analysis Method.

This research is shaped by two chapter. In the first chapter, it gives general knowledge about unusual folk tales and Vladimir Propp Tale Analysis Method. The second chapter is the most important part of the study. In this chapter, the given passages of tales are analysed according to Vladimir Propp Tale Analysis Method.

In the result cahpter, a general evaluation on analysed fairy tales is done. According to results of evaluation, it is stated that the tales suit or are not suit on Vladimir Propp Tale Analysis Method and also some additions that added on the method. This reserach ended by some suggestions on the topic.

Key Words: Vladimir Propp, Function, Tale, Analysis, Hakkâri

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE.....	II
ÖZET.....	III
ABSTRACT	IV
NAVEROK	V
LÎSTEYA TABLOYAN.....	VII
KURTEBÊJE.....	VIII
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM: ÇÎROK Û RÊBAZA PROPP

1.1. DI DERBARÊ ÇÎROKAN DE AGAHÎYÊN GIŞTÎ.....	5
1.2. VLADIMIR PROPP Û RÊBAZA ANALÎZA ÇÎROKAN	6

BEŞA DUYEM: LI GORÎ METODA VLADIMIR PROPP ANALÎZA ÇÎROKÊN HERÊMA COLEMÊRGÊ

2.1. ANALÎZA ÇÎROKAN	20
2.1.1. Analîza Çîroka Ehmed Çelebî	20
2.1.2. Analîza Çîroka Serûrk	25
2.1.3. Analîza Çîroka Teymemildar.....	27
2.1.4. Analîza Çîroka Feqî	30
2.1.5. Analîza Heft Xwîşk.....	32
2.1.6. Analîza Hesên Lawê Hekarî	34
2.1.7. Analîza Heyranê Erebb	40
2.1.8. Analîza Keçelok.....	43
2.1.9. Analîza Xwîşka Heft Bira.....	45
2.1.10. Analîza Mîrza Mihemed	48
3.2.FONKSIYONÊN HERÊMA COLEMÊRGÊ	55
ENCAM.....	60
KESÊN ÇAVKANÎ.....	63

ÇAVKANÎ	66
PÊVEK 1: METNÊN ÇÎROKAN	68
1. EHMED ÇELEBÎ	69
2. SERÛRK	79
3. TEYMEMILDAR	82
4. FEQÎ.....	88
5. HEFT XWÎŞK	93
6. HESEN LAWÊ HEKARÎ	96
7. HEYRANÊ EREP.....	106
8. KEÇELOK	110
9. XWÎŞKA HEFT BIRA	113
10. MÎRZA MIHEMED.....	117
KURTEJÎYAN	125

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1: 31 Fonksiyonên Rêbaza Propp û Serenavên Li Binê Van Fonksiyonan....9

KURTEBÊJE

b.n.b. : Berhema navê wê borî

B.Q. : Bicîhatina Qederê

c. : Cîld

ç. : Çap

h. : Hejmar

r. : Rûpel

M.L. : Mirina Leheng

Mtv. : Motîvasyon

Vgz. : Veguhêzer

Wer. : Wergêr

DESTPÊK

Wêjeya gelêrî ya kurdî gelekî dewlemend e. Di vê wêjeyê de çîrok hêmaneke herî girîng e. Berê li gor hina di nav kurdan de çîrok gotin gelekî berbilavtîrbû. Demên ku hêj televîzyon û înternet neketibûne nav jîyana me, cihê televîzyonan çîrokan digirt. Di şevan de malbat komdibûn û yekî jî bo wan çîrok digotin û herkesî jî bi baldarî guhdarî wan dikir. Lê mixabin piştî ku televîzyon û înternet ketine nav jîyana me de hêdî kêmkirî kes çîrokan dibêjin. Ji ber ku hêdî çîrok gelek nahêne gotin kesên ku çîrokan dizanin jî gelek çîrokan jibîrdikin. Heta niha li ser çîrokên kurdî di mijarên curbecur de lêkolîn yê hatîne kirin. Lê ev lêkolîne têra nakin. Divê xebatên komkirina çîrokan û hêmanên din yê wêjeya devkî gelek zêdetir bibin.

Gelek gelen xwedî edebiyateke devkî ya dewlemend li edebiyata xwe xwedî derketinê. Van gelan bi aliyekî hêmanên folklorê xwe komkirine bi aliyê din jî li ser van hêmanên hatine komkirin lêkolînên akademîk kirine. Kurd jî wekî neteweyên cîhanê yê din xwedî edebiyateke devkî ya dewlemend e.¹ Ji ber endîşeyên windabûn û jibîrkirinê, kurdan ji berê heta niha gelek xebatên berhevkirin û tomarkirina berhemên edebiyata devkî kirine. Berhevkirina berhemên folklorê kurdî ji sedsala XVII. de bi xebatên Mela Mûsayê Hekarî dest pê dike. Dûvrê gelek kesên din ji berê heta niha ev xebate domandîne. Mihemed Qutib, Aleksandr Jaba, Mela Mehmûdê Bazidî, Albert Socin, Bazil Nikitin, Roger Lescot, Xelîl Xeyalî, Kemal Fewzî, Hecîyê Cindî, Qanatê Kurdo, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Cegerxwîn, Kamuran Bedîrxan, Şukriyê Resul Îbrahîm û gelek kesên ku me navê wan li wir nenivîsandî xebatên berhevkirina berhemên folklorê kirine.² Ji bo folklorê kurdî xetereya herî mezin kêmbûna lêkolînên zanistî ye. Kurdan gelek berhemên folklorê berhevkirine û tomarkirine lê kêmkirina xebatên teorîk li ser berhemên folklorê kirine.³

¹ Mustafa Öztürk. *Zûgotinok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de*. Kovara Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, c.3, h.2 (2016): 42.

² Ramazan Pertev. *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berwirdî - 1)*, İstanbul: avesta, 2015, r.17

³ Pertev, b.n.b, r. 15

Folklor qadeke gelek berfireh e û ji gelek hêmanên cuda pêk tê. Teza me ji van hêmanên folklorê li ser çîrokan e. Ev tez, li ser çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê hatiye amadekirin. Colemêrg, ji ber ku ji aliyê çîrokan ve herêmeke dewlemende hatiye hîlbijartin. Di vê tezê de deh çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê li gor rêbaza analîza çîrokan a Vladimir Propp hatine analîzkirin.

Li gorî lêkolînên me heta niha jimara wan her çend kêr ji be hin xebatên teorîk û akademîk li ser çîrokên kurdan hatine kirin. İbrahim Tarduş⁴, Mohammed Baiz Rahman⁵ û Servan Başdaş⁶ li ser mijara perwerdeya zarokan, Mohammed Khidhir⁷ û Reşîr Rojdar Yıldız⁸ li ser edebiyata zarokan, Bünyamin Demir⁹, Leyla Kaplan¹⁰ û Erdal Taş¹¹ li ser motifên çîrokan, Mehmet Bozkoyun li ser analîza çîrokan tez nivîsandine. Li ser teorîyên folklorê Bedran Hîkmet, pirtûkek bi navê “*Teorîyên Folklorê*” nivîsandiye.

Nûnerekê herî giringê teorîyên folklorê Vladimir Propp e. Propp bêhtir li ser çîrokan sekiniye. Li gor îdiaya Propp, hemî çîrokên derasa yên cîhanê ji sih û yek fonksîyonan pêk tên û hemî fonksîyon jî li gorî rêzeke dîyar rêz dibin. Propp dibêje di hemî çîrokan de dibe ku hemî fonksîyon nebin lê rêza hatina fonksîyonan di hemî çîrokan de eynî ye.¹²

⁴ İbrahim Tarduş. *Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdeya Zarokan de*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2015.

⁵ Mohammed Baiz Rahman. *Rola Folklorê di Perwerdekirina Zarokan de Mînak: Çîrok*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê, Van, 2016.

⁶ Servan Başdaş. *Fonksîyonên Çîrokan di Perwerdehiyê de (Vekolîn-tekst-analîz)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2018.

⁷ Mohammed Khidhir. *Ji bo Zarokan Çîrokên Ajalan (Mînak kovara heng 2001-2011)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Yüzüncü Yilê, Van, 2017.

⁸ Reşîr Rojdar Yıldız. *Di Edebiyata Zarokan de Çîrok*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê, Van, 2017.

⁹ Bünyamin Demir. *Çîrokên Kurdî li Gorî Motîf İndeksa Stith Thompson (Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrza Mihemed)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2016.

¹⁰ Leyla Kaplan. *Di Çîrokên Hîzanê de Motîfên Dê*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2018.

¹¹ Erdal Taş. *Motîfên Sereke Ji Çîrokên Gundê Serispiya Colemêrgê*, Teza Lîsansê, Zanîngeha Bingölê, Bingöl, 2017.

¹² Vladimir Propp. *Masahn Biçimbilimi*, Mehmet Rıfat-Sema Rıfat (Wer.), ç.3, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2017. r. 24-25.

Li gor vê rêbazê hin lêkolîn bi tirkî jî yên hatine kirin. Umay Günay bi navê “*Elazığ Masalları*” tezeke doktorayê amade kiriye.¹³ Di vê teza xwe de çîrokên herêma Elazîzê li gorî rêbaza Propp analîz kirine. Özkul Çobanoğlu, di pirtuka xwe ya bi navê “*Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*” de beşek daye rêbaza Propp û di dawîya wê beşê de wek mînak çîrokek li gorî rêbaza Propp analîz kiriye.¹⁴ Houssein Youssef, li ser çîrokên tirkimanên Helebê bi navê “*Halep Türkmen Masallarının Propp Metodu Açısından Çözümlemesi*” tezek nivîsandiye¹⁵. Elif Berrak Hafizoğlu jî li ser çîrokên azerîyan bi navê “*Azerbaycan Masalları Üzerine Bir Araştırma (Masalların Propp Yöntemiyle İncelenmesi)*” tezek nivîsandiye.¹⁶

Heta niha li ser vê mijarê tezek rêk û pêk nehatiye amadekirin. Armanc me di vê tezê de ewe ku em deh çîrokên derasa yên herêma Colemêrgê li gorî rêbaza Propp analîz bikin û bibînîn ka rêbaza Propp li van çîrokan tê yan ne.

Di vê lêkolînê de materyalên herî girîng, her deh çîrok in. Ev çîrokene yên ji şeş kesan hatine guhdar kirin û qeyd kirin. Gava çîrok hatine nivîsîn bi temamî çawa hatine gotin wisa yên hatine nivîsîn û çî guherîn li çîrokan nehatine kirin. Rêbaza analîza çîrokan a Propp ya li van çîrokan hatiye tetbîq kirin. Piştî tetbîqkirina rêbaza Propp xalên ku li rêbazê tên û yên lê nehên yên hatine dîyar kirin. Di dawîyê de jî encamek ya ji bo lêkolînê hatiye amadekirin.

Di nivîsa vê tezê de hin arîşe derketin pêşîya me. Ji bo tezê çîrokên amade û nivîskî nehatine bikaranîn. Ji ber vê yekê pêşîyê li navçe, gund û navenda Colemêrgê çîrok hatine berhevkirin. Di berhevkirina çîrokan de arîşeya herî mezin xwe gehandina vebêjerên çîrokan bû. Gelek caran li cihê xwe nebûn yan jî misaît nebûn. Hin caran vebêjerên çîrokan kesên biyanî bûn. Ji bo ku baweriya wan bi me bê û bo me çîrokan bibêjin diviya em li gel kesekî niyas biçûna def wan. Ji ber gelek sedeman êdî çîrok gotin gelek kêmbûye ji ber vê yekê kesên ku berê gelek çîrok

¹³Umay Türkes Günay. *Elazığ Masalları ve Propp Metodu*, ç.2, Ankara: Akçağ, 2011.

¹⁴Özkul Çobanoğlu. *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Ankara: Akçağ, 2010.

¹⁵Houssein Youssef. *Halep Türkmen Masallarının Propp Metodu Açısından Çözümlemesi*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Hacettepe, Ankara, 2014.

¹⁶Elif Berrak Hafizoğlu. *Azerbaycan Masalları Üzerine Bir Araştırma(Masalların Propp Yöntemiyle İncelenmesi)*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Atatürkê. Erzurum, 2005.

dizanîn û di gotin niha gelek jibîrkirine. Ji bo mijara teza xwe ez li çîrokên derasayî digeriyam lê gava diçûm def çîrokbêjekî gelek caran çîrokên ku kêrî şolê min neyên jî digotin. Deh çîrokên ku di vê tezê de hatine bikaranîn ji nav çil çîrokan hatine hilbijartin. Heta niha li ser mijara me tezek kurdî nehatiye nivîsîn. Ji ber vê yekê gava me ev teze amadekirî mînakek li pêşiya me nebû.

BEŞA YEKEM: ÇÎROK Û RÊBAZA PROPP

1.1. DI DERBARÊ ÇÎROKAN DE AGAHÎYÊN GIŞTÎ

Di nava berhemên anonîm ên wêjeya gel de, yên herî berbelav çîrok in. Çîrok an jî li gorî vegotina hin deveran xeberoşk, metel berhema herî girîng a çanda gotinî ye. Dîroka bikaranîna peyva “çîrokê” bi teqezî nayê zanîn. Lê li gor lêkolînekê bêjeya “çîrokê” yekem car di sala 1893yan de di ferhengeke Kurdî-Erebî de hatiye bikaranîn.¹⁷ Di zimanên erebî û aramî de jî çîrokan re *masal*, *mesel* hatiye gotin. Ji ber ku wextê pêkhatina çîrokan dîyar nîne, bi piranî çîrok bi qaliba “hebû tunebû” yan jî, “Wextekî, di dewrên berê de, di zemanê berê de” dest pê dikin. Ji bo heyîn an jî mirovên nayên zanîn di çîrokan de peyvên wek: *mirovek*, *keçikek*, *jinek*, *parsekek*, *derwêşek*, *darek*, *dêwek û hwd.* dihêne bikaranîn.¹⁸

Taybetmendiya sereke ya çîrokê ew e ku; ew xwedî teknîkeke vegotinê ya pir kurt û serî ye. Di çîrokê de xaleke pir girîng jî ev e ku; her tim tê aşkerakirin ku bûyer di demeke borî de derbas bûne. Di çîrokê de hêmanên fantastîk gelekî zêde ne û di cureyên dî de bi vê miqdarê nayên dîtin. Di çîrokan de bûyer di cîhaneke xeyalî de diqewimin, lehengên wan carina mirov, carina heywan û carina jî hin heyînên derasa ne, bi mebista kêfanîn an jî perwerdekirina guhdaran tên gotin û rastiyan bi hin remz û sembolên derasa û bi rêya hin qaliban tînin ziman.¹⁹

Taybetmendiyeke wê ya karakterîstîk heye û eger em bi vê balê lê binihêrîn, mefhûmên wê yên xwerû û vegotineke wê ya xwerû heye. Bûyerên asayî û derasayî bi rengekî perwerdekar tên vegotin. Berhemeke pexşanî ya çanda gotinî ye ku karaktereke kevneşopî û kolektîf di hundirê xwe de dihewîne. Di çîrokan de têgiha dem û deverê nîne. Bûyer di dem û devereke tesaduf de derbas dibin. Berevajîya dinyaya rastîn ku em tê de dijîn, her tim başî û baş bi ser dikevin û xirabî û xirab têk diçin. Çîrok bi vegotineke taybet û armanca terbiyekirin, perwerdekirin carina jî bi armanca kêfanîna an jî ji bo derbaskirina wextê, bi piranî ji aliyê jinan ve bi rengekî pexşanî hatine gotin. Di naveroka wan de hin mijar û şexsên “xeyalî an rastîn”,

¹⁷ Mehmet Bozkoyun. *Beşek Ji Folklorê Kurdî: Çîrok*. Kovara Bingöl Yaşayan Diller Enstitüsü, r.143

¹⁸ Vgz: Bedran Hikmet. *Notên Dersa Wêjeya Gelêrî (Zanîngeha Van Yüziüncü Yilê)*. Van, 2015-2016, r.15.

¹⁹ Hikmet. b.n.b, r.15.

“razber an jî şênber”, maddî an jî manewî” hene. Girêdayî kevneşopeke gelekî dûr û dirêjin û berhemên hafizayeke kolektîf in.²⁰

Mirovan, xeyalên xwe, hêvîyên xwe, bûyerên derasayî yên ku dixwastin bicihbihên diêxine nav çîrokan de. Eve dibe sebab ku bûyerên ji rêzê û yên derasa bi hev re wek rastî bihên nîşandan.²¹ Propp, çîrokên ku bi xirabî an jî kêmasîyekê dest pê dikin, di fonksiyonên navbeynkar de derbas dibin û bi zewac an jî bi çareserîya meselekê bi encam dibin wek çîrokên derasayî navdike.²²

Çîrok, cureyeke girîng ya folklorê ye ku, ji sedsala XIXan û vir ve, bi hin hevbeşîyên xwe, bala gelek zanyar û lêkolînerên folklorê kişandiye. Di sedsala XXan de bi taybetî lêkolînerên mîna Antî Aarne, Vladimir Propp û Stith Thompson hem li ser tesnîfa çîrokan, hem li ser motîfên ku di çîrokan de derdikevin pêş me û hem jî li ser avahîsaziya çîrokan, xebatên gelek girîng kirine.²³

1.2. VLADIMIR PROPP Û RÊBAZA ANALÎZA ÇÎROKAN

Vladimir Propp (1895-1970), girîngtirîn navê folklorê rusan e. Propp, li Petersburgê beşa Wêje û Zimanê Slavî qedand. Di dibistanên curbicur de dersên Wêje û Zimanê Rusî, Elmanî, di Zanîngeha Leningradê de jî dersên folklorê dan. Berhemên sereke yên Propp, “*Morfologiya Skazki*” (Dirûvsazîya Çîrokê) (1928), “*Îstoriçeskiye Kornî Volşebnoy Skazki*” (Kokên Dîrokî yên Çîrokên Derasayî) (1946), “*Russkiy Geroyçeskiy Epos*” (Helbesta Rusî a Destanî) (1955) ne. Berhema Propp a herî girîng “*Morfogija Skazki*” (Dirûvsazîya Çîrokê) ye. Dema ku di sala 1928an de xebata wî ya bi navê Dirûvsazîya Çîrokê derket, ji ber ku dijî îdeolojiya siyasî bû hate asta jibîrkinê lê piştî ku di sala 1958an de ev xebat li zimanê îngilîzî hate wergerandin, li nav hemî cîhanê de deng veda.²⁴

²⁰ Hikmet. b.n.b, r.14-16.

²¹ Nilgün Çıblak. *V. Propp'un Masal Çözümleme Metodu*. Kovara Türk Dili, 2005. r.127.

²² Vladimir Propp. *Masalın Biçimbilimi*, Mehmet Rıfat-Sema Rıfat (Wer.), ç.3, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2017. r.93.

²³ Vgz: Bedran Hikmet. *Notên Dersa Wêjeya Gelêrî (Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê)*. Van, 2015-2016. r.12.

²⁴ Vladimir Propp. *Masalın Biçimbilimi*, Mehmet Rıfat-Sema Rıfat (Wer.), ç.3, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2017. r.vii-viii.

Li ser folklorê sê teoriyên sereke hene. Ev teoriyê: teoriyên metîn navendi, teoriyên avahîsazî/struktûrel û teoriyên kontekstî ne. Propp, nûnerekê teoriya avahîsazê ye. Nûnerên vê ekolê bala xwe didin avahiya ku çîrok li ser wê pêk tê an jî xîmên bingehîn ku di proseseke vegotînî de xwedî rol in. Propp bêtirî çîrokên derasa ji xwe re dike mijar. Propp, çarçoveya rêbaza xwe bi çîrokên derasa sînor dike û têgeha “fonksiyon” wekî têgeheke diyarker bikar tîne.²⁵

Propp, lêkolîna xwe li ser sed çîrokên ku di tesnîfa çîrokên Aarne de dikevîne gruba çîrokên perîya û xwedî heman taybetiya ne, kiriye.²⁶ Propp, sinifandina çîrokan ya Aarne ya ku kesayetên çîrokan û naveroka çîrokan ji bo sinifandina çîrokan esas digire xelet dibîne. Propp çîrokan li gorî taybetiyên bingehîn analîz dike û di çîrokan de hêmanên “*westar*” û “*guhêrbar*” derdiêxîne holê. Li gorî Propp hêmanên *westar* ên çîrokan, bizavên kesayetan an jî çalakîyên wan in. Propp, van aksiyonên bingehîn ku xwedî yekîtiyeke tematîk in û di çîrokê de epîzotekê pêk tînin, wekî “fonksiyon” bi nav dike. Lewra ji bo Propp, eger di çîrokekê de çalakîya çûn an jî dûrketinê derbikeve pêş me, dibe ku li gorî varyantan leheng bi hespekî rewan biçê, dibe ku bi teyrêkî mîtolojîk biçê an jî dibe ku bi qeyîkek dibe ku bi navgînek dî biçê. Lê di van hemî mînakên de çûn esas e. Teyr, hesp, qeyîk an jî tiştêkî dî, bi tene ji fonksiyona çûyîne rê xîzmet dikin û alîkar in. Eger hesp tunebe dibe ku ev teyr be lê eger ku çûn tunebe çîrok bi xwe nîne.²⁷

Propp ji bo çîrokên derasayî 31 fonksiyon diyarkirine. Li gorî Propp, dibe ku di hemî çîrokan de hemî fonksiyon bi hev re dernekevin pêş me. Lê nebûna hin fonksiyonan, tu bandorê li organîzebûna fonksiyonan nake yanê dora hatina wan naguhêre. Tek fonksiyona mecbûrî ku divê di hemî çîrokan de hebe fonksiyona A (*xirabî*) an jî *a* (*kêmasî*) ye.²⁸

²⁵ Bedran Hikmet. *Teoriyên Folklorê*. Diyarbakır: Lîs, 2016. r.72.

²⁶ Elif Berrak Hafizoğlu. *Azerbaycan Masalları Üzerine Bir Araştırma (Masalların Propp Yöntemiyle İncelenmesi)*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Atatürkê. Erzurum, 2005, r.2.

²⁷ Vladimir Propp. *Masalın Biçimbilimi*, Mehmet Rıfat-Sema Rıfat (Wer.), ç.3, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2017, r.23.

²⁸ Propp. b.n.b, r.24.

Propp li kêleka fonksîyonan çar elementên alîkar destnîşan dike. Li gorî wî ev çar element di pêkhatina çîrokê de, di kelijandina fonksîyonan de, di rêzkirina wan a li pey hev de roleke karîger dilîzin. Li gorî Propp, ev elemente bi vî awayî ne:²⁹

- I. Hêmannên pêwendîkar ên ku di navbera bûyeran de pêwendiyê çêdikin.
- II. Armanc û sedemên tevgeran.
- III. Awayê peydabûna lehengan.
- IV. Taybetmendiyên lehengên çîrokan.

Her wiha ji bilî van fonksîyonên sabît û çar elementan jî di çîrokeke derasa de, karakter di heft rolên sabît de derdikevin pêş me. Ev rol jî “*êrîşkar(kesê/a xirab), bexşgêr, alîkar, prenses(babê wê), şandiyar (hinêryar, leheng, lehengê derewîn*” pêk tî. Di çîrokan de bibe ku kesek di çend rola de derkeve pêş me. Mînak, di çîrokekê de dibe ku bexşgêr û prenses heman kes be. Dibe ku di çîrokekê de heft rol bi hev re nebin ji wan hin rol kêmbin. Li gorî Propp, fonksîyon, di nav qada çalakîya heft kesan belav dibin. Qada çalakîya êrîşkar (xirabî, şer, şopandin); qada çalakîya bexşgêr (amadekirina veguhêzîna objeya sêhrî, objeya sêhrî dana lehengî); qada çalakîya alîkar (di pêkînanan karê zehmet de harîkirina lehengî); qada çalakîya prensesê û babê wê (xwasteka pêkînanan karê zehmet, derêxistina holê ya lehengê sextekar, nasîna lehengê rast, cezakirina êrîşkarî, zewicîn); qada çalakîya şandiyar (erkdarkirina lehengî); qada çalakîya lehengî (çûyîna bi armanca lêgerînê, berteka xwastekên bexşgêrî, zewicîn); qada çalakîya lehengê sextekar (çûyîna bi armanca lêgerînê, berteka xwastekên bexşgêrî, îdiayên bêbinyat)³⁰

Ji bo ku çîrok bi şiklekê objektîf bihêne sinifandin du cote element hene. Ev elemente têkoşîna li gel xayîn-serkeftin (H-J) û erka zor-çareserî (M-N) ne. Li gorî hebûn û nebûna van cotan çîrok dibine çar cure:³¹

1. Çîrokên ku di nav de cotê H-J heye.
2. Çîrokên ku di nav de cotê M-N heye.

²⁹ Propp. b.n.b, r.71.

³⁰ Propp. b.n.b, r.80-81.

³¹ Propp. b.n.b, r.104.

3. Çîrokên ku di nav de hem cotê H-I hem jî M-N heye.
4. Çîrokên ku di nav de çî ji van cote elemanta nîne.

Çîrok, bi danasîna lehengî dest pê dîke. Ji bo vê *rewşa ewil* an jî *destpêk* dihête gotin. Eve ne fonksîyonek e lê elementeke morfolojîk e. Ev elemente, bi sîmgeya “ α ” yê dihête nîşandan.³²

Tablo 1: 31 Fonksîyonên Rêbaza Propp û Serenavên Li Binê Van Fonksîyonan³³

<p>I.) Ji Malbatê yek dûrdikeve Pênase: Dûrketin Hêma: β</p>	<p>1. Ji neslên pîr yek ji malê vediqete. (β^1) 2. Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî renekî teqez yê veqetîne tê dîtîn. (β^2) 3. Ji neslên nû yek ji malê vediqete. (β^3)</p>
<p>II.) Leheng bi qedexeyekê re rûbirû dimîne Pênase: Qedexekirin Hêma: γ</p>	<p>1. An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşan kirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn. (γ^1) 2. Bi ferman an jî pêşnîyazek, rewşeke berevajî qedexeyê tê destnîşankirin. (γ^2)</p>
<p>III.) Qedexe tê bînpêkirin. Pênase: Bînpêkirina Qedexeyê Hêma: δ</p>	<p>Rengê bînpêkirina qedexeyê wekî rengê qedexeyê bixwe ye. Fonksîyonên II û III bi hev re cotik/Cotekê pêk tînin. Carina bêyî ku beşa yekem yanê fonksîyona II. hebe ya III. Heye.</p>
<p>IV.) Êrîşkar hewl dide ku agahîyan bi dest biêxe Pênase: Lêpîrsîn Hêma: ϵ</p>	<p>1. Armanca lêpîrsînê, zanîna cihê ku zarok lê dimînin an jî zanîna cihê eşyayê bi qîmet e. (ϵ^1) 2. Berevajîya lêpîrsînê, qurban ji êrîşkar hin pîrsan dîke. (ϵ^2) 3. Di hin rewşan de lêpîrsîn bi qasidîya hin kesên cuda tê kirin. (ϵ^3)</p>
<p>V.) Êrîşkar di heqê</p>	<p>1. Êrîşkar (Xayin), bersivekê ji pîrsa xwe re digire. (ζ^1)</p>

³² Elif Berrak Hafizoğlu. *Azerbaycan Masalları Üzerine Bir Araştırma (Masalların Propp Yöntemiyle İncelenmesi)*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Atatürkê. Erzurum, 2005. r.103

³³ Bedran Hikmet. *Teoriyên Folklorê*. Diyarbakır: Lîs, 2016. r.75-86

<p>qurbanê xwe de agahîya berhev dike.</p> <p>Pênase: Agahî</p> <p>Berhevkirin</p> <p>Hêma: ζ</p>	<p>2. Lêpîrsîna ku bi rengêkî dî an jî berevajî tê kirin, bersiveke lêhatî dixwaze. ζ² û ζ³</p>
<p>VI.) Êrîşkar ji bo ku qurbanên xwe an jî serweta qurbanên xwe bi dest biêxe, hewl dide ku qurbanê xwe bixapîne.</p> <p>Pênase: Xapandin</p> <p>Hêma: η</p>	<p>1. Êrîşkar dixwaze qurbanî/ê qanîh bike. (η¹)</p> <p>2. Êrîşkar rasterast tiştên sêhrî bi kar tîne. (η²)</p> <p>3. Êrîşkar hin rêyên dî yên xapînok an jî tirsdêr bi kar tîne. (η³)</p>
<p>VII.) Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alîkarîya dijminê xwe kiriye.</p> <p>Pênase: Tevlî Tawanê Bûn</p> <p>Hêma: θ</p>	<p>1. Leheng ji êrîşkar bawer dike. (θ¹)</p> <p>2-3. Leheng bi hin tiştên sêhrî an tê birîndarkirin an jî dikeve xewê. An jî, leheng digel ku tu kesî, ew li razanê mecbûr nekiribe jî ji nişkê ve radizê û karê dijmin rihetir dike. θ² û θ³</p>
<p>VIII.) Êrîşkar zirarê dide yekî ji malbatê.</p> <p>Pênase: Xirabî</p> <p>Hêma: A</p>	<p>1. Êrîşkar yekî/ê direvîne. (A¹)</p> <p>2. Êrîşkar objeyeke sêhrî didize an jî direvîne. (A²)</p> <p>3. Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zirar dide zevîyan. (A³)</p> <p>4. Êrîşkar ronahîya rojê direvîne. (A⁴)</p> <p>5. Êrîşkar kiryarên xwe yên dizîye an jî ravendinê bi şiklekî dî dike. (A⁵)</p> <p>6. Êrîşkar zirar dide bedena kesan. (A⁶)</p> <p>7. Êrîşkar, dibe sebeb ku yek ji nişkê ve berze bibe. (A⁷)</p> <p>8. Êrîşkar quranê/a xwe mecbûr dike ku tiştêkî bike an jî bi zorê tiştêk jê digire. (A⁸)</p> <p>9. Êrîşkar dirahêle yekî/ê. (A⁹)</p>

	<p>10. Êrîşkar ferman dide ku yekî/ê biavêjine behrê. (A¹⁰)</p> <p>11. Êrîşkar li yekî/ê an jî tiştêkî sêhrê dike. (wî/wê bi sêhrê vediguherîne tiştêkî dî) (A¹¹)</p> <p>12. Êrîşkar yekê/î diêxe şuna yekê/î dî. (A¹²)</p> <p>13. Êrîşkar ferman dide ku yek bihête kuştin. (A¹³)</p> <p>14. Êrîşkar yekê/î dikuje. (A¹⁴)</p> <p>15. Êrîşkar yekê/î di cihekî de qilf dike an jî diavêje zindanê. (A¹⁵)</p> <p>16. Êrîşkar yekê/î mecbûr dike ku pê re bizewice. (A¹⁶)</p> <p>17. Êrîşkar, qurbanî bi mirovxurîyê ditirsîne. (A¹⁷)</p> <p>18. Êrîşkar her şev yekî/ê diêşîne. (A¹⁸)</p> <p>19. Êrîşkar şer îlan dike. (A¹⁹)</p>
<p>VIII-a.) Ji Malbatê Yek Tiştêkî Berze Dike An Ji Dixwaze Tiştêkî Bi Dest Biêxe.</p> <p>Pênase: Kêmasî</p> <p>Hêma: a</p>	<p>1. Kêmasiya keçikeke nîşanî, kêmasiya dostekî. (a¹)</p> <p>2. Pêdivîya bi objeyeke sêhrî wekî sêv, av, hesp, şûr û hwd. (a²)</p> <p>3. Pêdivîya objeyekê ne sêhrî lê ecêb. Teyrê agir, werdeka pûrt zêr û hwd. (a³)</p> <p>4. Ji bo kuştina dêwekî, tiştêkî wekî hêka bi sêhr kêma e. (a⁴)</p> <p>5. Ji bo jîyînê, kêmasîya wasiteyên pêdivî, tiştên maqûl. (a⁵)</p> <p>6. Hin formên cuda. (a⁶)</p>
<p>IX.) Agahîya xirabîyê an jî kêmasîyê belav dibe, bi daxwaz an jî fermanekê serî li leheng tê dayîn, leheng tê şandin an jî diçe.</p> <p>Pênase: Qasidî, Kêlîya Derbasîyê</p> <p>Hêma: B</p>	<p>1. Hawara alîkarîyê tê kirin, dûre jî leheng tê şandin. (B¹)</p> <p>2. Leheng pêre tê şandin. (B²)</p> <p>3. Leheng ji mala xwe derdikeve rê. (B³)</p> <p>4. Agahîya felaketê belav dibe. (B⁴)</p> <p>5. Lehengê ku hatiye qewirandin, ji mala wî bo derekî dûr dihête birin. (B⁵)</p> <p>6. Lehengê ku hatiye mehkûm kirinê mirinê, bi dizî serbest dihête berdan. (B⁶)</p> <p>7. Straneke dilêş ku wê êşê tîne ziman tê stirîn. (B⁷)</p>

<p>X.) Lehengê ku lê tê gerîn qebûl dike ku bikeve nava çalakîyê an jî biryara çalakîyê dide.</p> <p>Pênase: Destpêkirina Çalakiya Dijber</p> <p>Hêma: C</p>	<p>Pirî caran di çîrokê de behsa vê kêliyê nayê kirin lê berîya derketinê teqeze ku biryarek hatiye girtin. Ev kêlî an jî element di çîrokên ku leheng ji bo gerekê derdikeve rê de dertê pêş me.</p>
<p>XI.) Leheng ji mala xwe derdikeve.</p> <p>Pênase: Çûyîn,</p> <p>Hêma: ↑</p>	<p>Ev çûyîn ji dûrketina berê ku bi Hêmaya β'yê de derdikeve pêş me cudatir e.</p> <p>Çûna lêger-leheng ji çûna qurban-leheng cudatir e.</p> <p>Armanca çûna leheng lêgerînek e lê qurban bêyî armanca lêgerînekê xwe di nava serborîyekê de dîtiye.</p> <p>Di çîrokan de du cure derketin hene. Yek, ya lehengî ye dî, ya qurbanî ye. Vegotin û honak bi piranî li ser lehengî teşekul dike. Lê carîna dibe ku keçikeke ciwan ji malê derkeve û kes lê negere. Hingê vegotin li ser serborîyên keçikê teşekul dike. Lewma lehengê lêger hebe an nebe jî ev îşaret heye.</p>
<p>XII.) Leheng, di imtîhan, lêpîrsîn an jî êrîşek ku dê rê veke ku ew ê objeyeke sêhrî an jî alîkarek bi dest biêxe de, derbas dibe.</p> <p>Pênase: Fonksiyona Pêşin ya Bexşger</p> <p>Hêma: D</p>	<ol style="list-style-type: none"> 1. Bexşgêr, lehengî îmtîhan dike. (D¹) 2. Bexşgêr silav dide lehengî û pîrsan jê dike. (D²) 3. Kesekî/ê ku li ber mirinê ye an jî yê mirî, ji leheng dixwaze ku ew alîkarîya wî bike. (D³) 4. Girtîyek/Dîlek, ji leheng dixwaze ku wî xilas bike. (D⁴) <ol style="list-style-type: none"> 4a. Heman rewş li piştî hatina girtina bexşgêr derdikeve pêş me. (D⁴) 5. Serî li leheng tê dayîn û jê eman tê xwestin. (D⁵) 6. Du kesên ku gengeşe dikin ji leheng dixwazin ku ew xenîmetê li wan parve bike. (D⁶) 7. Daxwazên dî. (D⁷) 8. Mexlûqatekî/Aferîdeyekî dijmin, hewl dide ku leheng bikuje. (D⁸)

	<p>9. Mexlûqatekî/Aferîdeyekî dijmin, bi leheng re şer dike. (D⁹)</p> <p>10. Objeyeke sêhrî, nîşanî leheng tê dayin û pêşnîyaza taqasê/bihevguherînê tê kirin. (D¹⁰)</p>
<p>XIII.) Leheng, reaksiyonê dide çalakîyên mirovê ku dê di pêş de bexşê bibexşîne wî</p> <p>Pênase: Reaksiyona Lehengî</p> <p>Hêma: E</p>	<p>1. Leheng, di Îmtîhanê de bi ser dikeve/bi ser nakeve. (E¹)</p> <p>2. Leheng, silava bexşgêr digire/nagire. (E²)</p> <p>3. Leheng, daxwaza kesekê ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne/pêk naîne. (E³)</p> <p>4. Leheng, girtî serbest berdide. (E⁴)</p> <p>5. Leheng, heywanê ku jê alîkarî dixwaze xilas dike. (E⁵)</p> <p>6. Leheng, parvekirina ku li ser gengeşe heye dike û yên ku gengeşê dikin dût diêxe. (E⁶)</p> <p>7. Leheng, hin xizmetên/alîkarîyên dî dike. (E⁷)</p> <p>8. Leheng, bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrîşa xilas dibe. (E⁸)</p> <p>9. Leheng, aferîdeyê/a dijmin têk dibe/têk nabe. (E⁹)</p> <p>10. Leheng, bihevguherînê qebûl dike lê li hember bexşgêr hêza sêhrî ya objeyê bi kar tîne. (E¹⁰)</p>
<p>XIV.) Objeya sêhrî ji leheng re tê dayîn.</p> <p>Pênase: Girtina Objeya Sêhrî</p> <p>Hêma: F</p>	<p>1. Objê rasteras tê dayin. (F¹)</p> <p>2. Objê, li wî cihê ye, yê ku ji leheng re tê gotin. (F²)</p> <p>3. Objê tê çêkirin. (F³)</p> <p>4. Objê tê kirin û firotin. (F⁴)</p> <p>5. Objê bi rasthatinî dikeve destê leheng. (leheng wê dibîne) (F⁵)</p> <p>6. Objê xwe bi xwe yekcar peyda dibe. (F⁶)</p> <p>7. Objê tê vexwarin an jî xwarin. (F⁷)</p> <p>8. Objê tê dizîn. (F⁸)</p> <p>9. Curbecur kes bi dilê xwe dikevin xizmeta leheng. (F⁹)</p>
<p>XV.) Leheng bi cihê ku</p>	<p>1. Leheng li ezman difire. (G¹)</p>

<p>obje li wê derê ye ve tê birin, ji bo wî rêberî tê kirin an jî tê birin.</p> <p>Pênase: Di navbera du qiralîyetan de rêwitî an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwitî</p> <p>Hêma: G</p>	<ol style="list-style-type: none"> 2. Leheng li ser erdî an jî li ser avê rêwitî dike. (G²) 3. Ji leheng re rêbertî tê kirin. (G³) 4. Ji leheng re rê tê nîşandan. (G⁴) 5. Leheng navgînên sabît yên veguhastinê bi kar tîne. (G⁵) 6. Leheng şopên xwe dişopîne. (G⁶)
<p>XVI.) Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev.</p> <p>Pênase: Pevçûn/Şer</p> <p>Hêma: H</p>	<ol style="list-style-type: none"> 1. Leheng û êrîşkar li meydana şer dikin. (H¹) 2. Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê. (H²) 3. Leheng û êrîşkar bi lîstika kaxizan dilîzin. (H³)
<p>XVII.) Nîşaneke taybet li leheng peyda dibe.</p> <p>Pênase: Nîşana Taybet</p> <p>Hêma: I</p>	<ol style="list-style-type: none"> 1. Di bedena leheng de nîşanek peyda dibe. (I¹) 2. Leheng gustîlik an jî destmalek dibîne/bi dest diêxe. (I²) 3. Curbecur nîşanên dî. (I³)
<p>XVIII.) Êrîşkar têk diçe.</p> <p>Pênase: Serkeftin</p> <p>Hêma: J</p>	<ol style="list-style-type: none"> 1. Êrîşkar li meydana şer têk diçe. (J¹) 2. Êrîşkar di pêşbazîyê de têk diçe. (J²) 3. Êrîşkar di lîstika qumarê de têk diçe. (J³) 4. Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk diçe. (J⁴) 5. Êrîşkar bêy ku tu pevçûn biqewime tê kuştin. (J⁵) 6. Êrîşkar rasterast tê qewirandin. (J⁶)
	<ol style="list-style-type: none"> 1. Objeya ku lê tê gerîn, bi zore an jî bi hîleyê/qurnazîyê tê revandin. (K¹) 2. Objeya ku lê tê gerîn, bi xiz ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan. (K²) 3. Objeya ku lê tê gerîn, bi saya cazîbeyê tê bidestxistin. (K³) 4. Bi destxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast

<p>XIX.) Xerabîya di destpêkê de tê telafikirin an jî kêmasî tê pêşwazîkirin.</p> <p>Pênase: Pêşwazîkirin</p> <p>Hêma: K</p>	<p>encameke çalakîyên berê ye. (K⁴)</p> <p>5. Objeya ku lê tê gerîn, bi navgînîya objeyeke sêhrî hemen tê bidestxistin. (K⁵)</p> <p>6. Bikaranîna objeya sêhrî, feqîrîyê-hejarîyê diqedîne/dawîya feqîrîyê-hejarîyê tîne. (K⁶)</p> <p>7. Objeya ku lê tê gerîn, di dema nêçîrekê de tê bidestxistin. (K⁷)</p> <p>8. Kesê ku sêhr lê hatiye kirin vedigere şexsîyeta/nasnameya xwe ya berê. (K⁸)</p> <p>9. Mirî zindî dibe. (K⁹)</p> <p>10. Êsîr/Dîl tê xilaskirin. (K¹⁰)</p> <p>11. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn, bi heman rengê bidestxistina objeya sêhrî ye. (K¹¹)</p>
<p>XX.) Leheng vedigere</p> <p>Pênase: Veger</p> <p>Hêma: ↓</p>	<p>Veger û gihastin bi piranî bi heman rengî ne. Digel vê jî, pêdivî bi dirûveke taybet ya vegerê nîne. Di gihastinê de curbecur navgîn û serborî hene lê veger hemen pêk tê. Lê bi heman rengê gihastinê ye. ↓</p>
<p>XXI.) Leheng Tê Şopandin.</p> <p>Pênase: Şopandin</p> <p>Hêma: Pr</p>	<p>1. Şopîner, li pey leheng difire. (Pr¹)</p> <p>2. Şopîner, daxwaza sûçdar dike. (Pr²)</p> <p>3. Şopîner dema ku dişopîne li dû hev dikeve rengê çend heywan an jî tiştêkî dî. (Pr³)</p> <p>4. Şopîner dikeve rengê objeyeke bi cezb û dertê rêya leheng. (Pr⁴)</p> <p>5. Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe. (Pr⁵)</p> <p>6. Şopîner hewl dide ku leheng bikuje. (Pr⁶)</p> <p>7. Şopîner hewl dide, dara ku leheng xwe tê de veşartîye, bi diranên xwe perçe bike/jêbike. (Pr⁷)</p>
	<p>1. Leheng, ber bi ezman ve tê birin. (Rs¹)</p> <p>2. Leheng, astengan dertîne ser rêya şopînerê xwe û direve. (Rs²)</p> <p>3. Leheng dema ku direve xwe dixwe rengê hin objeyan</p>

<p>XXII.) Bi hawara leheng de tê çûyîn Pênase: Alîkarî Hêma: Rs</p>	<p>ku wî vedişêrin. (Rs³)</p> <ol style="list-style-type: none"> 4. Leheng dema ku direve xwe vedişêre. (Rs⁴) 5. Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre. (Rs⁵) 6. Leheng, dema ku direve dikeve rengê heywanekî, kevirekî û hwd. û xilas dibe. (Rs⁶) 7. Leheng li hember ejderhaya mê ku dikeve curbecur rengan û dixwaze wî bixapîne, li ber xwe dide. (Rs⁷) 8. Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin. (Rs⁸) 9. Di kêlîya ku dê leheng bê kuştin de, bi hawara wî ve tê gihastin. (Rs⁹) 10. Leheng, heldipeke dareke dî: (Rs¹⁰)
<p>VIII Tê Dubarekirin X-XI Tê Dubarekirin XII Tê Dubarekirin XIII Tê Dubarekirin XIV Tê Dubarekirin XV Tê Dubarekirin</p>	<p>Xerabî tê dubarekirin. Leheng dîsa derdikeve rê, lêgerîneke nû dest pê dike. Rêzebûyerên ku di serencama bidestxistina objeya sêhrî de derdikevin dîsa tîn jîyîn. Leheng helwest nîşanî kesê ku dê di pêş de tiştêkê lê bibexşîne wî, dide. Objeyeke nû ya sêhrî bo leheng tê dayin. Leheng bo cihê ku objeya ku lê digere tê veguhastin/gihandin an jî tê birin.</p>
<p>XXIII.) Leheng xwe vedişêre/kîbûna xwe vedişêre û vedigêre mala xwe an jî welatek dî. Pênase: Vegarîna bi rengê veşartina kîbûna xwe Hêma: O</p>	<p>Li vê derê du kategorî derdikevin.</p> <ol style="list-style-type: none"> 1. Vegera Leheng ya mala xwe. Leheng diçe cem zenatkarek û li cem wî dixebite. 2. Leheng diçe cem qiral wekî seyis an jî aşpêj dixebite. Carina jî bi tenê vegera li welat heye.
<p>XXIV.) Lehengekî</p>	<p>Leheng ku vegere welatê xwe ev îdîa ji alî birayên wî ve</p>

<p>sextekar bi îdîayên bê bingeh derdikeve.</p> <p>Pênase: Îdîayên Bêbingeh</p> <p>Hêma: L</p>	<p>tên pêşxistin. Leheng ku vegere welatek dî, ev îdîa ji alî wezîr, general û hwd. dî ve tê pêşxistin. Birayên leheng îdîa dîkin ku wan objeya sêhrî anîye û wezîr an jî generalê welatê bîyan îdîa dike ku wî ejderha têk birîye.</p>
<p>XXV.) Karekî dijwar li leheng tê pêşnîyazkirin.</p> <p>Pênase: Karê Dijwar</p> <p>Hêma: M</p>	<p>Yek ji girîngtirîn hêmana çîrokê di vir de ye. Ev karên dijwar ji yên ku di xaçerêyên berê de dertên dibe ku cudatir bin. Ev curbicur in. Wekî, îmtîhana xwarin û vexwarinê, îmtîhana agir, îmtîhana mamikan, îmtîhana hîlbijartinê, îmtîhana nehatina dîtinê, îmtîhanên hêzê, hostetî, sebir û cesaretê, maçkirina prensesê, anîna tiştêkê an jî çêkirina tiştêkê.</p>
<p>XXVI.) Karê dijwar tê bicihanîn</p> <p>Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar</p> <p>Hêma: N</p>	<p>Rengê bicihanîna van karên zor wekî îmtîhanê pêk tên. Ev kar bi piranî, berîya ku bînin dayin ji alî leheng ve hatine kirin an jî dîtin. Mînak, leheng dizane ku kîjan nîşanên taybet li ser prensesê hene. Rewşên ku divêtiya bicihanîna wan ji pêş de hatine hînkirin bi îşareta (ON) tên nîşandan.</p>
<p>XXVII.) Leheng tê naskirin</p> <p>Pênase: Naskirin</p> <p>Hêma: Q</p>	<p>Leheng bi rêya nîşaneke taybet, birîn an jî objeyeke ku jê re hatiye dayin tê naskirin. Leheng di heman demê de ji ber ku karekî zor bi ser xistiye jî tê naskirin. Li dû dûrketinek dirêj jî tê naskirin.</p>
<p>XXVIII.) Kîbûna êrîşkar, lehengê sexte an jî yê xerab dertê meydanê.</p> <p>Pênase: Derxistina Meydanê</p> <p>Hêma: Ex</p>	<p>Derketina vê fonksiyonê bi piranî girêdayî ya berê ye. Carina li dû têkçûna di karê ku hatiye pêşnîyazkirin de rewş derdikeve meydanê. Pirî caran wekî vegotinek jî pêk tê ev fonksiyon. Yan rastîya bûyeran wekî çîrokek tê gotin ku êrîşkar/lehengê sextekar jî lê guhdar dike an jî carina bi rêya strîna stranekê kîbûna rast ya êrîşkar tê vegotin.</p>
<p>XXIX.) Leheng dikeve</p>	<p>1. Leheng bi tevgerê sêhrî ya alîkarê xwe reng/dirûv diguhêre. (T¹)</p>

rengêkê nû Pênase: Veguherîna Dirûvî Hêma: T	2. Leheng koşkeke pir xweşik çêdike. (T^2) Di vir de guherîna dirûvî nîn e lê statuya wî diguhere. 3. Leheng kincên nû li xwe dike. (T^3) 4. Hin dirûvên mantiqî û pêkenî. (T^4)
XXX.) Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê cezakirin. Pênase: Cezakirin Hêma: U	Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê kuştin, tê dûrxistin, bi dûva hespê ve tê girêdan an jî ew bixwe xwe dukuje û hwd. Carina jî efûyek esîlane bo wî tê derxistin. Bi pîranî êrîşkar û lehengê sextekar yê ku di beşa duyem de dertê tê cezakirin.
XXXI.) Leheng dizewice û dertê ser text. Pênase: Zewicîn Hêma: W	1. Leheng, jinê û welat bi hev re bi dest diêxe an jî pêşî nîvê qiraletîyê bi dest diêxe û piştî mirina dê û bav hemî qiraletîyê bi dest diêxe. (W^0) 2. Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîne, di vê rewşê de nabe qral. (W^0) 3. Carina jî berevajî vê bi tenê dertê ser text. (W_0) 4. Eger çîrok, di kêlîya berî zewicînê de bi xerabîyeke nû bê birîn, bi nîşanîbûna beşa yekem û sozeke derbarê zewicînê de, bi dawî dibe. (W^1) 5. Rewşa dijber, jina lehengê zewicandî hunda dibe, di encama lêgerînê de jin tê dîtin û zewac tê nûkirin. (W^2) 6. Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî rengêkî dî tê xelatkirin. (W^3)

Fonksiyon, hêmanên bingehîn yê çîrokê, hêmanên bûyera pêktînin, simbolîze dikin. Di çîrokan de li gel van 31 fonksiyonan hêmanên peywendîyê û motîvasyon jî hene. Hêmanên peywendîyê di rewşên ku du fonksiyon li pey hev neyên fonksiyonekê bi ya dî ve girêdidet. Motîvasyon jî ew armanc û xwastek in ku çalakîyên curcicur bi kesan didene kirin.

Gava ku çîrok têne tehlîlkirin pêşîyê rêzebûyerên ku çîrokan pêk tînin têne dîyarkirin. Di çîrokê de her xirabîya nû, zirar, kêmasîya ku derdikeve pêş me dibe sebaba pêkhatina rêzebûyerên nû. Ji ber vê yekê çîrok ji rêzebûyeran pêk tê.³⁴

³⁴ Vladimir Propp. *Masalın Biçimbilimi*, Mehmet Rıfat-Sema Rıfat (Wer.), ç.3, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2017. r.94.

BEŞA DUYEM: LI GORÎ METODA VLADIMIR PROPP ANALÎZA ÇÎROKÊN HERÊMA COLEMÊRGÊ

Ev beşe ji du binbeşan pêk tê. Di binbeşa yekem de deh çîrokên ku li jor metnên wan heyî li gor rêbaza Vladimir Propp hatîne analîzkirin. Di binbeşa duyem de, ji fonksiyonên Propp ên ku di nav çîrokên ku me analîza wan kirîn heyî li gorî rêza Propp hatîne destnîşankirin.

2.1. ANALÎZA ÇÎROKAN

Vladimir Propp di rêbaza xwe de ji bo çîrokên derasayî 31 fonksiyon diyarkirine. Dibêje ku di di çîrokan de dibe ku hemû fonksiyon nebin lê divê fonksiyonên heyî li gorî rêbaza diyarkirî bên. Propp di rêbaza xwe de ji bilî fonksiyonan behsa heft rolên sabît dike û dibêje di çîrokan de her çend kes bihêne guherîn jî ev heft role nahêne guherîn. Di vê beşê de 10 çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê li gorî rêbaza Propp hatine analîzkirin. Fonksiyon û heft rolên sabît yên ku di van çîrokan de diborin, hatine diyarkirin. Xalên ku li rêbaza Propp tînin û yên lê nayên hatine tespîtkirin û hin bîfonksiyon li rêbaza Propp hatine zêdkirin.

2.1.1. Analîza Çîroka Ehmed Çelebî

Rêzebûyer – I

1. Pîrejînekê kurkek hebû. (pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Babê kurkî miribû. (pênase: dûrketin, hêma: β^2)
3. Ehmed Çelebî, kevlê gelekî taze yê nêrîyekî dîyarî paşayî diket. (hêmana peywendîyê - §)
4. Mixtarî çavpênerabû ku Ehmed Çelebî ew kevlê hindê taze dîyarî paşayî kir. (motîvasyon – Mtv)
5. Mixtar dibêjîte paşayî; heke qesrek ji bo te hatiba çêkirinê bi şaxên û hestîyên fil û kergedana û ev kevlê jî avêtiba ser wê qesrê hîngê dê ji nuka navê te li dinyayê gerhîta. (pênase: kêmasî, hêma: α^3)

6. Mixtar dibêjîte paşayî Ehmed Çelebî dişê biket. (**hêmana peywendîyê - Ş**)
7. Ehmed Çelebî gazî dikete dev xwe û dibêjîte Ehmed Çelebî min ji te Paşa divêt tu bi hestîyên fil û kergedana bo min qesrekê çêkey û vî kevlî jî bavêjîye ser wê qesrê. (**pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B¹**)
8. Hespê Ehmed Çelebî mecbur dimînît qebûl biket. (**pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C**)
9. Ehmed Çelebî diçîte mal. (**pênase: çûyîn, hêma: ↑**)
10. Hespê wî cihê şaxêd fil û kergedana nîşan da. (**pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²**)
11. Hespê wî rêya çona wêrê û rêya bidestêxistina şaxêd fil û kergedana nîşan da. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G⁴**)
12. Fîl û kergedan dibetilin Ehmed Çelebî jî diçît li nav fil û kergedana dikevît. (Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H⁴)
13. Fîl û kergedan dikujît. (**pênase: serkeftin, hêma: J⁵**)
14. Ehmed Çelebî li wî cihê ku hespê wî nîşaday bi wî şiklê ku hespê wî nîşaday hestîyên fil û kergedana bidestdiêxît. (**pênase: helkirin, hêma: K²**)
15. Ehmed Çelebî vedigere. (**pênase: veger, hêma: ↓**)
16. Paşa ribkeka garisî didete Ehmed Çelebî. (**pênase: xelatkirin, hêma: W³**)

Rêzebûyer II

17. Paşa dibêjît bi van hestîyên fil û kergedana qesr dê çawa bihête çêkirin dê kî çêketin? (**pênase: kêmasî, hêma: a³**)
18. Mixtar dibêjîte paşayî Ehmed Çelebî dişê vê qesrê çêket. Heke bibêjît ez çênakim bibêjê dê serê te jêvekem. (**pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B²**)

19. Hespê Ehmed Çelebî mecbur dimînît qebûl biket. (**pênase: destpêkirirna çalakiya dijber, hêma: c**)
20. Hespê Ehmed Çelebî cihê hostayî nîşa dide. (**hêmana peywendîyê - §**)
21. Ehmed Çelebî diçît. (**pênase: çûyîn, hêma: ↑**)
22. Hosta dibêjîte Ehmed Çelebî pîrê halatên min yên birîne pişt adê heftê behra divê tu biçî bo min wan halatan bînî da ku ez jî bo te qesrê çêbikem. (**pênase: fonksîyona pêşin ya bexşgêr, hêma: D³**)
23. Hespê Ehmed Çelebî wî dibete cihê ku pîr lê dijît, cihê ku halatên hostayî lê. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G³**)
24. Ehmed Çelebî, halatên hostayê mirî bo tîne. (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E³**)
25. Hostayî, destavête qesrê çêkirinê. (**pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F³**)
26. Di şevê de bi hestîyên fil û kergedana qesrek li hemberî qesra paşayî çêkir. Ehmed Çelebî çû kevil dana ser qesrê. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁵**)
27. Ehmed çelebî vegeriya def paşa. (**pênase: veger, hêma: ↓**)
28. Paşa ribkeka garisî didete Ehmed Çelebî. (**pênase: xelatkirin, hêma: W³**)

Rêzebûyer – III

29. Mixtar dibêjîte paşayî, ji vê qesra ku bi hestîyên fil û kergedana hatiye çêkirin kiça papayê freng ya li pişt adê heftê behra, ya jê kê m e. (**pênase: kêmasî, hêma: a³**)
30. Mixtar dibêjîte paşayî, Ehmed Çelebî dişêt bo te kiça papayê freng bînîtin. Ger bibêjîtin ez naînim bêjê dê serê te jêvekem. (**pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B²**)
31. Hespê Ehmed Çelebî mecbur dimînît qebûl biket. (**pênase: destpêkirirna çalakiya dijber, hêma: C**)

32. Ehmed Çelebî diçîte mal. (**pênase: çûyîn, hêma:**)
33. Hespê wî cihê kiça papayê freng nîşa Ehmed Çelebî da. (**pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²**)
34. Hespê Ehmed Çelebî wî dibete cihe ku kiça papayê freng lê dijît. Hespê Ehmed Çelebî rêya bidestêxistina kiça papayî nîşa Ehmed Çelebî didet. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G³**)
35. Ehmed Çelebî kiça papayê freng direvînît. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K¹**)
36. Ehmed Çelebî vedigere. (pênase: vege, hêma: ↓)
37. Ehmed Çelebî mesela xwe bo kiça papayê freng vedibêje. (**hêmana peywendiyê - §**)
38. Piştî ku kiça papayê freng xirabîya mixtarî û paşayî zanî. Şivkeka hinarê li paşa û mixtar da û her du kirine xezal û bi vî şiklî her du cezakirin. (**pênase: cezakirin, hêma: U**)
39. Ehmed Çelebî hate ser hukmî û bi kiça papayê freng re zewicî. (**pênase: zewicîn, hêma: W⁰⁰**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me.

I. $\alpha, \beta^2, \S, Mtv, a^3, \S, B^1, C, \uparrow, F^2, G^4, H^4, J^5, K^2, \downarrow, W^3$

II. $a^3, B^2, C, \S, \uparrow, D^3, G^3, E^3, F^3, K^5, \downarrow, W^3$

III. $a^3, B^2, C, \uparrow, F^2, G^3, K^1, \downarrow, \S, U, W^0_0$

Di vê çîroka ku me vekolî de sê rêzebûyer derdikevine pêş me. Di çîroka Ehmed Çelebî de rêzebûyer li pey hev dihên. Di her serê rêbûyerê de jî erkeka zor didene lehengê çîrokê û di her sê çîrokan de jî leheng, bi alîkariya hespê xwe van erkên zor tîne cih. Her sê rêzebûyer jî bi kêmasîyekê dest pê dikin. Di van rêzebûyeran de ji bo pêşwazîkirina kêmasiyê hin kes alîkariya lehengî dikin, kesek jî bi aşkerayî nebe jî bi veşartî dijiminiya lehengî diket. Di vê çîrokê de ji bo ku leheng hin alîkariya wergire di hin îmtîhanan de jî derbas dibît. Piştî van îmtîhanan leheng

alîkarîyê werdigire. Piştî her bicihînana erkeka dijwar jî leheng bi ribkeka garisî dihête xelatkirin.

Di her sê rêzebûyaran de wek *êrîşkar*, mixtar derdikeve pêş me. Her çend bi aşkerayî sebaba wê nehatibe gotin jî mixtarî, Ehmed Çelebî nevêt û dixwazît serê Ehmed Çelebî bidete birîn. Ji ber vê yekê di her sê rêzebûran de jî mixtar dibe sebeb ku paşa erkên zor bidete Ehmed Çelebî. Di vê çîrokê de di rêzebûyera duyem de *bexşgêr*, hosta di rêzebûyerên dîn de hespê Ehmed Çelebî ye. Di çîroka me de *alîkar*, *hesp* e. Di her sê rêzebûyaran de jî hespê Ehmed Çelebî ji bo erkên zor alîkarîyê dide wî. *Prensês*, di rêzebûyera sêyem de derdikeve pêş me û *kiça papayê freng* e. Ehmed Çelebî, hewil dide ku wê bo paşayî bibe lê di rê da Ehmed Çelebî meseleya xwe bo wê vedibêjît. Di dawîya çîrokê de prenses (kiça papayê freng), planekê çêdike. Li gorî plana çêkirî kiça papayê freng mixtar û paşayî ceza dike û bi Ehmed Çelebî re dizewice. *Şandiyar (hinêryar)* di vê çîrokê de *paşa* ye. Di her sê rêzebûyaran de paşa kêmasîyekê dibîne û ji bo pêşwazîkirina kêmasîyan Ehmed Çelebî dihinêre. Di her sê rêzebûyerên çîroka me de *leheng*, Ehmed Çelebî ye. Di rêzebûyera yekem de hestîyên fil û kergedana, di rêzebûyera duyem de, halatên hostayê mirî, ji pîrhewîyê distîne, di rêzebûyera sêyem de jî kiça papayê freng diîne û di dawîyê de jî bi kiça papayê freng re dizewice û di şûna paşayî Ehmed Çelebî dibîte paşa. Di vê çîrokê de *lehengê direwîn* nîne. Ji ber vê yekê çîrok di navbera qada çalakîya şeş kesan parî dibe.

Ji bo ku çîrok bi şiklekê objektîf bihêne sinifandin du cote element hene. Ev elemente têkoşina li gel xayîn-serkeftin (H-J) û erka zor-çareserî (M-N) ne. Çîroka Ehmed Çelebî de rêzebûyera yekem dikeve gruba têkoşina li gel xayîn-serkeftin (H-J) yê. Her du rêzebûyerên din dikevîne gruba çîrokên ku di nav de çî ji van cote elemanta nîne. Di çîroka Ehmed Çelebî de 31 fonksîyonên ku Propp diyarkirîn hemî nînin lê rêza fonksîyonan li gorî pergala diyarkirî ye.

2.1.2. Analîza Çîroka Serûrk

Rêzebûyer I

1. Go zelamekî sê kur hebûn. (**pênase: rewşa destpêkê, hêma: α**)
2. Go wesîyetêd xwe û şîretêd xwe l'kurêd xwe d'kirin. Go: “Babê xulam go çî cara neçine aşêd xirab. Çî cara jî neçine çiyayê spî û çî cara jî şevê nemînine lê heke bila hûn biçinê belê b'şevê nemînine. Çî cara jî neçine derê şîv û nihala jî. Ne danine d'nava nihala ku b'şev ve we bît hûn nava nihala bin, derê şîvka bin.” (**pênase: qedexekirin, hêma: γ^1**)
3. Babê wî jî emrê Xwedê kir. (**pênase: dûrketin, hêma: β^2**)
4. Her sê kur diçine derê şîvekê seyrane. Dibêjin ev şeve em dê li derê vê şîvêbîn bes birayê biçûk dibêjê wesîyeta babê min heye em naminê derê şîvê. Wê şevê lehî ser wê şîvêda dihê û ew kesên di nava şîvê de hemî dimirin. (**hêmana peywendîyê - ξ**)
5. Her sê bira diçine çiyayê spî û hindî birayê biçûk got em biçin lê guhê xwe nedanê wê şevê mane li wî çiyayî. (**pênase: bînpêkirina qedexeyê, hêma: δ**)
6. Birayê biçûk ma hişyar şevê dît ku sê sûwarên xwedî hesp û cilêd spî hatine ser wan de. (**pênase: pevçûn/şer, hêma: H**)
7. Birakê biçûk her sê sûwar kuştin, cil û hespêd wan veşartin. (**pênase: serkeftin, hêma: I**)
8. Vêcarê her sê bira çone aşêd xirab û hindî birayê biçûk got em biçin lê guhê xwe nedanê wê şevê mane li wêrê. (**pênase: bînpêkirina qedexeyê, hêma: δ**)
9. Birayê biçûk ma hişyar şevê dît ku dêwek ji wêve têt ser wan de. (**pênase: pevçûn/şer, hêma: H**)
10. Birakê biçûk dêw kuşt û hespê wî jî hilgirt û guhêd wî jî birin kirne d'berika xwe da. (**pênase: serkeftin, hêma: J¹**)

Rêzebûyer II

11. Her neqlekê cebleka eskera dihate ser wî gundî. (**pênase: pevçûn/şer, hêma: H¹**)
12. Kiça paşay didît ku suwarek dihat nav wî eskerî diket û hemî dikuştin. Paşê jî diçû hespê xwe dikere di axurê û serûkek dikire serê xwe. (**pênase: serkeftin, hêma: J¹**)

13. Go paşay gote milletî: “Werin hûn hemî cemabibin ka kiça min sêva xwe l’kêş hewe d’detin dê demê kiça xwe demê.” (**motîvasyon – Mtv.**)
14. Kiçkê sê cara sêva xwe li sîngê serûrkî da. (**hêmana peywendîyê - C**)
15. Paşay kiçik da serûrkî wî kiçik hilgirt û bir û ço. Heyamek paşê deybabêd kiçkê diçin berêxwedidenê keyfa zelum xweşmêrek e. Keyfa wan jî hat. (**pênase: zewicîn, hêma: W⁰**)

Gava ku em li hemî fonksîyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

I. $\alpha, \gamma^1, \beta^2, \xi, \delta, H^1, J^1$

II. $H^1, J^1, Mtv., C, W^0$

Divê çîrokê de du rêzebûyer derdikeve pêş me. Her du rêzebûyer jî dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-J heyî. Rêzebûyera yekem bi wesîyeta babê destpê dike du caran guhê xwe nadene wesîyeta babê xwe ji ber vê yekê çend tişt têne serî lê birayê biçûk birayên xwe xilas dike. We diyare ku vebêjê vê çîrokê gelek cih ji çîrokê jibîrkirîne û ev çende tenê parçek ji çîrokê ye. Di çîrokê de *leheng*: birakê biçûk (serûrk), *prensês*: kiça paşay, *alîkar*: hespên serûrkî bidestêxistîn, *êrîşkar*: di rêzebûyera yekem de suwar û dêwa hatiye tana birayêd wî, di rêzebûyera duyem de jî ew eskerêd ku derdora şehîrê girtin e. Di vê çîrokê de *lehengê direwîn*, *bexşgêr* û *şandyar (hinêryar)* cih nagirin.

2.1.3. Analîza Çîroka Teymemildar

Rêzebûyer I

1. Go zemanekî babê kurkekî mirîbû. Kurik bû êtîm. (**pênase: dûrketin, hêma: β^2**)
2. Kurik gelek yê netebit û çî rihetî nedida eyalêd xelkê. (**pênase: rewşa destpêkê, hêma: α**)
3. Zelamek li rex mixberekê derbas dibû. Dengê gulêbû çî ser mezarekî go silavkire mezarî. Silavkire mezarî go Rabbê alemê we hezkir însanek j' mezarî rabû. Go: "Min eyalekê hey gelekê netebite û çî rihetî nedida eyalêd xelkê. Ji berwî ez li vêderê nexweşiyê dibînîm. Here li wî xidan derkeve û bide berxwandinê. (**pênase: fonksîyona pêşin ya bexşger, hêma: D^2**)
4. Zelam dibêjîtê ka dê li kîj derê û çawa kurkê wî bînît. Teymemildar diçîte wî cihê zelamê ji qebrî derketî bo gotî û wî kurkê dibînît. Bi şiklekî li gel kurkê diaxivît. Kurkê didete ber xwandinê. Kurik gelek baş çêdibît. (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E^3**)
5. Teymemildar carekadî rex mixberê derbasbû silavkire ser mezarê wî zelamî. Zelamekê ser û rihêd wî spî jî qebrî rabû gotê: "Were ez hevalê te me, ez dê l'gel te l'dinyayê gerhim." Bûne ticar û bûne karwan û bûne filan û bêhvan l'gelekê çon, çone cihekî. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G^3**)
6. Diçîne cihekî marekê heft ser yêd wê rêkê da hema çî insanê dît, dewar bît, hespa d'xwet. Li gel wî marê heft ser şer kir. (**pênase: pevçûn/şer, hêma: H^1**)
7. Mar kuşt, pirt pirt kir û agir berdayê. (**pênase: serkeftin hêma: I^1**)
8. Xwelîya wî jî hilgirte def xwe û çon. (**hêmana peywendîyê - \S**)

Rêzebûyer II

9. Çon bi dinyayê ketin çûne gundekê dî li paşayê gundî bûne mêhvan. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G^3**)
10. Dengê girî hat. Wan jî gote paşayê eve çî ye? Paşa nesaxiya kiça xwe bo wan got. (**hêmana peywendîyê - \S**)
11. Dibêjin heke em kiça te saxbikeyn dê çî deye me? Paşa dibêjît hewe çî bivêd ez dê deme hewe. (**motîvasyon – Mtv**)

12. Ew zelum radbît pileka ji wê xwelîya li gel didetê kiçik saxdibît. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁸**)

13. Paşa kiça xwe dikete diyarî didete wan zelaman. (**pênase: zewicîn, hêma: W³**)

Rêzebûyer III

14. Kiçik hilgirt û ji wê dere derketin çûne derekî dî. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G³**)

15. Dibînin li rexekî şînî ye li rexêdî girî dibêjît eve xêre ew jî diben: “Eve birayê sêyê ye yê bo xwe jinkê tîntin yêd spidê radbin zavayê mirî û jînik ya sax e.” (**hêmana peywendîyê - Ş**)

16. Mêrkî gotê ez kefil bila daweta xwe biken. Şevê xwe li oda wî zelumê dawet kirî veşart. Şevê marek hat da bi wî zelumî vedet zelumê derwês wî marî dikujît. (**pênase: serkeftin, hêma: I⁵**)

17. Marî qet qet dike her qedek dibe qursek zêrî. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁶**)

18. Zelum têt dibêjît ew zêr min yêd danadîne wê derê. Hindi dişên li gel xwe diben yêd dî dimînin bo zavayî. (**pênase: zewicîn, hêma: W³**)

Rêzebûyer IV

19. Cardî b’ dinyayê ket heta xweliya xwe ya wî marî, marê ejdeha yê mezin hemî xilas kirî. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G³**)

20. Yê korew, yê ker û yê keçel û yê gurî, yê bîrov lê bît, yê kulik lê bît çî lê bît qirîjînine go hindek ji wê xwelîyê lêdida, av d’dayê ku lêdkir go pê saxdibû. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁶**)

Rêzebûyer V

21. Di dawîyê de dibêjin em dê tiştêd xwe li xwe lêkvekeyn. Teymemildar dibêje jînika hey em dê ku li jînkê keyn? Zelum dibêjît: “b’Xwidê dê jînkê jî keyne du ker. Kerek bo min êk bo te.” (**pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D¹**)

22. Teymemildar go: “Dê baş e.” Hema bila bira destebirayê ezîz bila wesankî bît. Teymemildar çî pişt heft mila ket go dê dilê bo jînkê suşîtin. (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E¹**)

23. Zelaî şîre xwe tam da danîta serê jinkê marek xwe ji serê jinkê tavête derî.
Zelaî gehîşte marî kuşt pirt pirt kir. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁸**)
24. Teymemildar hat berêxwedayê jinka saxe ne kuştiye. Zelaî gote Teymemildar dê rabe dabiçîn. Gava hatinê nik mixberê zelaî carek dî çu di qebrê xwe da.
(**pênase: vejer, hêma: ↓**)
25. Teymemildar zêr û zinet jinik hilgirt û çu mala xwe. Destavêtê daweta kiçkê û Teymemildar kirin. (**pênase: zewicîn, hêma: W⁰**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

- I. $\beta^2, \alpha, D^2, E^3, G^3, H^1, I^1, \xi$
- II. $G^3, \xi, Mtv., K^8, W^3$
- III. $G^3, \xi, Mtv., I^5, K^6, W^3$
- IV. G^3, K^6
- V. $D^1, E^1, K^8, \downarrow, W^0$

Çîroka Teymemildar ji pênc rêzebûyera pêk têt. Rêzebûyer tevlihev nayên li gorî rêzekê têt. Çîrok dikeve sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-I û M-N tune. Rêzebûyera yekem bi xwasteka zelaî ji mezarî derketî destpêdike û bi kuştina marekê heft ser xilas dibît. Rêzebûyera duyem bi çûna gundekî destpêdike û bi saxkirina kiça paşayê gundî xilas dibe. Rêzebûyera sêyem bi çona cihekî destpêdike û bi kuştina marekê mezin xilas dibe. Rêzebûyera çarem, rêzebûyera herî kême. Bi çona hin cihan destpêdike û bi li wan cihan saxkirina gelek kesan xilas dibe. Rêzebûyera pêncem, rêzebûyera dumahîkê ye. Bi lêkvekirina malê berhevkirî destpêdike û bi zewaca Teymemildar li gel kiça paşayê gundî xilas dibe.

Di vê çîrokê de di her pênc rêzebûyera de *leheng* Teymemildar e. *Bexşgêr* jî di her pênc rêzebûyera de ew zelaî ji qebrî rabû ye. *Êrîşkar* di rêzebûyera yekem de marekê heft ser e. Di rêzebûyera sêyem de marekê wek ejdarhaya ye. Di rêzebûyera pêncem de jî ew mar e yê ku li nav serê kiçkê de. Di rêzebûyera duyem û çarem de *êrîşkar* nîne. *Prensês*, di rêzebûyera duyem û pêncem de derdikeve pêş me di her duyan de jî kiça paşayê gundî ye. *Alîkar* jî wekî *bexşgêr* di hemû rêzebûyera de ew zelaî ji qebrî rabû ye. Di vê çîrokê de *şandayar (hinêryar)* û *lehengê direwîn* cih nagirin.

2.1.4. Analîza Çîroka Feqî

Rêzebûyer - I

1. Feqîyek hebû. Ew û xwîşka xwe bûn. (pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Dayka wî û babê wî mirbûn. (pênase: dûrketin, hêma: β^2)
3. Babê got: Ya ebda Xwidê! Go heke ez mirim go kurê min hinêre ber feqîtiyê. (pênase: qedexekirin, hêma: γ^2)
4. Kurik rabû malume hinarte ber feqîtiyê. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
5. Gava dizivirît serkekî d'bînît sere mirova, hestiyê kûloxkekî d'bînîtin. (hêmana peywendîyê - §)
6. Bere xwe d'detê l'ser enya wî ya nivîsiya ev kûloxke dê heft qetil vî kûloxî hêne kirin. (motîvasyon – Mtv.)
7. Berê xwe d'detê morkeka şîn dite l'wêrê. (pênase: girtina objeya sêhrî hêma: F^5)
8. Kiçik jî morkê d'kete d'devê xwe da gava kire d'devê xwe da berîkêd wî salkirin êdî morik j'birikir. Xwîşka wî zikê wê gir bû. (hêmana peywendîyê - §)
9. Kurkek xwidêdide û wê gavê de diaxive. (pênase: nîşana taybet hêma: J^3)

Rêzebûyer - II

10. Qralî xewnek dît û rimildarêd wî neşeyan xewna wî tabîr biken. (pênase: kêmasî hêma: a)
11. Kesê neşeya te'bîra xewna bidet û ev mesele belav bû. (pênase: qasidî, kêliya derbasîyê hêma: B^1)
12. Kurkî gote xalê xwe min bibe nî qralî ez dê tabîra xewna wî bidem. (pênase: destpêkirirna çalakiya dijber hêma: C)
13. Xarza bir ço dîwana qirali. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
14. Te'bîra xewna qralî didet. (pênase: pêşwazîkirin hêma: K)
15. Qral jîna xwe kiça xwe û xidama xwe dikuje. (pênase: cezakirin hêma: U)
16. Feqî xelat dike. (pênase: zewicîn, hêma: W^3)
17. Kurik dimire. Qedera Xwidê tete cih. (Bicîhatina Qederê)

Li gorî fonsiyên çîrokê şemayeke wiha derdikeve pêş me:

I. $\alpha, \beta^2, \gamma^2, \uparrow, \S, Mtv, F^5, \S, J^3$

II. a, $B^1, C, \uparrow, K, U, W^3, B.Q$

Di vê çîrokê de du rêzebûyer hene. Rêzebûyer I, dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-I û M-N nînin. Rêzebûyer I, bi wesîyetekê destpêdike. Di rêzebûyera yekem de heft rolên sabît, bi tamamî nînin. *êrîşkar (kesê/a xirab)*, *prenses û babê wê*, *lehengê derewîn* di rêzebûyera yekem de nînin. *Bexşgêr*, *şandyar (hinêryar)* bi aşîkar di bûyerê de nînin lê fonksîyonên wan hene. Di rêzebûyera yekem de bi aşîkari *leheng* Feqî û *alîkar* jî xarzayê Feqî ye.

Rêzebûyera duyem dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav de cotê elementên M-N heye. Di rêzebûyera duyem de erka zor xewna qralî ye, Feqî bi alîkariya xarzayê xwe vê erka zor çareser dike. Di rêzebûyera duyem de *leheng*; *fegî*, *alîkar*; xarzayê *feqî*, *prenses û babê wê*; qral, *êrîşkar (kesê/a xirab)*; jin, kiç û xidama qralî ye. Di rêzebûyera duyem de *lehengê direwîn*, *şandyar (hinêryar)* û *Bexşgêr* nînin.

2.1.5. Analîza Heft Xwîşk

Rêzebûyer I

1. Li malekê heft xwûşk hebûn. (pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Rojekê van her heft xwîška gote dayka xwe: “Em ê çîn bo xwe hindek leyizîn û em ê paşê bihêyn.” Dayka wan jî go: “Temam herin bes xwe direnk nehêlin.” (pênase: qedexekirin, hêma: γ^1)
3. Rabûn ji gundî derketin çûne nav dara û baran bo xwe leyistin bû şev rêya xwe berzekirin neşêyan bizivirine mala xwe. (pênase: binpêkirina qedexeyê, hêma: δ)
4. Wextekê dinêrinê ji dûrve lempeyaka malekê teysîtin. Mala pîrhevokekê bû bes wan nedizanî. Biryara xwe da û çone wê malê. (hêmana peywendîyê - \S)
5. Pîrhevokê gava ew dîtîin gelek keyfa wê hat. Rabû heft xwîşk hilgirtine jorve û planên xwarina wan bo xwe çêkirin. (pênase: xapandin, hêma: η^1)
6. Kiçik rabûn çûne mala pîrhevokê ve. (pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ^1)
7. Xwîška biçûk pêhesa ku eve pîrhevoke û dê wan xwetin. (pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B^4)
8. Dibêjîte pîrhevokê: ““Min nexwe ez ê bo te şohlên malê bikem tu bes xwûşkên min berde bila biçin.” Xwîška biçûk dimînîte def pîrhevokê û yên dî dizivirin diçine mal. (pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C)
9. Rojekê kiçkê planeke revînê bo xwe çêkir. Gote pîrhevokê ez dê çim dara înim. Bi wê hicetê ve rewî çû. (pênase: serkeftin, hêma: J^7)

Rêzebûyer II

10. Hirçek derdikevîte rêya kiçkê kiçkê bo xwe dibetin û pê re dizewicît. Gelek têjikên wan çêdibin. Jinik jî wekî hirçan lêdihêt. (pênase: xirabî, hêma: A^{16})
11. Rojekê hirç dimire. Kiçik û têjikên xwe jî derdikevin da ku tiştekî bixwen. Radibin çin xwel pezî den bes şivan tifenga xwe derdixetin hemûyan kujîtin tinê ev kiçike û têjkeka wê mînitine sax. (hêmana peywendîyê - \S)
12. Kiçik hal û mesela bo şivanî dibêjît. Şivan jî çî lê naketin. (pênase: pêşwazîkirin, hêma: K^{10})

13. Şivan jî kiçkê û têjika wê digirît dibete mala kiçkê. Dibêjîte dayka wê eve ew kiçka te ye ya ku berzebûy. (**pênase: vejer, hêma: ↓**)

14. Keyfa dayka kiçkê gelek hat dibete mal pakij diket û bo goştê kelandî çêdiket. Kiçik û têşka xwe wî zadî dixwen û her dû pê dimirin. (**Mirina Leheng**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

I. $\alpha, \gamma^1, \delta, \xi, \eta^1, \theta^1, B^4, C, J^7$

II. $A^{16}, \xi, K^{10}, \downarrow, M.L$

Di vê çîrokê de du rêzebûyer derdikevin pêş me. Rêzebûyer tevlihev nayên li gorî rêzekê tên. Her du rêzebûyer jî dikevîne sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-J û M-N tune. Di rêbaza Propp de di fonksiyona “XVIII. Êrîşkar têk diçe. (J)” binfonksiyonên $J^1, J^2, J^3, J^4, J^5, J^6$ hene lê li çîroka me nayên. Me li vê derê binfonksiyona J^7 (Leheng êrîşkarî (xayîn) dixapîne.) lê zêde kirîye. Di vê çîrokê de hemî fonksiyon cih nagirin lê rêza hatina fonksiyona li rêbaza Propp tê. Di vê çîrokê de fonksiyonek li rêbaza Propp naye. Di rêbaza Propp de çîrok bi cezakirina lehengê direwîn yan xayîn û bi forman cuda yên zewicîna leheng xilas dibe. Lê ev çîroke bi mirina leheng xilas dibe. Ev fonksiyona dawî li rêbaza Propp nayê.

Di vê çîrokê de ji heft rolên sabît kêrrol derdikevin pêş me. *Leheng*, di her du rêzebûyeran de jî xwişka biçûk e. *Êrîşkar (xayîn)*, di rêzebûyera yekem de pîrhevok, di rêzebûyera duyem de hirç e. *Alîkar*, di rêzebûyera duyem de şivan e. *Lehengê direwîn, prenses (paşa), şandiyar (hinêryar), bexşgêr nînin*.

2.1.6. Analîza Hesên Lawê Hekarî

Rezebûyer I

1. Go carekê zelamek hebû. Êkî d'gotê Hesên. (pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Ço heçku d'bên şehrekê wekî Cilemêrgê. (pênase: dûrketin, hêma: β^3)
3. Zelamek li gehwekê rastî wî têt û harîkariya wî diket. Zêlam, Hesên dibete def hakimê bajêrî da ku şolekî bidetê. (hêmana peywendîyê - §)
4. Hesên, heyamekê xweş li def hakimî şol diket rojekê suwarekî dibîne û ew jî dixwaze wekî suwarî bibe. Îzna xwe jî hakimî digire û diçe ji bo xwe hespekî dikire û ew jî wekî wî suwarî dike. (pênase: kêmasî, hêma: a^3)
5. Hekû li nav bajêrî hespê xwe diajo jinkek bi xeletî li gel wî diçe û dibêje zêlamî wîla hêdî ez bo te me divê tu min ji bo xwe bibey. Zêlam jînekê dibete bajarekê wekî Amêdiyê. (hêmana peywendîyê - §)
6. Heta gehîştîne bajarî der hatine girtin mane ji derve. Dêwek têt jinik û hespê Hesên dibet û dixwet. (pênase: xirabî, hêma: A^{12})
7. Hesên diçe def paşay dibê jîka min berzebûye. Ew jî dibêtê serêkaniya me dêwek heye her şev kiçek û sîngêkê pelavê em didenê. Her şev malek şîva wî didetê. Lêdinêrin ku paşay şîva dêwî nedayê. (hêmana peywendîyê - §)
8. Hesên Lawê Hekarî dibêje paşay cihê dêwî nişa min biden ez dê çim bikujim. Cihê dêwî nişa diden. Pênase: (qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B^1)
9. Hesên ji bo kuştina dêwî birêdikevît. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
10. Kiça dêwî dibêje: “Tu çi kesî pêşî reşko tu hatî?”, “Dê b'çi kujî?” (pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D^2)
11. Kiça dêwî go: “Ew şîr serê babê min nabirît.” rêya kuştina dêwî nişa Hesên dide. (pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F^2)
12. Dêw di xeweka giran de ye. (pênase: pevçûn/şer, hêma: H^4)
13. Hesên jî bi şikle nişa wî day dêwî dikuje. (pênase: serkeftin hêma: J^5)
14. Ava ku dêwî girtî carek dî berdide. (pênase: pêşwazîkirin, hêma: K)
15. Kiça dêwî dibêje Hesên: “Me j'êre nebe heke tên ew dê hên dûv te da. Gotê dê paşatîyê bo xwe helgirî. Heke te em j'êre birîn ew dê sêhwarekê l'te girin dê te kujin tu bê piştî bê mêrî bê ewî te min jî ji te wergirin.” (hêmana peywendîyê - §)

16. Wila heyvek pêve çò dumahiyê paşay û wezîri gotê babo benê evî qencî l'me kir ka da biçîn bînîn. Diçin Hesen û kiça dêwî tînin nav bajarî. Leheng vedigere.

(pênase: veger, hêma: ↓)

Rezebûyer II

17. Heke heyvek heke du heyv çon gotê teftêşa bajêriye go delala bang heldêran kes agirek ronahîyek helneketin. (pênase: qedexekirin, hêma: γ¹)

18. Wila wan jî ronahî helnekirin rabûn ser xwe çon ho berêxwedidenê pencera mala Hesen Lawê Hekarî şeveq vedidetin. (pênase: binpêkirina qedexeyê, hêma: δ)

19. Paşa tiştêkî danîte bin pê xwe û li pencerê dinêre jorve. Canatiya kiça dêwî dibîne. (motîvasyon – Mtv)

20. Paşa dibêje wezîrê xwe: “Bo min binêrine çarekê. Evî pilanekê lêbgêrin, evê dîvêtin bo min bînin.” (pênase: kêmasî, hêma: a¹)

21. Wezîrê got: : “Tu xwe nexweşke em dê bêynê dermanê vî tiryê biheştê ye dê tiryê biheştê ji kîrê înin dêçît û nahêteve. Heftiyekê an dûyan dê deyne navbeynê paşê hekû nehat dê hêyn jinka wî bo te beyn.” (hêmana peywendîyê - §)

22. Paşay xwe nesaxkir. Hesen çò sera paşay. Gotin dermanê paşay tiryê biheştê ye divê Hesen biçît tiryê biheştê bo paşay bînît. (pênase: qasidî, kêlfîya derbasîyê, hêma: B¹)

23. Hesen Lawê Hekarî dilnexweş diçe mal meselê bo jinka xwe (kiça dêwî) dibêjê. Kiça dêwî dibêjê: “Xeman nexwû ew jî dê Xwidê qetînît min gote te neçe, tu boy çoy?” Kiça dêwî rêya çona tiryê biheştê û bidestêstina wî nişa didet. (pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C)

24. Hesen rêdkive diçe cihê kiça dêwî nişaday. (Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑)

25. Li wê derê perêd kotireka çoye nav avê de digire û ji wê kotirê tiryê biheştê dixwaze. (hêmana peywendîyê - §)

26. Kotir dibêjê: “Tu ins î tu cins î tu çi yî? Bo xatra Xwidê perkêd min perde ez mame nav vê ava tezî te çi mirad heye ez dê bo te hasilkem.” (pênase: fonksîyona pêşin ya bexşger, hêma: D²)

27. Hesen dibêje kotirê: “Mirada min tiryê biheştê ye, îna gotê tu jî bo min we'de ke.” (pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E²)

28. Kotir, bo wî tiryê biheştê tîne. (pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F¹)

29. Gava ku tirî ji kotirê werdigire destê wî bi nîklê kotirê ket û kotir bu perî.

30. Tiryê biheştê bo paşay îna. (pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁴)

31. Jinka xwe bir û ço mala xwe. (pênase: vejer, hêma:↓)

Rezebûyer III

32. Wila ço salek dî carek dî got teftêşa bajêrî ye bila ke agirî hilneket delala bang heldêran go teftêşa bajêri ye. (pênase: qedexekirin, hêma: γ¹)

33. Çin berêxwedidenê hindêdî runahiya wî geşbû ya ew bûy. (pênase: bînpêkirina qedexeyê, hêma: δ)

34. Nîfkê da yê rûniştiye xarê vêca dev û şefeq veday şefeqa way didete xanîyêd dî jî. (motîvasyon – Mtv)

35. Paşa serket ço nêrayê pişt ra got: “Wezîr hey te hal û hedey min kiryo ev paşatî, wezîratiya te ya çi ye. Eve Hesên Lawê Hekarî gotê eve ye paşa.” Îna gotê: “Çarekê bo min.” (pênase: kêmasî, hêma: a¹)

36. Wezîrî got: “Tu xwe koreke em dê bêynê derdê koratiyê biska çil awaz e. Biska çil awazê ya l’adê heft behra. Dê ku çît?” (hêmana peywendîyê - §)

37. Paşay xwe nesaxkir. Hesên ço sera paşay. Gotin dermanê paşay biska çil awaz e. Divê Hesên biçît biska çil awaz e. Bo paşay bînît. (pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B¹)

38. Hesên bi dilnexweşî diçe mal. Meselê bo kiça dêwî dibêje. Kiça dêwî rêya bidestêxistina biska çil awaz nişa Hesên dide. (pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C)

39. Hesên rêdkive diçe cihê kiça dêwî nişaday. (pênase: çûyîn, hêma: ↑)

40. Li wêderê pîremêrekî dibîne. Wekî jinka wî bo gotî ço devê êxiste pêlva pîremêrî û neberda.û biska çil awaz jê xwast. (hêmana peywendîyê - §)

41. Pîremêrî gotê: “Hay babê min te xêre, te şole b’mine, ez rezil û sewda.” Gelek yêd çoyne nehatîne, tu j’riha xwe vêzarî?” (pênase: fonksîyona pêşin ya bexşger, hêma: D²)

42. Hesên gotê: “Qetî’yen vêgavê tu dê bo min rêya biska çil awaz bêy.” (pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E²)

43. Pîremêrî lixavek dayê û rêya bidestêxistina biska çil awaz nişa Hesên da. (pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²)

44. Ew jî rabû eynî lixav jê wergirt û ço hindî dêmî xilaskir gehişt behrekê wî jî avêt behrê navê Xwidê pêxembera îna go kurîbehrekê serê xwe hilanî ser dana hema ling tê danan û heku jetê behr şeqbir bir rexêdî. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberêkî rêwîti, hêma: G²**)
45. Hesên ço cihê biska çil awaz. Gava li rasti biska çil awaz hati ew revî biska çil awaz jî bi sêhr û sine'têd xwe da dûv Hesên lawê Hekarî. (**pênase: pevçûn/şer, hêma: H¹**)
46. Tibla hesên berî berê şadê ket û sêhrêd biska çil awaz betalbû. Wî jî biska çil awaz bidestêxist. (**pênase: serkeftin, hêma: J¹**)
47. Îna hate def pîremêrî. Rihêd pîremêrî tiraşîn û helaw hat.
48. Hatîn berêxwedidenê paşa yê hazirîya birina jinêd wî diket. (**motîvasyon – Mtv**)
49. Ço biska çil awaz bo paşay bir. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K¹**)
50. Jinka xwe bir û ço mala xwe. (**pênase: veşer, hêma: ↓**)

Rezebûyer IV

51. Sal wextek dî pêve ço. Îna piştî hîngê çove ber pencerê berêxwedidetinê yêd danane nivka xwe da hêdî mihele hemî ber şeveq veddet. (**motîvasyon – Mtv**)
52. Paşay gote wezîrî: “Teybîrekê bo min bibîne.” (**pênase: kêmasî, hêma: a¹**)
53. Wezîrî got: “Em dê bêyn milleti bila dar û dep û wan ben b'kene ber kelê. Dê bêynê tu jî were gel me em dê agirî berdeynê her wezîrek ji me dê milekê wî girît dê wî danî pêşîya xwe gava kurya agirî ser dararu wan hat silal pûş û pelaşan ra go dê em dê milêd wî girîn tu jî heku me bire ser kevrî dê pêhnekê l'pišta wî bide dê avêyn nav da. Her êk ji me êk, êk jî bo te.” (**hêmana peywendîyê - §**)
54. Paşay cab da milleti agirekê mezin hilkerin û Hesên Lawê HEKARÎ jî gazîkirin da ku bixapînin û bajêvine nav agirî de. (**pênase: xapandin, hêma: η¹**)
55. Jina wî(biska çil awaz) got: “Îna eve dê te ben tu ewê dizanî hîla wan çi ye.” Mûyek ji biska xwe kêşa dana d'berîka wî da go: “Heku agir xweşbû dê te havên hema tu bi xwe xwe bavêje netirse.” (**pênase: destpêkirirna çalakiya dijber, hêma: C**)
56. Gava agir xweş bûy hêj wezîr û paşay destnedayê wî bixwe xwe li nîveka agirî da. (**pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ⁴**)

57. Bêhnekê man dinêrinê eve d'binîra derket vêca rutbe û nîşanêt generala, yêd ewan gotê: “Ihi ewêhenê sax bû wêhe d'wêra hera derket.” Wezîran gotê b'Xwidê ew erdê xelkê dar jê inay ka darêd milyaketan bûne, yêd mişayîxan yêd çi. Em dê bêynê bo me hindek dî bînin b'ken wêrê hekû bû gera ma em dêçin rutbêt mestir bo xwe înin. (**motîvasyon – Mtv**)

58. Sala paştir agirek dî hilkir paşê Hesên rabû ser xwe agirê wan xweşbû, xweşnebû destek da wî wezirî êk da wî wezirî çokê xwe jî da paşay birne ser kevrî her sê pişt nişîvkirin dûvser avêtin têda gurya agirî çu ber esmanî. Hemî di agirî de sotin. (**pênase: cezakirin, hêma: U**)

Gava ku em li hemî fonksîyonên çîrokên dinêrin şemayeke wiha derdikeve pêş me:

- I. $\alpha, \beta^3, \S, a^3, \S, A^{12}, \S, B^1, \uparrow, D^2, F^2, H^4, J^5, K, \S, \downarrow$
- II. $\gamma^1, \delta, Mtv, a^1, \S, B^1, C, \uparrow, \S, D^2, E^2, F^1, K^4, \downarrow$
- III. $\gamma^1, \delta, Mtv, a^1, \S, B^1, C, \uparrow, \S, D^2, E^2, F^2, G^2, H^1, J^1, Mtv, K^1, \downarrow$
- IV. $Mtv, a^1, \S, \eta^1, C, \theta^4, Mtv, U$

Di vê çîrokê de çar rêzebûyer derdikevin pêş me. Rêzebûyera yekem dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J heye. Di rêzebûyera yekem de heft rolên sabît wiha derdikevine pêş me: *leheng*. Hesên e, *êrîşkar (kesê/a xirab)*: dêw e, *Bexşgêr û alîkar*: kiça dêwî ye, *şandyar (hinêryar)*: paşa, *prences û babê wê*: kiça dêwî ye. Di vê rêzebûyerê de *lehengê direwîn* nîne.

Rêzebûyera duyem dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J tune. Rêzebûyera duyem, bi kêmasîyeka jinekê (a) destpêdike. Paşa dixwaze bi şiklekî tiştêkî li Hesên bike û jina wî ji bo xwe bîne. Ji ber vê yekê erkên zor dide ber Hesên Lawê Hekarî. Lê *leheng* bi alîkariya kiça dêwî vê erka zor çareser dike. Di rêzebûyera duyem de *leheng*: Hesên Lawê Hekarî, *bexşgêr*: kotir, *alîkar*: kiça dêwî, *prences û babê wê*; kotir, *êrîşkar (kesê/a xirab)*; wezîr, *şandyar (hinêryar)*: paşa ye. Di vê rêzebûyerê de *lehengê direwîn* cih nagire.

Rêzebûyera sêyem jî dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J heye. Rêzebûyera sêyem jî bi kêmasîyeka jinkekê (a) destpêdike. Paşa dixwaze

bi şikleki tişteki li Hesên bike û jina wî ji bo xwe bîne. Ji bervê yekê erkên zor dide ber Hesên Lawê Hekarî. Lê leheng bi alîkariya kiça dêwî vê erka zor çareser dike. Di rêzebûyera sêyem de *leheng*: Hesên Lawê Hekarî, *bexşgêr*: Pîremêr, *alîkar*: Kiça Dêwî, *prences û babê wê*; Biska Çil Awaz, *êrişkar (kesê/a xirab)*; Wezîr, *şandiyar (hinêryar)*: paşa ye. Di vê rêzebûyerê de *lehengê direwîn* cih nagire.

Rêzebûyera çarem jî dikeve nav sinifa çîrokên ku di nav de cotê elementên H-J tune. Ev rêzebûyerejî bi kêmasiyêk Rêzebûyera sêyem jî bi kêmasiyeka jinkekê (a) destpêdike. Paşa dixwaze bi şikleki Hesên bikuje û jina wî ji bo xwe bîne. Lê di dawiyê de paşa bi wezîrêd xwe dimire û Hesên Lawê Hekarî serdikeve. Di rêzebûyera çarem de *leheng*: Hesên Lawê Hekarî, *bexşgêr û alîkar*: Biska Çil Awaz, *prences û babê wê*; cih nagire, *êrişkar (kesê/a xirab)*; Paşa û wezîred wî. *şandiyar (hinêryar) û lehengê direwîn*, cih nagire.

Di rêbaza Propp de di fonksiyona “VII. Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alîkariya dijminê xwe kiriye.(θ)” binfonksiyonên θ^1 , θ^2 , θ^3 hene lê eve li çîroka me nayên. Me li vê derê binfonksiyona θ^4 (Leheng plana êrişkar dizane û ji êrişkar bawernake lê xwe wek jêbawerkirî nişa dide) lê zêde kirîye. Bi heman şiklî di fonksiyona “XVI.) Leheng û êrişkar di şerekî de derdikevin hemberî hev. (H)”bin fonksiyonên H^1 , H^2 , H^3 hene lê eve li çîroka me nayên. Me li vê derê binfonksiyona H^4 (Êrişkar di rewşeke wisa de ye ku neşet êrişî leheng bike, leheng êrişkar dikuje.) lê zêde kirîye.

2.1.7. Analîza Heyranê Ereb

Rêzebûyer I

1. Êkî di gotê Feysel Paşa, paşayê bajarê Qeyserîyê bû. (pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Babê wî emrê Xwidê kiribû. (pênase: dûrketin, hêma: β^2)
3. Feysel paşa yê bêjin bû hevalê wî got em biçîn bo te li kiçkê bigerîn. (pênase: kêmasî, hêma: a^1)
4. Feysel paşa û hevalê xwe ji mal derdikevin. (pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B^3)
5. Diçine ser kanîyekê li wê derê kiçkekê dibînin. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
6. Diçin wê kiçkê bo Feysel paşa dixwazin û daweta wan dikin. (pênase: zewicîn, hêma: W^0)

Rêzebûyer II

7. Berbelavbû ku Feysel paşa bo xwe jinkeka înay gelek ya can û berketîye. Navê wê jî Nazikcema e. (motîvasyon – Mtv)
8. Heyranê Ereb jî gulêbû ku Feysel paşa yê ziwicî ew çu pîrozbahîya wî. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
9. Heyranê Ereb hespekê bayî hebû gava çoye sera Feysel paşa xulamên Feysel paşa hespê wî bire def mahîna Feysel paşa. (hêmana peywendîyê - §)
10. Gava Heyranê Ereb rabû dabiçîte mal li ber derî hespê xwe gelek bêhal dît. Ji ber hindê rabû li gel Feysel paşa şerkir. (pênase: pevçûn/şer, hêma: H^1)
11. Nazikcema hat kete nav şerê wan. Heyranê Ereb destê xwe li Nazikcema da û dana pişt xwe û revî çu bo xwe bir. (pênase: pêşwazîkirin, hêma: K^1)
12. Heyranê Ereb xwe li hespê xwe yê bay sîyarkir vegeîya mala xwe. (pênase: vegeî, hêma: \downarrow)
13. Milletê Feysel paşa dane dûv Heyranê Ereb. (pênase: şopandin, hêma: Pr^6)
14. Negehiştine Heyranê Ereb, wî jina Feysel paşayî bo xwe bir. (pênase: zewicîn, hêma: W^0)

Rêzebûyer III

15. Feysel paşa dixwast ku biçît Nazikcemala xwe bînît. **(pênase: kêmasî, hêma: a¹)**
16. Feysel paşa ma heta canî mahîna wî mezin bû. Rabû xwe li canî mahîna xwe siwarkir û ço li duv Heyranê Erep ket. **(pênase: çûyîn, hêma: ↑)**
17. Feysel paşa ço Musilê def nalbendekî gotê hespê min nalbike. Nalbendî berêxwedayê gotê hespête tovê hespê Heyranê Ereb e. **(hêmana peywendîyê - §)**
18. Feysel paşa û nalbent axiftin. **(pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D²)**
19. Feysel paşa gote nalbendî ez li Heyranê Erep digirim cihê wî nişa min bide. **(pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E²)**
20. Nalbendî cihê Heyranê Erep û rêya çûna wê derê nîşa Feysel paşa da. **(pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²)**
21. Feysel paşa xwe li hespê xwe siyarkir çu adê heft behra. **(pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwitî an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwitî, hêma: G²)**
22. Çû ser kanîyekê li wê derê Nazikcemal dît. Gotê were li gel min da te bibem lê Nazikcemalê qebûl nekir û gotê: “Ez dê bote xwîşka wî Sitîyê rêkeme vêderê bo xwe wê bibe û here.” **(hêmana peywendîyê - §)**
23. Sitî diçîte ser kanîyê avê Feysel paşa wê bo xwe dibet diçîte meyadanekê li wê derê Heyranê Erep têt û her du li wê derê bi şer diçin. **(pênase: pevçûn/şer, hêma: H¹)**
24. Feysel paşa li wê meydanê Heyranê Erep dikujît û diçît mala wî da Nazikcemalê jî bibet. **(pênase: serkeftin, hêma: J¹)**
25. Nazikcemal destê du eyalên xwe digirît diçîte serê qesrê û xwe bi eyalve tavête behrê de.
26. Feysel paşa jî sitî xanimê û serê Heyranê Erep tîne bajarê Qeyserîyê. **(pênase: veşer, hêma: ↓)**
27. Feysel paşa û sitî daweta xwe dikin. **(pênase: zewicîn, hêma: W⁰)**

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

- I. $\alpha, \beta^2, a^1, B^3, \uparrow, W^0$
- II. $Mtv, \uparrow, \S, H^1, K^1, \downarrow, Pr^6, W^0$
- III. $a^1, \uparrow, \S, D^2, E^2, F^2, G^2, \S, H^1, J^1, \downarrow, W^0$

Di vê çîrokê de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Rêzebûyer tevlihev nayên li gorî rêzekê tîn. Rezebûyera yekem û duyem dikevîne nav sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-J û M-N tune. Rêzebûyera sêyem dikeve sinifa ku di nav de cote elementên H-J heyî. Di vê çîrokê de 31 fonksiyon nînin lê fonsiyonên heyî li rêbaza ku Propp dîyarkirî tîn.

Gava em li heft rolên sabît ku di çîrokan de diborîn dinêrîn di vê çîrokê de tabloyeka wiha derdikeve pêş me: *leheng*, di rêzebûyera yekem û sêyem de Feysel Paşa ye lê di rêzebûyera duyem de Feysel Paşa, dikeve rola *êrişkar (kesê/a xirab)*, û *leheng* dibe Heyranê Erep. Di rêzebûyera sêyem de *êrişkar(kesê/a xirab)*, dibe Heyranê Erep. *Prenses (Paşa)*, di her sê rêzebûyera de Nazikcemal e lê di rêzebûyera sêyem de xwişka Heyranê Erep Sîfî jî dibe *Prenses (Paşa)*. *Alîkar*, di rêzebûyera yekem de nîne di rêzebûyera duyem û sêyem de hespê bayî ye. *Bexşgêr*, di rêzebûyerên yekem û duyem de nîne di rêzebûyera sêyem de nalbend e. Di her sê rêzebûyera de jî *şandiyar (hinêryar)* û *lehengê direwîn* cih nagire.

2.1.8. Analîza Keçelok

Rêzebûyer I

1. Gotin zilamakê heft kûr hebûn û nav van heft kûran da yêk jî keçelok bû.
(pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Zalamî rezêk hebû diz elimtibûn her şev diçûna nav. Hindî birayên keçelok diçûne ber jî nedîşîyan dizan bigirin. (pênase: xirabî, hêma: A^3)
3. Rojekê keçelokî gote babê xwe ivşeve ez biçime ber rezî belkî ez dizan bigirim. Babê wî jê bawernekir bes gotê dê here ka dê ku key? (pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B^2)
4. Keçelok diçîte ber rezî xwe li ser darekê diveşêrît. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
5. Her du dizan dikujît. (pênase: serkeftin, hêma: J^5)
6. Keçelok dizivirît diçîte mal. (pênase: veger, hêma: \downarrow)
7. Keyfa babê Keçelokî gelek têt gelek medhên wî diket. (pênase: zewicîn, hêma: W^3)

Rêzebûyer II

8. Birayên Keçelokî aciz dibin. Dibên divê em tiştêkî li Keçelokî bikeyn û ji wî xilas bibîn. (pênase: xapandin, hêma: η^1)
9. Keçelokî jî gel xwe diben diçin cihekî dibên li vê derê zilzîmet heye em biçin tê de binêrîn ka çi heye? (pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ^1)
10. Hemî bira diçin dinêrin dizivirin. Gava Keçelokî berdidene wê çalê de. Wî dihêline wêrê û dizivirin diçine mal. (pênase: xirabî, hêma: A^7)
11. Keçelok diçîte dinyayeke dî. Jinkekê dibîne ku bi destnivêja zelama hevîrî dike. Dibêje jinkê min bibe def paşayê gundî. Jinik jî wî dibete def paşay. (hêmana peywendîyê - \S)
12. Paşa dibêtê marekê heftser yêli ser kanîya me her roj heta em mirovekî nedeynê avê bo me bernadetin. (pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B^4)
13. Çi kesê wî heft serî bikujît jî ez dê kiça xwe demê. (motîvasyon – Mtv)
14. Keçelok şîrekî dixwazît. Dibêjît ez dê çim kujîm. (pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C)
15. Diçîte serê kanîyê cihê marê heftser. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
16. Li gel heftserî şerî diket. (pênase: pevçûn/şer, hêma: H^1)

17. Marê heftser dikujît. Ava gundî berdidet. (**pênase: serkeftin, hêma: J¹**)
18. Kiça paşay destê xwe di ava xwîn vedidet û li piştta Keçelokî didet. (**hêmana peywendîyê - §**)
19. Piştî ku marê heftser mirî û av hatî her êkî got eve min kuşt da paşa kiça xwe bidetê. (**pênase: îdfayên bêbingeh, hêma: L**)
20. Kiçkê got min ew kesê heft ser kuştî yê nîşan kirî. Dizanin ku Keçeloke we kirî. (**pênase: naskirin, hêma: Q**)
21. Keçelok diçîte def paşay. Paşa kiça xwe didetê. (**pênase: zewicîn, hêma: W⁴**)
22. Dibêjine Keçelokî were bibe paşayê gundê me. Keçelok qebûl naket dibêjît hûn min virêkene ser erdî da ez biçime mala xwe. Melhemekê bo çêdiken li çavê wî diden kiça paşay jî didene gel û carek dî derdikevîte ser erdî. Diçîte hal û meselê bo babê xwe dibêjîtin. Keyfa babê wî têtin. Dibêjît xweş mêrê mala me tu yî. (**pênase: veger, hêma: ↓**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

- I. $\alpha, A^3, B^2, \uparrow, J^5, \downarrow, W^3$
- II. $\eta^1, \theta^1, A^7, \S, B^4, Mtv, C, \uparrow, H^1, J^1, \S, L, Q, W^4, \downarrow$

Di vê çîrokê de du rêzebûyer derdikevin pêş me. Rêzebûyer tevlihev nayên li gorî rêzekê tên. Rêzebûyera yekem dikeve sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-J û M-N tune. Rêzebûyera duyem dikeve sinifa ku di nav de cote elementên H-J heyî. Rêzebûyer û fonksiyonên vê çîrokê li rêbaza Propp tên. Di rêbaza Propp de di fonksiyona “XXXI.) Leheng dizewice û dertê ser text.(W)” binfonksiyonên $W^0, W^0, W_0, W^1, W^2, W^3$, hene lê li çîroka me nayên. Me li vê derê binfonksiyona W^4 (Leheng bi prensesê re dizewice lê nabe qral.) lê zêde kirîye.

Di vê çîrokê de heft rolên sabît hemî nînin. *Leheng*, keçelok e. Di rêzebûyera yekem de dizan dikuje, di rêzebûyera duyem de jî marê heftser dikuje. *Êrîşkar (xayîn)* di rêzebûyera yekem de diz in, di rêzebûyera duyem de pêşiyê birayên keçelokî paşê jî marê heftser e. *Prensês (paşa)*, kiça paşayê gundê li bin zemîn e. *Lehengê direwîn* di dawîya rêzebûyera duyem de xelkê gundê paşayî ne. Her êkî digot marê heftser min kuştî ye. Rolên *şandyar (hinêryar)*, *alîkar* û *bexşgêr* di vê çîrokê de nînin.

2.1.9. Analîza Xwîşka Heft Bira

Rêzebûyer I

1. Kiçkek bû heft birayêk wê jî hebûn. Jinbabekek hebû jinbaba wê jî kiçkek hebû. (pênase: rewşa destpêkê, hêma: α)
2. Hindîke ew kiçka xwîşka heft bira gelek û gelek ya can bû. Ya dîtirê go ya çivêl bû hiştî heledîna bû. (motîvasyon – Mtv)
3. Go ew jî radbin ewa derdiêxin. Çav pênarabûn ew derêxistin. Çon erdekî bo xwe xanyek çêkir çone têve. (pênase: dûrketin, hêma: β^3)
4. Rojekê agirê wan xilas dibît. (pênase: kêmasî, hêma: a^5)
5. Ew jî ronahîyekê ji durve dibînît dibêjît ez dê çim agirî jî wê ra he înim. (pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C)
6. Go d'çîtin hêdîka derî vedketin d'nêrîtê pîrhevîyeka d'wêrê ve ya nivistîye d'xewe. (pênase: çûyîn, hêma: \uparrow)
7. Ew jî radbîtin du sê peleka bo xwe d'kete ser devê hestûka xwe hêdîka derî d'girîtin. (pênase: pêşwazîkirin, hêma: K^1)
8. Hekû j'mal hat go gulolka wê ya armûşê ya d'berûka wê da bû. (hêmana peywendîyê - §)
9. Kiçik agirê xwe dibêt û diçîte mal. (Pênase: Veger, Hêma: \downarrow)
10. Ew pîrhevî radbît bêhna mirovad d'çîtê. L'wara d'gerhîtin l'ber serî berêxwedidetinê aşareta serê tavê yê maye l'ber derî û gulolika xilas bûy. Go ew jî rabû hema ew gulolik hilkir û her hat û her hat û her hat û heta hatiye mala kiçkê. (pênase: şopandin, hêma: Pr^5)
11. Pîrhevî çu ber derê mala kiçkê gote kiçkê derî li min vekê. Kiçik tirsu go dê min û birayê min xwet der lê ne vekir. Cara dî pîrhevîyê gotê tilya dî kuna derî ra derbêxe, kiçkê derêxistin pîrhevîyê ji tilya wê mêt û çu. (pênase: alîkarî, hêma: Rs^8)
12. Kiçik gelek bê hal ketibû. Birakêd wê gote xwîşka xwe ew te xêre. Kiçkê jî hal û meselêd xwe û pîrê bo gotibûn. (hêmana peywendîyê - §)
13. Birayêd kiçkê planek çêkir got heke vêcarê derî veke bila bîhete jorve. Vê carê jî pîr hevî hat birayêd kiçkê ew kuşt û avêted tenûrê da sot. (pênase: cezakirin, hêma: U)

Rêzebûyer II

14. Birayêd wê jî gotê: “Bira Fatma rabî vê xwelfiyê taze çî yê nehêliye l’vara hemê bike torbekî, ke tişteki bibe bike zêy bike avê da av bibet.”(pênase: qedexekirin, hêma: γ^1)
15. Go ew jî radbît kete tişteki hindek b’rêve dirişt. Heta ji wê te têt nêrîtê hemê d’bûne silk û pîvaz û kulund û tiştê we. Go ew jî rabû bermilekî înanî û hat bo birakêd xwe d’kete şîv. Pênase: (binpêkirina qedexeyê, hêma: δ)
16. Gava birayêd wê kiçkê wê şîvê dixwen hemî dibine pez. (pênase: xirabî, hêma: A^{11})
17. Nabeyneka ku birayêd xwe diçerandin sûwarek hat gotê: “kiçkê eve çî halê?” (pênase: fonksiyona pêşîn ya bexşger, hêma: D^2)
18. Kiçkê mesele bo got. (pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E^2)
19. Zelandî go: “Here ber ava henê, heft şivkêd hinarê bo min bîne kata hinara êk salî. Tu jî here ber heft mila bikeve. Ber heft mila bikeve û rohdika girî jî j’çavêd te nehêtin paşê heta wextekî were.” (pênase: fonksiyona pêşîn ya bexşger, hêma: D^7)
20. Jinik jî rabû çî şivik bo înanî û dane destê wî camêrî û ew çî ber heft mila ket. (pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E^7)
21. Zelandî ew berxik dane ber şivka şeş bûne mirov birayê biçûk ji ber ku xwişka wî kire girî nivî bû mirov nivî ma pez. (pênase: pêşwazîkirin, hêma: K^8)
22. Birayêd kiçkê kiçik da wî suwarî. Kiçkê jî birayê biçûk da li gel xwe û li gel suwarî çî. (pênase: veger, hêma: \downarrow)

Rêzebûyer III

23. Mane wesankî heta rabbê alemê we hezkirî heta sala paştirê Xwidê kurkek da wê jinkê, nav derket go paşay bo xwe kiçeke gelek can ya înay. (hêmana peywendîyê - \S)
24. Jinbaba wê û kiça wê zanî ku eve Fatma ye. Rabûn çone sera kiçkê. (pênase: agahî berhevkin, hêma: ζ^1)
25. Diçine wêrê go ez xesya te me eve jî gotê kiça mine. (pênase: xapandin, hêma: η^1)

26. Fatmayê jê bawer kir û ew mane lî def kiçkê. (**pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ^1**)
27. Rojekê jinbabâ wê û kiça xwe planek çêkir gote Fatmayê were em biçîne hemamê. Gava çûne hemamê wa şeyek li nav serê Fatmayê da û havêtê binê bîrekê de. (**pênase: xirabî, hêma: A¹⁵**)
28. Kiça jinbabê cilêd Fatmayê kirne ber xwe û çu şûna wê. (**pênase: xirabî, hêma: A¹²**)
29. Gote paşay ez dixwazim tu bo min berxkê serjêkey. (**pênase: kêmasî, hêma: a⁶**)
30. Berxik jî direve diçe serê bîre li gel xwîşka xwe diaxive. (**hêmana peywendîyê - \S**)
31. Paşa diçe ser bîrê jinka xwe jê derdiêxe. (**pênase: alîkarî, hêma: Rs⁹**)
32. Paşa radibe jinbaba wê û kiça wê herduyan dikuje. (**pênase: cezakirin, hêma: U**)
Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:
- I. $\alpha, Mtv, \beta^3, a^5, C, \uparrow, K^1, \S, \downarrow, Pr^5, Rs^8, \S, U,$
 - II. $\gamma^1, \delta, A^{11}, D^2, E^2, D^7, E^7, K^8, \downarrow$
 - III. $\S, \zeta^1, \eta^1, \theta^1, A^{15}, A^{12}, a^6, \S, Rs^9, U$

Di vê çîrokê de sê rêzebûyer derdikevin pêş me. Rêzebûyer tevlihev nayên li gorî rêzekê tên. Çîrok dikeve nav sîmfa çîrokên ku di nav de cotê H-J û M-N tune. Çîrok bi xayîntiya jinbaba kiçkê destpêdike û bi mirina jinbaba wê jî xilas dibe. Divê çîrokê de *leheng*, Fatma ye(xwîşka heft bira), *prensês*, ji ber ku leheng jinike prensês nînê lê *prens* heye ew jî suwar e(kurê paşay), *alîkar* jî suwar e(kurê paşay), *êrîşkar* (*kesê/a xirab*), di rêzebûyera yekem de jinbaba kiçkê ye. Di serê çîrokê de ji ber ku Fatma ji kiça jinbabê cantire jinbabê cawpênarabin û Fatmayê bi bira ve dertêxîtin. Di rêzebûyera duyem de *êrîşkar* dibe pîrhevî. Lê di rêzebûyera sêyem de *êrîşkar*, bi temamî jinbaba kiçkê û kiça jinbaba wê ne. *Bexşgêr*, suwar e(kurê paşay) birakên Fatmayê yên dibûne berxik carek dî saxdiket. *Şandyar* (*hinêryar*), *lehengê direwîn*, di vê çîrokê de nînin.

Di vê çîrokê de 31 fonksiyonên ku Propp dîyarkirîn hemî nînin lê rêza fonksiyonan li gorî pergala dîyarkirî ye. Di cihekî de heman fonksiyon du car peyhev hatine.

2.1.10. Analîza Mîrza Mihemed

Rêzebûyer I

1. Kurê paşayekî hebû. (**pênase: rewşa destpêkê, hêma: α**)
2. Kurê paşay çu d' nêrîtinê sê kiçêd feqîrekî yê li ber berojkekî yê bo xwe diaxivin. (**hêmana peywendîyê - §**)
3. Ya mezin digot: "Xwezî ji xêra Xwidê ra kurê paşay ez bo xwe biribama ez da bo şîlanê bema kolanê ji dintkekê." Ya dî digot: "e da bo mehfûrekê çêka j' biskekê." Ya biçûk got: "Rabbê alemê da du biçûka deta vê jinkê da kurkî zêr jêvebina, kiçkê zîv." (**motîvasyon – Mtv**)
4. Kurê paşay her sê kiçka bo xwe dibet. Her du kiçkêd dî ji ya biçûk heznedikir. (**hêmana peywendîyê - §**)
5. Xwidê du biçûkan didete kiçka biçûk. Kurkî zêr jêvedbin, kiçkê jî zîv. Ew jî rabûn ev biçûke birin kirned pêçolka da avêtine rûbarî û xwîşka xwe kired kevilekê hirçê de bir ser derê xanî vekir. Du kûçkêd seya jî îrandin danade def jinkê go eve eyalê wêne. (**pênase: xirabî, hêma: A¹⁰**)
6. Aşvanekî pêçolka wan girt. Bir serê wan şuşt dît ku kurkî zêr, kiçkê jî zîv yê jêvedibin. Aşvanî û jinka wî destavêtê bûne da û babên wan her du eyal bo xwe xwidankir. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K**)
7. Ew jî fehmakdibin diçine nav eyalî, hindêk dibênê: "Dê here, day teraşêd bab gûnî, herin gotê hûn li vêrê nabin hûn ji kîrê hatîne, hûn ê ji avê girtîn." (**hêmana peywendîyê - §**)
8. Ew diçine mal dibêjine aşvanî bo me rastiye bêje. Aşvan jî dibêjît min hûn ê ji avê girtîn. Ew jî radbin ji wê derê diçin dibêjin em dêçîn li qedera xwe gerhîn. (**pênase: vejer, hêma: ↓**)

Rêzebûyer II

9. Kurik û kiçik diçine erdekî bo xwe qesreka gelek mezin û can avadiken. Her kes dibêjît eve qesra kêye. Dibêjin qesra Mîrza Mihemed e. (**hêmana peywendîyê - §**)
10. Xaleta Mîrza Mihemed gotê te nevêtin eve ew bin ho lê hatîne he. Radbîtin çîtin lê dibîte mêhvan, lê dibîte mêhvan dizanît ku eve xarzeyên wêne ewên avêtîne avê. (**pênase: agahî berhevkin, hêma: ζ^1**)

11. Xaleta wan got wila heke paşa bizanît eve eyalên wî ne dê me bikujît. Destavêtê plana çêkirinê. Ço qesrê gote xwîşka Mirza: “Qesra hewe xweş qesr e belê vê qesrê şaxêd fil û kerkedana jê kê m e. Xwe nesaxke bêje birayê xwe here bîne heke dê mirim. Ew dêçît înit.” (pênase: xapandin, hêma: η¹)
12. Kîçkê ji wê jinkê bawer kir. (pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ¹)
13. Xwîşka Mîrza jî wekî jinkê gotî xwe nesax kir gote birayê xwe here bo qesra me şaxêd fil û kergedana bîne. Heke ez dê mirim. (pênase: kêmasî, hêma: a³)
14. Birayê xwe rêdikete şaxêd fil û kergedana. (pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B²)
15. Mîrza Mihemed diçît. (pênase: destpêkirina çalakiya dijber, hêma: C)
16. Ji mala xwe derdikevît diçîte rêyekê. (pênase: çûyîn, hêma: ↑)
17. Pîremêrek derdikevîte ser rêka wî. Dibêjît: “Dê ku key?” (pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D²)
18. Go: “Wila xwîşka min a nesaxe, hal û qesêd wê eve ne. Yê gotî heke şaxêd fil û kergedana ne îni bo qesra xwe e dê mirim.” (pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E²)
19. Pîremêr jî rabû cihê şaxêd fil û kergedana nîşan da. (pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²)
20. Pîremêrî rêya çona wêrê û rêya bidestêxistina şaxêd fil û kergedana nîşan da. (Pênase: Di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, Hêma: G⁴)
21. Fîl û kergedan dibetilin Mîrza jî diçît li nav fil û kergedana dikevît. (Pênase: Pevçûn/Şer, Hêma: H⁴)
22. Fîl û kergedan dikujît. (Pênase: Serkeftin, Hêma: J⁵)
23. Mîrza şaxêd fil kergedana bidestêxistin. (Pênase: Pêşwazîkirin, Hêma: K⁴)
24. Şaxêd xwe înan zivirî hate def pîremêrî. Wî jî gotê careka dî nehêyeve. Mîrza rabû ço qesra xwe. (Pênase: Veger, Hêma: ↓)

Rêzebûyer III

25. Xaleta wan careka dî ço qesrê gote xwîşka Mirza: “Qesra hewe xweş qesr e belê vê qesrê teştka reqasker û kirasê reqeqî jê kê m e. Xwe nesaxke bêje birayê xwe here bîne heke dê mirim. Ew dêçît înit.” (pênase: xapandin, hêma: η¹)

26. Kiçkê ji wê jinkê bawerkir. (**pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ^1**)
27. Xwîşka Mîrza jî wekî jinkê gotî xwe nesaxkir gote birayê xwe here bo qesra me teştka reqasker û kirasê reqreqî bîne. Heke ez dê mirim. (**pênase: kêmasî, hêma: a^3**)
28. Birayê xwe rêdikete teştka reqasker û kirasê reqreqî. (**pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B^2**)
29. Mîrza Mihemed diçît. (**pênase: destpêkirirna çalakiya dijber, hêma: C**)
30. Ji mala xwe derdikevît diçîte rêyekê. (**pênase: çûyîn, hêma: \uparrow**)
31. Mîrza Mihemed diçît pîremêrek derdikevîte ser rêka wî. Dibêjîtê: “Dê ku keyeve?” (**pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D^2**)
32. Go: “Wîla xwîşka min a nesaxe, hal û qesêd wê eve ne. Yê gotî heke teştka reqasker û kirasê reqreqî ne îni bo qesra xwe e dê mirim.” (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E^2**)
33. Pîremêr jî rabû cihê teştka reqasker û kirasê reqreqî nîşa da. (**pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F^2**)
34. Pîremêrî rêya çona wêrê û rêya bidestêxistina teştka reqasker û kirasê reqreqî nîşa da. (**pênase: di navbera du qiralfiyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti, hêma: G^4**)
35. Ew jî radbît bi şiklê pîremêrî gotî diket û diçîte cihê teştka reqasker û kirasê reqreqî. Teştka reqasker û kirasê reqreqî ji cihê lê vedket. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K^4**)
36. Xwe li hespê xwe sîyar diket û dizivirît. (**pênase: veger, hêma: \downarrow**)
37. Dêw di dete dûv Mîrza. (**pênase: şopandin, hêma: Pr^6**)
38. Ji ber kû hêj teştka reqasker û kirasê reqreqî nehilgirtî bi gotina pîremêrî di rê da hin tişt kiribûn ji destê dêwî xilas dibe û diçe qesra xwe. (**pênase: alîkarî, hêma: Rs^{11}**)

Rêzebûyer IV

39. Xaleta wan careka dî çu qesrê gote xwîşka Mîrza: “Qesra hewe xweş qesr e belê vê qesrê tişte jê kême. Ew jinkeke navê wê Milhem e.” Xwe nesaxke bêje birayê xwe here bîne heke dê mirim. Ew jî dêçît înit.” (**pênase: xapandin, hêma: η^1**)

40. Kiçkê ji wê jinkê bawerkir. (**pênase: tevî tawanê bûn, hêma: 0¹**)
41. Xwîşka Mîrza jî wekî jinkê gotî xwe nesaxkir gote birayê xwe: “Mirada min ew e ku biçî piştta berê ker, pişt adê heft behra bo xwe Milhemê tu bînî. Heke ez dê mirim.” (**pênase: kêmasî, hêma: a³**)
42. Birayê xwe rêdikete Melhema li adê heft behra. (**pênase: qasidî, kêlîya derbasîyê, hêma: B²**)
43. Ew jî radbît singekî l’ dîwarî d’kutît, şîrê xwe go d’kete dîwarî ra, dîwarê qesrê. Go: “Çî gava çipka xwînê ji vî şîrî ket tu bizanî ez çom” gote xwîşka xwe. (**hêmana peywendîyê - §**)
44. Mirza Mihemed diçît. (**pênase: destpêkirirna çalakiya dijber, hêma: C**)
45. Ji mala xwe derdikevît diçîte rêyekê. (**pênase: çûyîn, hêma: ↑**)
46. Mirza Mihemed diçît pîremêrek derdikevîte ser rêka wî. Dibêjîtê: “Dê ku keyeve? Ma min negotibû te careka dî nehêyeve?” (**Pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D²**)
47. Go: “Wîla xwîşka min a nesaxe, hal û qesêd wê eve ne. Ya gotî heke tu ne çî bo xwe Milhemê bînî e dê mirim.” (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E²**)
48. Pîremêr jî rabû cihê Milhemê nîşa da. (**pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²**)
49. Pîremêrî rêya çona wêrê û rêya bidestêxistina Milhemê nîşa da. Ew jî radbît gotinêd pîremêrî gotinê hemya bicihtînî û diçîte cihê Milhemê. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwitî an jî bi hevrêtîya rêberêkî rêwitî, hêma: G⁴**)
50. Gava li Milhemê dikete gazî wê hay jê nabît û Mîrza Mihemed bi temami dibîte ber. (**pênase: nîşana taybet, hêma: I¹**)

Rêzebûyer V

51. Gava Mîrza bûye ber çipkeka xwînê ji şîrê Mîrza yê ku qutaye didîwarî ra hat. (**hêmana peywendîyê - §**)
52. Xwîşka Mîrza Mihemed diçît. (**pênase: destpêkirirna çalakiya dijber, hêma: C**)
53. Ji mala xwe derdikevît diçîte rêyekê. (**pênase: çûyîn, hêma: ↑**)
54. Diçît pîremêrek derdikevîte ser rêka wê. Dibêjîtê: “Dê ku key?” (**pênase: fonksiyona pêşin ya bexşger, hêma: D²**)

55. Go: “birayê min hatiye lê nezivirîye ez dûv wî de hatîme.” (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E²**)
56. Pîremêrî rêya çona nik Melhemê nişa wê da. (**Pênase: girtina objeya sêhrî, hêma: F²**)
57. Pîremêrî rêya çona wêrê û rêya bidestêxistina Milhemê nîşa da. Ew jî radbît gotinêd pîremêrî gotinê hemya bicihtînît û diçîte cihê Milhemê. (**pênase: di navbera du qiralîyetan de rêwîtî an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîtî, hêma: G⁴**)
58. Ew rabû çu cihê Melhemê gazîkirê Melhemê caba wê da. Paşê jinik rabû menceleka avê kelkir çipik li wan beran reşandin hemî rabûneve. (**pênase: pêşwazîkirin, hêma: K⁸**)
59. Melhemê got ez bo Mîrza Mihemed im. Mîrza Mihemed û xwîşka xwe Melhem hilgirt û vegeryan hatine qesra xwe. (**pênase: vejer, hêma: ↓**)
60. Daweta Melhemê û Mîrza Mihemed kir. Leheng dizewice û dertê ser text. (**pênase: zewicîn, hêma: W⁰**)

Rêzebûyer VI

61. Navê Mîrza Mihemed û qesra wî gelek berbelav bû. (**hêmana peywendîyê - §**)
62. Paşayê babê Mîrza radbît Mîrza Mihemed û jina wî û xwîşka wî gazîdikete zadî. Xaleta wan radbît jehrê dikete nav zadê wan. (**pênase: xapandin, hêma: η³**)
63. Melhemê gote Mîrza: “Heku em çoyne mala paşay bo xwarinê heta ez nebêjime te dest bi zadî xwarinê neke.” (**pênase: tevî tawanê bûn, hêma: θ⁴**)
64. Diçîne mala paşay bo zadî dibêjin dê keremken zadî bixwen. Melhem kêtkekê ji koşa xwe dertêxît diçîte ser zadî zadî dixwet û pêdimirît. Ew jî radbin zadî naxwen dizivirine qesra xwe. Mîrza Mihemed hal mesele zanîn. Careka dî wan zad çêkir û paşa gazîkir. Gote paşay divê tu bi herkesê xwe ve bihêy. (**pênase: reaksiyona lehengî, hêma: E⁸**)
65. Paşa jî bi jinêd xwe ve diçîte qesra Mîrza Mihemed. Li wê derê Mîrza Mihemed meselê bo babê xwe dibêjît û bab û eyalên xwe pêk tene derê. Paşa rabû her du jinêd xwe ewêd eve îname serê jina wî ya biçûk kuştin. (**pênase: cezakirin, hêma: U**)

Gava ku em li hemî fonksiyonên çîrokên dinêrîn şemayeke wiha derdikeve pêş me:

- I. $\alpha, \xi, \text{Mtv.}, \xi, A^{10}, K, \xi, \downarrow$
- II. $\xi, \zeta^1, \eta^1, \theta^1, a^3, B^2, C, \uparrow, D^2, E^2, F^2, G^4, H^4, J^5, K^4, \downarrow$
- III. $\eta^1, \theta^1, a^3, B^2, C, \uparrow, D^2, E^2, F^2, G^4, K^4, \downarrow, \text{Pr}^6, \text{Rs}^{11}$
- IV. $\eta^1, \theta^1, a^3, B^2, \xi, C, \uparrow, D^2, E^2, F^2, G^4, I^1$
- V. $\xi, C, \uparrow, D^2, E^2, F^2, G^4, K^8, \downarrow, W^0$
- VI. $\xi, \eta^3, \theta^4, E^8, U$

Di vê çîrokê de şeş rêzebûyer derdikevin pêş me. Rêzebûyer tevlihev nayên li gorî rêzekê tên. Ji bilî rêzebûyera duyem hemû rêzebûyerên di dikevîne sinifa çîrokên ku di nav da cote elementên H-J û M-N tune. Rêzebûyera duyem dikeve sinifa ku di nav de cote elementên H-J heyî. Rêzebûyer û fonksiyonên vê çîrokê li rêbaza Propp tên.

Gava em li heft rolên sabît ku di çîrokan de diborîn dinêrîn di vê çîrokê de tabloyeka wiha derdikeve pêş me. Di her şeş rêzebûyeran de jî *leheng* Mîrza Mihemed e. *Êrîşkar(kesê/a xirab)* di van şeş rêzebûyeran de bi sê kesan derdikeve pêş me. Di rêzebûyerên I, II û IV de bi aşîkarî *êrîşkar(kesê/a xirab)* xaleta Mîrza Mihemed e. Di rêzebûyerên III, IV û V de li gel xaleta Mîrza wek *êrîşkar* hin karakterên di derdikevin pêş me. Di rêzebûyera III'de dêw, di rêzebûyerên IV û V de Melhem wek *êrîşkar* derdikeve pêş. *Bexşgêr* di rêzebûyera I û VI'an de nîne lê di rêzebûyerên II, III, IV û V de *bexşgêr* ew pîremêr e yê ku di her careke derdikete ser rêya Mîrza Mihemed. *Alîkar*, di rêzebûyera I'de aşvan, di rêzebûyera II û IV'de pîremêr, di rêzebûyera III'de mih, gurg, behir û hesp, di rêzebûyera V'de xwişka Mîrza Mihemed û di rêzebûyera VI'de jî Melhem e. *Prensês (Paşa)*, di rêzebûyera I'de paşayê babê Mîrza Mihemed, di rêzebûyerên IV, V, VI'de Melhem e. Di rêzebûyerên II û III'de rola *Prensês (Paşa)* nîne. *Şandyar (Hinêryar)*, di rêzebûyerên II, III û IV de xwişka Mîrza Mihemed e. Di rêzebûyerên I, V û VI' de rola *Şandyar (Hinêryar)* nîne. Di vê çîrokê de rola *lehengê direwîn* di çî rêzebûyeran de nîne.

Di rêbaza Propp de di fonksiyona “VII. Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alîkarîya dijminê xwe kiriye.(θ)” binfonksiyonên $\theta^1, \theta^2, \theta^3$ hene lê eve li çîroka me nayên. Me li vê derê binfonksiyona θ^4 (*Leheng plana êrîşkar dizane û ji êrîkar bawernake lê xwe wek jêbawerkirî nişa dide*) lê zêde kirîye. Bi heman şiklî di fonksiyona “XVI.) *Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî*

hev. (H)''bin fonksiyonên H^1 , H^2 , H^3 hene lê eve li çîroka me nayên. Me li vê derê bîfonksiyona H^4 (Êrîşkar di rewşeke wisa de ye ku neşêt êrîşî leheng bike, leheng êrîşkar dîkuje.) lê zêde kirîye.

3.2.FONKSIYONÊN HERÊMA COLEMÊRGÊ

Di çîrokên me de hemû fonksiyon û bin fonksiyonên ku Propp dîyarkirî nînin. Fonksiyon û binfonksiyonên ku di van çîrokên me de hey wiha ne:

Rewşa destpêkê: hêma: α

I.) Ji Malbatê yek dûrdikeve. Pênase: Dûrketin, Hêma: β

- Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî rengê teqez yê veqetîne tê dît. (β^2)
- Ji neslên nû yek ji malê vediqete. (β^3)

II.) Leheng bi qedexeyekê re rûbirû dimîne. Pênase: Qedexekirin Hêma: γ

- An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşan kirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn. (γ^1)
- Bi ferman an jî pêşnîyazek, rewşeke berevajî qedexeyê tê destnîşankirin. (γ^2)

III.) Qedexe tê binpêkirin. Pênase: Binpêkirina Qedexeyê Hêma: δ

- Rengê binpêkirina qedexeyê wekî rengê qedexeyê bixwe ye. (δ)

V.) Êrîşkar di heqê qurbanê xwe de agahîya berhev dike. Pênase: Agahî

Berhevkirin Hêma: ζ

- Êrîşkar (Xayin), bersivekê ji pirsê xwe re digire. (ζ^1)

VI.) Êrîşkar ji bo ku qurbanên xwe an jî serweta qurbanên xwe bi dest biêxe, hewl dide ku qurbanê xwe bixapîne. Pênase: Xapandin Hêma: η

- Êrîşkar dixwaze qurbanî/ê qanîh bike. (η^1)
- Êrîşkar hin rêyên dî yê xapînok an jî tirsêr bi kar tîne. (η^3)

VII.) Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alîkarîya dijminê xwe kiriye. Pênase: Tevlî Tawanê Bûn Hêma: θ

- Leheng ji êrîşkar bawer dike. (θ^1)
- Leheng plana êrîşkar dizane û ji êrîkar bawernake lê xwe wek jêbawerkirî nişa dide. θ^4

VIII.) Êrîşkar zîrarê dide yekî ji malbatê. Pênase: Xirabî Hêma: A

- Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zîrar dide zevîyan. (A^3)
- Êrîşkar, dibe sebeb ku yek ji nişkê ve berze bibe. (A^7)

- Êrîşkar ferman dide ku yekî/ê biavêjine behrê. (A¹⁰)
- Êrîşkar li yekî/ê an jî tişteki sêhrê dike. (wî/wê bi sêhrê vediguherîne tişteki di) (A¹¹)
- Êrîşkar yekê/î diêxe şuna yekê/î di. (A¹²)
- Êrîşkar yekê/î di cihekî de qilf dike an jî diavêje zindanê. (A¹⁵)
- Êrîşkar yekê/î mecbûr dike ku pê re bizewice. (A¹⁶)

VIII-a.) Ji Malbatê Yek Tişteki Berze Dike An Ji Dixwaze Tişteki Bi Dest Biêxe.

Pênase: Kêmasî Hêma: a

- Kêmasiya keçikeke nîşanî, kêmasiya dostekî. (a¹)
- Pêdiviya objeyekê ne sêhrî lê ecêb. Teyrê agir, werdeka pûrt zêr û hwd. (a³)
- Ji bo jîyînê, kêmasiya wasiteyên pêdivî, tiştên maqûl. (a⁵)
- Hin formên cuda. (a⁶)

IX.) Agahîya xirabîyê an jî kêmasîyê belav dibe, bi daxwaz an jî fermanekê serî li leheng tê dayîn, leheng tê şandin an jî diçe. Pênase: Qasidî, Kêlîya Derbasîyê

Hêma: B

- Hawara alîkarîyê tê kirin, dûre jî leheng tê şandin. (B¹)
- Leheng pêre tê şandin. (B²)
- Leheng ji mala xwe derdikeve rê. (B³)
- Agahîya felaketê belav dibe. (B⁴)

X.) Lehengê ku lê tê gerîn qebûl dike ku bikeve nava çalakîyê an jî biryara çalakîyê dide. Pênase: Destpêkirirna Çalakiya Dijber Hêma: C

- Pîrî caran di çîrokê de behsa vê kêlîyê nayê kirin lê berîya derketinê teqeze ku biryarek hatiye girtin. Ev kêlî an jî element di çîrokên ku leheng ji bo gerekê derdikeve rê de dertê pêş me.

XI.) Leheng ji mala xwe derdikeve. Pênase: Çûyîn, Hêma: ↑

- Ev çûyîn ji dûrketina berê ku bi hêmaya β'yê de derdikeve pêş me cudatir e.

XII.) Leheng, di imtîhan, lêpirsîn an jî êrîşek ku dê rê veke ku ew ê objeyeke sêhrî an jî alîkarek bi dest biêxe de, derbas dibe. Pênase: Fonksiyona Pêşin ya

Bexşger Hêma: D

- Bexşgêr, lehengî îmtîhan dike. (D¹)
- Bexşgêr silav dide lehengî û pirsan jê dike. (D²)
- Daxwazên dî. (D⁷)

XIII.) Leheng, reaksiyonê dide çalakîyên mirovê ku dê di pêş de bexşê bibexşîne wî Pênase: Reaksiyona Lehengî Hêma: E

- Leheng, silava bexşgêr digire/nagire. (E²)
- Leheng, daxwaza kesekê ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne/pêk naîne. (E³)
- Leheng, hin xizmetên/alîkarîyên dî dike. (E⁷)
- Leheng, bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrîşa xilas dibe. (E⁸)

XIV.) Objeya sêhrî ji leheng re tê dayîn. Pênase: Girtina Objeya Sêhrî Hêma: F

- Objey rasteras tê dayin. (F¹)
- Objey, li wî cihê ye, yê ku ji leheng re tê gotin. (F²)
- Objey tê çêkirin. (F³)
- Objey bi rasthatinî dikeve destê leheng. (leheng wê dibîne) (F⁵)

XV.) Leheng bi cihê ku objey li wê derê ye ve tê birin, ji bo wî rêberî tê kirin an jî tê birin. Pênase: Di navbera du qiralîyetan de rêwîti an jî bi hevrêtiya rêberekî rêwîti Hêma: G

- Leheng li ser erdê an jî li ser avê rêwîti dike. (G²)
- Ji leheng re rêbertî tê kirin. (G³)
- Ji leheng re rê tê nîşandan. (G⁴)

XVI.) Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev. Pênase: Pevçûn/Şer Hêma: H

- Leheng û êrîşkar li meydana şer dikin. (H¹)
- Êrîşkar di rewşeke wisa de ye ku neşetê êrîşî leheng bike, (H⁴)

XVII.) Nîşaneke taybet li leheng peyda dibe. Pênase: Nîşana Taybet Hêma: I

- Di bedena leheng de nîşanek peyda dibe. (I¹)

XVIII.) Êrîşkar têk diçe. Pênase: Serkeftin Hêma: J

- Êrîşkar li meydana şer têk diçe. (J¹)
- Êrîşkar bêy ku tu pevçûn biqewime tê kuştin. (J⁵)
- Leheng êrîşkarî (xayîn) dixapîne. (J⁷)

XIX.) Xerabîya di destpêkê de tê telafîkirin an jî kêmasî tê pêşwazîkirin.

Pênase: Pêşwazîkirin Hêma: K

- Objeya ku lê tê gerîn, bi zore an jî bi hîleyê/qurnazîyê tê revandin. (K¹)
- Bi destxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast encameke çalakîyên berê ye. (K⁴)
- Objeya ku lê tê gerîn, bi navgînîya objeyê sêhrî hemen tê bidestxistin. (K⁵)
- Bikaranîna objeya sêhrî, feqîrîyê-hejarîyê diqedîne/dawîya feqîrîyê-hejarîyê tîne. (K⁶)
- Kesê ku sêhr lê hatiye kirin vedigere şexsîyeta/nasnameya xwe ya berê. (K⁸)
- Êsîr/Dîl tê xilaskirin. (K¹⁰)

XX.) Leheng vedigere Pênase: Veger Hêma: ↓

- Veger û gihastin bi piranî bi heman rengî ne. Digel vê jî, pêdivî bi dirûveke taybet ya vegerê nîne. Di gihastinê de curbecur navgîn û serborî hene lê veger hemen pêk tê. Lê bi heman rengê gihastinê ye.

XXI.) Leheng Tê Şopandin. Pênase: Şopandin Hêma: Pr

- Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe. (Pr⁵)
- Şopîner hewl dide ku leheng bikuje. (Pr⁶)

XXII.) Bi hawara leheng de tê çûyîn Pênase: Alîkarî Hêma: Rs

- Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin. (Rs⁸)
- Di kêlîya ku dê leheng bê kuştin de, bi hawara wî ve tê gihastin. (Rs⁹)
- Astengên li rê de rêdidene lehengî. (Rs¹¹)

XXIV.) Lehengekî sextekar bi îdîayên bê bingeh derdikeve. Pênase: Îdîayên Bêbingeh Hêma: L

- Leheng ku vegere welatê xwe ev îdîa ji alî birayên wî ve tîne pêşxistin. Leheng ku vegere welatek dî, ev îdîa ji alî wezîr, general û hwd. dî ve tê pêşxistin. Birayên leheng îdîa dikin ku wan objeya sêhrî anîye û wezîr an jî generalê welatê bîyan îdîa dike ku wî ejderha tîk birîye.

XXVII.) Leheng tê naskirin Pênase: Naskirin Hêma: Q

- Leheng bi rêya nîşaneke taybet, birîn an jî objeyeke ku jê re hatiye dayin tê naskirin. Leheng di heman demê de ji ber ku karekî zor bi ser xistiye jî tê naskirin. Li dû dûrketinek dirêj jî tê naskirin.

XXX.) Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê cezakirin. Pênase: Cezakirin Hêma: U

- Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê kuştin, tê dûrxistin, bi dûva hespê ve tê girêdan an jî ew bixwe xwe dikuje û hwd. Carina jî efûyek esîlane bo wî tê derxistin. Bi piranî êrîşkar û lehengê sextekar yê ku di beşa duyem de dertê tê cezakirin.

XXXI.) Leheng dizewice û dertê ser text. Pênase: Zewicîn Hêma: W

- Leheng, jinê û welat bi hev re bi dest diêxe an jî pêşî nîvê qiraletîyê bi dest diêxe û piştî mirina dê û bav hemî qiraletîyê bi dest diêxe. (W^0)
- Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîne, di vê rewşê de nabe qral. (W^0)
- Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî regekî dî tê xelatkirin. (W^3)
- Leheng bi prensesê re dizewice lê nabe qral. (W^4)

ENCAM

Propp dibêje ji bo ku çîrok bi şikleke objektîf bihêne sinifandin du cote element hene. Ev elemente têkoşina li gel xayîn-serkeftin (H-J) û erka zor-çareserî (M-N) ne. Li gorî hebûn û nebûna van cotan çîrok dibine çar cure. Di vê lêkolînê de ev çar cure wiha ne:

- I. Çîrokên ku di nav de cotê H-J heye: Ehmed Çelebî(1), Hesên Lawê Hekarî(2), Serûrk(6), Heyranê Ereb(7), Keçelok(8), Mîrza Mihemed(10).
- II. Çîrokên ku di nav de cote elemantên H-J û M-N nîne: Teymemildar(3), Feqî(4), Heft Xwîşk(5), Xwîşka Heft Bira(9).

Çi çîrokên me nakevine nav cureyên “çîrokên ku di nav de cotê M-N heye” û “Çîrokên ku di nav de hem cotê H-J hem jî M-N heye.”

Nav çîrokan de Ehmed Çelebî ji 3, Hesên Lawê Hekarî ji 4, Teymemildar ji 5, Feqî ji 2, Heft Xwîşk ji 2, Serûrk ji 2, Heyranê Ereb ji 3, Keçelok ji 2, Xwîşka Heft Bira ji 3, Mîrza Mihemed ji 6 rêzebûyeran pêk tên. Rêzebûyer di hemû çîrokan de li gorî rêzekê tên tevlihev nayên.

Propp dibêje di çîrokeke derasa de, karakter di heft rolên sabît de derdikevin pêş me. Ev rol jî “*êrîşkar(kesê/a xirab)*, *bexşgêr*, *alîkar*, *prences*, *şandyar (hinêryar)*, *leheng*, *lehengê derewîn*” pêk tên. Di çîrokên me de ev heft role hemû pêkve di çîrokekê de qet cih negirtîne. Ji van heft rolan *leheng*, di hemû çîrokan de heye û ji bilî çîroka Heyranê Ereb(7) yek kese. Lê di çîroka Heyranê Ereb de du leheng hene. *Êrîşkar(kesê/a xirab)*, di hemû çîrokan de derdikeve pêş me. Di çîrokên Hesên Lawê Hekarî(2), Teymemildar(3), Feqî(4) û Ehmed Çelebî(1) de *êrîşkar(kesê/a xirab)*, yek kese lê di çîrokên di de ji yekî pêtir *êrîşkar* derdikevin pêş me. *Lehengê derewîn*, tenê di çîroka Keçelok(8) de derdikeve pêş. *Şandyar(hinêryar)*, di çîrokên Hesên Lawê Hekarî(2), Xwîşka Heft Bira(9) û Ehmed Çelebî(1) heye lê di çîrokên din de nîne. *Bexşgêr*, ji bilî çîrokên Feqî(4), Heft Xwîşk(5), Serûrk(6) û Keçelok(8) di hemû çîrokên din de cih digire. *Alîkar*, ji bilî çîroka Keçelok(8) di hemû çîrokên din de

heye. Di çîroka Mîrza Mihemed de çar alîkarên cuda hene lê di çîrokên din de alîkarek tene heye. *Prensese(babê wê)*, ji bilî çîroka Heft Xwîşk(5) di hemû çîrokên din de heye.

Propp ji bo analîza çîrokan 31 yek fonksîyon dîyarkirîne. Her fonksîyonekê jî gelek binfonksîyon hene. Dibêje dibe ku di hemû çîrokan de hemû fonksîyon nebin lê lazime fonksîyonên heyî li gorî rêza dîyarkirî bîn. Gava em li çîrokên xwe dinêrîn di çîrokên me de hemû fonksîyon nînin lê fonksîyonên heyî li gorî rêbaza Propp dîyarkirî tîn. Di çîrokên me de hin binfonksîyon hene ku di tabloya fonksîyona a Propp cih nagirin. Ji ber vê yekê me li hin fonksîyonan binfonksîyon lêzêdekirîne. Lêzêdekirinên ku me kirîn wiha ne:

Fonksîyona “VII.) Qurban tê xapandin û bi vî rengî qurbanî nexwestibe jî alîkarîya dijminê xwe kiriye.” sê ($\theta^1, \theta^2, \theta^3$) bin fonksîyon hene. Me bin fonksîyona “Leheng plana êrîşkar dizane û ji êrîkar bawernake lê xwe wek jêbawerkirî nişa dide. (θ^4)” lêzêdekirîye.

Fonksîyona “XVI.) Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev.” sê (H^1, H^2, H^3) bin fonksîyon hene. Me bin fonksîyona “Êrîşkar di rewşeke wisa de ye ku neşê êrîşî leheng bike, (H^4)” lêzêdekirîye.

Fonksîyona “XVIII.) Êrîşkar têk diçe” şeş ($J^1, J^2, J^3, J^4, J^5, J^6$) bin fonksîyon hene. Me bin fonksîyona “Leheng êrîşkarî (xayîn) dixapîne. (J^7)” lêzêdekirîye.

Fonksîyona “XXII.) Bi hawara leheng de tê çûyîn” deh ($Rs^1, Rs^2, Rs^3, Rs^4, Rs^5, Rs^6, Rs^7, Rs^8, Rs^9, Rs^{10}$) bin fonksîyon hene. Me bin fonksîyona “Astengên li rê de rêdidene lehengî. (Rs^{11})” lêzêdekirîye.

Fonksîyona “XXXI.) Leheng dizewice û dertê ser text.” şeş ($W^0, W^0, W_0, W^1, W^2, W^3$) bin fonksîyon hene. Me bin fonksîyona “Leheng bi prensesê re dizewice lê nabe qral. (W^4)” lêzêdekirîye.

Di çîroka Feqî(4) de fonksîyonek dî derdikeve pêş me ku di nav fonksîyonên Propp de nîne. Di vê çîrokê de fonksîyona “Bicihatina Qederê” heye û çîrok bi vê fonksîyonê xilas dibe. Ji ber bandora Îslamê dibe ku gelek çîrokên din yê Kurdan jî bi vê fonksîyonê xilas bibin.

Di çîroka Heft Xwişk(5) de fonksîyoneke wisa derdikeve pêş me ku di rêbaza Propp de cih nagire. Li gorî rêbaza Propp dawîya çîrokan bi zewaca lehengî yan bi xelatkirina lehengî xilas dibe. Lê di vê çîrokê de leheng dimire û eve jî dijî zewac an xelatkirina lehenge.

Li gorî lêkolînên me heta niha li ser çîrokên kurdî di mijarên curbecur de lêkolîn yên hatîne kirin. Lê heta niha lêkolînek rêk û pêk li ser mijara me nehatiye kirin. Ji ber vê yekê hêvîdarin ku ev lêkolîne ji bo lêkolînên dût re tîn bibe pêngavek biçûk. Me di vê lêkolînê de çend çîrokên herêma Colemêrgê li gorî rêbaza Propp analîz kirin. Lê tenê bi vê lêkolînê ve em neşên bibêjin ka rêbaza Propp li hemû çîrokên kurdî tê yan na. Li gorî vê lêkolînê em dişên bibêjin ku çîrokên derasayî yên herêma Colemêrgê hin kêmasî hebîn jî bi piranî li rêbaza Propp tîn. Ji bo ku em bişên bibêjin ka rêbaza Propp li hemû çîrokên kurdî yên derasayî tîn an na divê li gelek herêmên kurdan ev lêkolîne bihêne kirin û rêbaza Propp li gelek çîrokên di bihête tetbîqkirin.

KESÊN ÇAVKANÎ

1. Çîrok: “EHMED ÇELEBÎ”

Vebêjer: Sıddık Duran

Pîşe: Karmend

Herêm: Serispiyan/Çel

Temen: 53

Dîroka Berhevkinê: 07.02.2016

2.Çîrok: “KEÇELOK”

Vebêjer: Abdullah Sever

Pîşe: Karbes

Herêm: Colemêrg

Temen: 65

Dîrok Berhevkinê: 09.11.2018

3. Çîrok: “HESEN LAWÊ HEKARÎ”

Vebêjer: Kasimê Şêro (Ayaz)

Pîşe: Karbes

Herêm: Colemêrg

Temen: 68

Dîrok Berhevkinê: 30.07. 2018

4. Çîrok: “HEFT XWÎŞK”

Vebêjer: Hanîfe Taş

Pîşe: Bermalî

Herêm: Colemêrg

Temen: 55

Dîrok Berhevkinê: 12.02.2016

5. Çîrok: “FEQÎ”

Vebêjer: Tahir Timur

Pîşe: Cotkar
Herêm: Dêr/Colemêrg
Temen: 67
Dîrok Berhevkinê: 02.01.2016

6. Çîrok: “SERÛRK”

Vebêjer: Rukiye Duran
Pîşe: Bermalî
Herêm: Serispîyan/Çel
Temen: 67
Dîrok Berhevkinê: 30.01.2016

7. Çîrok: “TEYMEMILDAR”

Vebêjer: Rukiye Duran
Pîşe: Bermalî
Herêm: Serispîyan/Çel
Temen: 67
Dîrok Berhevkinê: 10.08.2018

8. Çîrok: “HEYRANÊ EREP”

Vebêjer: Rukiye Duran
Pîşe: Bermalî
Herêm: Serispîyan/Çel
Temen: 67
Dîrok Berhevkinê: 30.01.2016

9. Çîrok: “XWÎŞKA HEFT BIRA”

Vebêjer: Rukiye Duran
Pîşe: Bermalî
Herêm: Serispîyan/Çel
Temen: 67
Dîrok Berhevkinê: 27.01.2016

10. Çîrok: “MÎRZA MÎHEMED”

Vebêjer: Rukiye Duran

Pîşe: Bermalî

Herêm: Serispîyan/Çel

Temen: 67

Dîrok Berhevkinê: 31.07.2018

ÇAVKANÎ

- BAŞDAŞ, Servan. *Fonksiyonên Çîrokan di Perwerdehiyê de(Vekolîn-tekst-analîz)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mêrdîn, 2018.
- BOZKOYUN, Mehmet. *Beşek Ji Folklorê Kurdî: Çîrok*, Kovara Bingöl Yaşayan Diller Enstitüsü, 2015: 142-157.
- BOZKOYUN, Mehmet. *Çend Çîrokên Herêma Şêxan(Metn-Analîz)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bingölê, Bingöl, 2015.
- ÇIBLAK, Nilgün. *V. Propp'un Masal Çözümleme Metodu*, Kovara Türk Dili, 2005: 127-140.
- ÇOBANOĞLU, Özkul. *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Ankara: Akçağ, 2010.
- DEMİR, Bünyamin. *Çîrokên Kurdî li Gorî Motîf İndeksa Stith Thompson(Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrza Mihemed)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mardin, 2016.
- GÜNAY, Umay Türkes. *Elazığ Masalları ve Propp Metodu*, ç.2, Ankara: Akçağ, 2011.
- HAFIZOĞLU, Elif Berrak. *Azerbaycan Masalları Üzerine Bir Araştırma(Masalların Propp Yöntemiyle İncelenmesi)*, Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Atatürkê, Erzurum, 2005.
- HİKMET, Bedran. *Notên Dersa Wêjeya Gelêrî (Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê)*, Van, 2015-2016.
- HİKMET, Bedran. *Teoriyên Folklorê*, Diyarbakır: Lîs, 2016.
- KAPLAN, Leyla. *Di Çîrokên Hîzanê de Motîfên Dê*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mardin, 2018.
- KHIDHIR, Mohammed. *Ji bo Zarokan Çîrokên Ajalan (Mînak kovara heng 2001-2011)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Van, 2017.
- ÖZTÜRK, Mustafa. *Zûgotinok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de*, Kovara Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, c.3, h.2 (2016): 42.
- PERTEV, Ramazan. *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berwirdî - 1)*, İstanbul: avesta, 2015.

PROPP, Vladimir. *Masalın Biçimbilimi*, Mehmet Rıfat-Sema Rıfat (Wer.), ç.3, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2017.

RAHMAN, Mohammed Baiz. *Rola Folklorê di Perwerdekirina Zarokan de Mînak: Çîrok*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Van, 2016.

TARDUŞ, İbrahim. *Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdeya Zarokan de*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardin, 2015.

TAŞ, Erdal. *Motîfên Sereke Ji Çîrokên Gundê Serispiya Colemêrgê*, Teza Lîsansê, Zanîngeha Bingölê, Bingöl, 2017.

YILDIZ, Reşit Rojdar. *Di Edebiyata Zarokan de Çîrok*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Van, 2017.

YOUSSEF, Houssein. *Halep Türkmen Masallarının Propp Metodu Açısından Çözümlemesi*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Hacettepe, Ankara, 2014.

PÊVEK 1: METNÊN ÇÎROKAN

Ev çîroke ji gundên Geverê, Colemêrgê û Çelê hatine guhdarkirin û qeydkirin. Di nivîsîna çîrokan de çî lêguherîn nehatine kirin. Vebêjerê çîrokê kijan peyv bikaranîbe û bi kîjan şiklî gotibe çîrok jî wisa hatine nivîsîn.

Ev deh çîroke ji aliyê şeş vebêjêran ve hatine gotin. Du vebêjer jin û çar vebêjer jî zêde in. Temenê vebêjêrên çîroka teqrîbî şêst û pênc bû. Di berhevkirina çîrokan de arîşeya herî mezin xwe gehandina vebêjêrên çîrokan bû. Gelek caran li cihê xwe nebûn yan jî misaît nebûn. Hin caran vebêjêrên çîrokan kesên biyanî bûn. Ji bo ku baweriya wan bi me bê û bo me çîrokan bibêjin diviya em li gel kesekî niyas biçûna def wan. Ji ber gelek sedeman êdî çîrok gotin gelek kême bûye ji ber vê yekê kesên ku berê gelek çîrok dizanîn û di gotin niha gelek jibîrkirine.

Ji bo mijara teza xwe ez li çîrokên derasayî digeriyam lê gava diçûm def çîrokbêjekî gelek caran çîrokên ku kêrî şolê min neyên jî digotin. Ev deh çîrokên ku di vê tezê de hatine bikaranîn ji nav çîrokan hatine hilbijartin û nivîsîn.

1. EHMED ÇELEBÎ

Carekê j'cara rihme l'deybabên guhdara. Hebû hebû ke j'Xwidê mestir nebû ke j'beniyan direwîntir nebû. Pîrejînekê kurkek hebû. Dest avêtê, babê kurkî miribû, kurkê xwe xwidankir hêdî hêdî hêdî hêdî hêdî hêdî heta fehma bûy û vêca l'gel hat hêreve û wêve bûye pîspor filan bêhvan rojekê gote dayka xwe gotê ana, gotê dayê: “Şolê babê min çi bû babê min çi şol d'kir?” Gotê: “Kurê min babê te şivan bû, şivanê xelkê bû, şivanetî d'kir û xelkê jî pare d'dayê û em pê xwidan d'kirîn.” Go: “be ez jî dê çime ni pezî ez jî dê bime şivan.” Go: “dê biye şivan” Go: “belê” Go: “bila.” Go: “dê spêdê çime nî mixtarî dê bêjimê kurê min dê bîte şivan, bizna derbêxinê çiyay dê çîte ber.” mSpêdê rabû ço nik mixtarî. Gote mixtarî: “Kurkê min dê bîte şivanê bizna û bizna b'kene ber heqkê wî b'denê dê çîte ber.” Gotê: “xweş şol e xweş şol e hema bila karê xwe biket b'çîte rexê gundî her kesek dê bizinkêd xwe ajote wêrê dê çîte ber heta êvarê.” Kurkî bir ço ber bizna du roja sêya hindî hatê b'va bizna ne westa bir bir bûn, bêser û ber bûn, gurg ketê welhasilî kêm û kasî mişe hatine d'ortê da. Xelkê gazinde jê kirin hate mal gote da xwe: “Eve şolê babê min nîne heke ez da şem.” Go: “Şolê babê min çi ye bo min bêje da ez şolê babê xwe b'kem.” Da wî gotê: “Kurê min babê te govan bû d'ço ber heywana, heywanêd xelkê d'xwidan d'kirin û d'birin û xelkê jî pare d'dame mal d'dame me jî îdara xwe pêdkir.” Go: “Be ez dê bime govan, ez ne şême şivanîyê.” Rabû ço dev mixtarî dayka wî gotê wila kurkê min neşêt şivanîyê ket dê bîte govan, çîte ber heywana heke hûn bigirin kurê min dê bîte govan. Go: “Bila ser çava.” Rabû kurkê wê girt bûye govan hero da çîte rexê gundî kolanê her kesek da heywanêd xwe beta wêrê dûvda ajota govan jî da çîte ber heywana. Dê rojekê du roja, sê roja çar roja hindî hate va heywana da bişêt vêk det û cema ket. Neşîya çi teybîra lêket heta êvarê pê ve d'hate halê mirinê.

Rojekê heywanêd xwe daqulipandin binê girkekî da jorda veweşandine nav gundî heywan d'tozê werbûn b'xebarê werbûn berê xwe d'detê Xudê Teala gîyanî hespekê behrî bo l'nav heywana da derêxist. Berê xwe dayê god wila ev hespe heta nihe l'ber min nebû eve sê çar rojke ez ê l'ber min ev hespe taze min dît şiklê vî hespî teşkîlata wî b'Xudê eve hema min bo xwe dît. Hema bezî dersoka xwe tişteke xwe avête serê hespî û kêşa hesp kete dûv dîrek hate dêrê xanî gote da xwe: “Willahî eve şolê babê min nîne. Ez neşem govanîyê kem. Ka şolê babê min çi bû?” Go:

“Kurê min ev çî deware te înay ya kê ye te înay?” Go: “Wila eve ya min e min bo xwe dît. Eve hespê min e.” Kuro ka hespê kêye te dîtî filan bêhvan. Go: “Ne wila yê min e yê kesê nîne.” Dê go: “Madem yê te bîtin bo xwe xudanke.”

Du roja sêya pêve çon gote dayka xwe: “Ka şolê babê min çî bû? Bo min bêje da ez bikem.” Go: “Kurê min şolê babê te nêçîr bû. Nêçîrvanî d’kir, d’ço nêçîrê pez d’kuştin d’înan me jî d’xwar îdara xwe pê d’kir.” Go: “B’çî d’kuştin?” Go: “B’tivekê d’kuştin. Tiveka wî jî wahe me ya kirîye lîfê mirîşka piştî mirî, lîfê mirîşka ne me ya kirîye d’dîwarî ra mirîşk d’çine ser.” Wila bezî tivekê be tiveka bê ser û ber kirî ya hedimandî, pîskirî mirîşka ew çend sale lîfê mirîşka ne. Dest avêtê tiveka xwe temîz kir û şîst û paqîş kir û dest avêtê fişek û filan û bêhvan bo xwe b’dest êxistin, tiveka xwe avête milê xwe û yalla here ku tu d’çî.

Ço çîya heta êvarê rojekê kewkek û rojekê heke kêrwîşkek êkê çinne dê evro dê sibehî dê duspa rojekê roj bo rojê durtirkê çî roj bo rojê dûrtirê çî rojekê çî d’bêrê xwe d’detê pezekê kûvî dît. Nêrîyek dît nêrîyekê gelekê kal yê tiveka xwe danîte ber ew nêrî yêd bîte sofî rihêd wî eşkalê wî sofîyeke pîremêr e. Yê tiveka xwe j’ber radket yêd bîte nêrîyekê kuvî, nêrîyekê şeş heft salî şaxêd wî hindî mengena ne kevlê wî gelekê taze ye. Du sê ca hizrêd xwe kirin go ez dê berdemê hema çî j’Xudê çî j’benîya. Tivekek lêda nêrîyê xwe kuşt d’çite ser kelexê wî nêrî ye. Nêrîyê xwe wergêra serjêkir û kevilkir û kevlê wî can çêkir û goştê wî hindî şîyay kevlê wî hilgirt înad û hate mal. Da wî got: “Eve çîye kurê min? Eve te j’kîve îna filan bêhvan?” Go: “Willahî hal û qese eve ne.” Go: “Willahî ev kevlê gelek yê taze ye ev kevlê gelekê cane ez dê vî kevlî bi xwe çêkem bem firoşim.” Dayka wî gotê: “Ne kurê min ne firoşe vî kevlî evî dirustke sibehî bibe b’dane d’koçka paşay da paşa dê heta qîyametê têra min û te malî dete me. Eve hejî koçka paşa ye.” Go: “Da paşa dê tîtalekî l’min hilêxît ez neşême paşay belkî para ne dete min. Dê bem wekêdî bo xwe firoşim.” Go: “Ne wila dê bey deye paşay.” Dê go: “Bila.”

Ewî kevilê xwe pêça da ber milê xwe çî derê koçka paşay. Silavkir silav jê wergirt kevilê xwe vekire nava koçkê. “Kuro eve çîye eve te j’kîve îmandîyê eve çî tişte hinde yê taze.” Go: “Wila eve ev e. Eve xelatî koçka te ye. Min ê bo te înay.” Go: “Ka ribkeka garisî bidene vî feqîrî bila bi xwe bibet.” Ribkeka garisî dayê û bo xwe înan du hate mal. Gotê: “Da eve te ku l’min kir, benê ev kevlê min firoşim dê

gele parey girît. Eve bo çî ev kevile hosankî bêqîmet j'min wergirt. Eve binasên te bûn. Go: “Kurê min çî nîne dê hema bila ew bo wî bît.”

Paşa rabû caba aqîldarêd xwe gazîkirin û wezîrêd xwe gazîkirin û îlerîgelanêd xwe gazîkirin û go werin berê xwe b'dene vî kevilê vî heywanî ka eve çandî cane ka eve j'kîve îna ye eve çîye? Kî însanê d'ço pêş û berê xwe d'dayêw têt fikirî . Go meznahî bo wî Xudaye yê sentenet êxistîyed kevlê vî da yê ev reng û reşe kirîned nav kevlê wî. Ê em vî ku lêbikeyn ku çêkeyn? Mixtarî gotê: “Paşayê xweşbît, paşayê xweşbît go b'Xwidê ez d'zanim eve bo çî yê baş bû belê go ya j'qesta ye. Ez bêjim û nebêjim ya j'qesta ye.” Go: “Ka dê bêje bo çî ya başe?” Got: “Heke bo te qesrek hatiba çêkirinê b'saxêd fil û keredana b'hestîyêd fil û kergedana qesrek çêkiriba û ev kevla avêtiba ser serê qesrê go da sofiw sofiyetiya xwe û melaw melatiya xwe herkeskî b'ewa xwe ve da'ber ve rabîta û j'nuka dê navê te l'dinyayê gerhîta ku tu paşayekî.” Gotê: “Mixtar heyyy! hestîyêd şax û pîlêd kergedana dê j'kirê înim û qesrê jê çêkem mala te xirabo! Eve çî sihbete tu d'key?” Go: “Ez benî ewê ew kevlê înayn go hestîyêd fil û kergedana jî l'nik wî sanahî ne ew dê bînît.” “Haynene!” Gotê: “Belê.” Go: “Bîne zorlemîske heke neçît bêjê dê serê te birim dê çîtin.” “Herêw herê!”

Caba kurkî virêkir go: “Dê were Ehmed Çelebî min qesrek ji te d'vêtin j'hestîyêd fil û kergedana. Tu bo min çêkey û diruskey û vî kevlî bavêjîye ser. Tu we lê d'key dê te xelat kem tu we lê nekey dê te celat kem.” Hindî got: “Hakimê xweşbît padşahê xweşbît ma ez dê hestîyêd fil û kergedana j'kîve înim ez dê ku keme qesir.” Gotê: “Dirêj neke here bo te çend rojêd dî muhlet min ev tişte j'te d'vêt divêt tu çêkey.”

Rabû çî mala xwe hindekêd xweş dayka xwe dadan. Go: “Eve hemî binasêd te bûn te înade serê min. Dê vêca ez dê hestîyêd fil û kergedana j'îve înim, û ez dê qesrê kusa çêkem, ez dê kusa kevlî avêjime ser. Gotê: “Dayê em dê rabîn razîn bêhnekê heta xelk hemî d'nivîtin em dê rabîn lihêvk û doşekêd xwe avêyne ser piştî giyanê hespê xwe û hindî navê vî mamleketî, vî paşayî, vî cihî me gulêbît em dê bo xwe teqîn û çîn.” Go: “Bila kurê min.” Rabû serê xwe dana qederkêkê nivistin hespî serê xwe l'binê pîya da. Go: “Ehmed Çelebî, Ehmed Çelebî.” Gotê: “Belê heywanê Xwidê te xêre tu yê têhnî tu yê bîrsî yî te kuwe.” Go: “Rabe ney têhnî im neyê bîrsî.”

Go: “Rabe da b’çîne hestîyêd fil û kergedana.” Go: “Ma dê ku çîne?” Gotê: “Rabe sibehî spêdê here dev hakimî mala xwe barneke. Bêje hakimî tu dê bo min ehd dey çî tiştê e j’te d’xwazim tu dê deye min. Wî şiklî ez dê çime bo te çime hestîyêd fil û kergedana. Tu ehd nekey û ser ehdê jî şahid û tesbît û mohr û seneda çênekey b’Xwidê ez bo te naçimê tu kutkey jî bo xwe we b’ke. Hezke serê min bibire hezke ku b’ke. God wextê te wegote dê bo wî bîte mereq ew dê ehd det. Tu bêjê bes hemî jî hindî tiştê e j’te d’xwazim dê j’kîse mixtarî bin û mihrovên mixtarî. Tu dê ho bêjîyê. Gotê: “Dê bila heywanê Xwidê.”

Spêdê rabû gote dayka xwe: “Em naçîn ez dê rabim çime dev paşay.” Ço dev paşay silam kirê. Go: “Tu hatî Ehmed Çelebî?” Gotê: “Belê.” Go: “Dê çîye hestîyêd fil û kergedana?” Gotê: “Belê. Şertekî dê çim.” Go: “Keremke şertê xwe bêje. Çi daxwaza tu bikey dê bo te b’cih ‘inim.” Go: “Tu dê bo min ehd key tu dê daxwazêd min b’cih îni û tu dê bo min ehd key jî çî tiştê e j’te d’xwazim dê j’kîse mixtarî bît û mirovêd wî. E dê bo te çimê tu we nekey herkesek j’me l’mala xwe bila go bêjê mixtar bo te b’çîtê.” Ehmed Çelebî ço koçka siltanî, paşayî silavkir. Go: “Tu hatî?” Go: “Belê.” Go: “Dê çîye şax û hestîyêd fil û kergedana?” Go: “Belê.” Go: “Be b’qewlekî dê çimê dê bo min ehd key çî tiştê e j’te d’xwazim j’kîse mixtarî. Tu dê ehda min qebûl key mohr û seneda l’ser çêkey, îmza key tu jî e jî ku tu b’deye min e dê bote çimê tu nedye min bila mixtar bo te b’çîtê.”

Ehe go b’Xwidê raste benê eve mixtarî ya b’serê min înay. Çon dest avêdê mohr û senede înanî û mixtar înad heyheta xwe înad, cemakir. Senedêd xwe çêkirin çî tiştê Ehmed Çelebî j’paşay bixwazît paşa dê detê. Çi daxwaza paşa jî j’Ehmed Çelebî biket Ehmed Çelebî dê bo ket. Dê rabû hate mala xwe spêdê hespî serê xwe l’binê pîya da. Go: “Dê vêca rabe Ehmed Çelebî. Rabe here çil dewara b’barê ereq û meyîyê ve bîne hemî j’kîse mixtarî mirovêd mixtarî. Were dê pêkve çîne e dê cihekî nîşa te dem dê çîne hestîyêd fil û kergedana.” Ew jî rabû ço gote paşay; go: “Min çil xulam d’vên b’çil dewara ve b’çil barêd meyîyêw ereqê ve. Û j’kîse mixtarî. Tu d’îni dê bo te hestîyêd fil û kergedana înim têra qesrekê tu neînî e jî naçim bila mixtar biçît.” Mixtar gazîkir hindî got filan bêhvan go: “Qewlê te sê rojîn sê rojada divê tu van tiştan dirust key.” Sê roja dirust kirin tiştêd wîw û barxana xwe barkir go: “Dê kî ve çîn ya heywanê Xwidê?” Go: “Erdê te nêrî lê kuştî em dê

çîne wî çîyayî.” Erdê nêrî lê kuştî çone wî çîyayî go: “Em dê j’vêrê wê ve kîve çin?” Go: “Em dê l’vê santê çîn ser vî girî kevîn ez dê cihekî nîşa te dem.”

Çon b’ser milekê ketin duzlixek dît, deştek dît cihekê wesa dît şitî kevne hafîrêd pezî yêd ku av tê de nemayî pişte rojekê tişteke wesankî l’cihekê kî da dît. Çon barxanêd xwe danane wêrê got barêd xwe danine wêrê. Eva berava hema temîzken. Ew berav hemî temîz kirin û paqij kirin ew meşkêd ereqê û doşavê kirne navêk –meyî- kirne wan berava. Go: “Dê vêca herin xwe veşêrin dewara biben berzeken l’vara û hun jî xwe veşêrin. Zêlam bila bihêne miqabilî vêrê cihêd xwe çêken heta spêdê tavid det tav şîrîn d’bît fil û kergedan dêhênê. J’mêrje ava vêrê nevexwarîye ev dera hişk bûy. Û cihê wan yê kevne ew dê hêne vê ereqêw doşavê meyîyê vexwen û dê xwe dene pişte rojê û dê gerim lê det hemî dê peqîn, goştê wan dê serkevilî ser hestîya da çît. Vêca tu b’her çil mirovêd xwe ve bibeze nav da bo xwe lêkden û belê lêkden. Heta tu çil bara bo xwe dirustid key û barke da biçîn.”

Ew jî çon éynen ew tedarik bo xwe dirustkir û ew berav paqij kirin û ew ereq û doşav û mey kirêw û xwe lêgirt heta tavê day bûye têştegeh fil kergedan hatine ser vexwar û xwe da wê ber tavê qederekê man û werimtin peqîn ew jî bezîne ser kelexêd wa hestîyêd wa. Hetta ku êvarê heta çî wextê heyî her ekî barekê hestîya dirustkir û l’dewarêd xwe kirin êvarê mexreb bir danane derê qesra paşay. Go: “Dê vêca bo xwe bike qesir.” Paşay caba mixtarî virêkir. Gotê: “Mixtar?” Gotê: “Belê” Got: “Hatin hestîyêd fil û kergedana. Vêca were ka dê ku keye qesir.” Go: “Ez benî ewê ew înay ew dê qesrê çêket ma ez dê çêkem bes ew dê çêket.” Go: “Qesrê jî ew dê çêket ma ez dê çêkem. Caba Ehmed Çelebî virêke dê bo te qesrê çêket çeneket serê wî bibire.”

Caba Ehmed Çelebî virêkir. Gotê: “Dê were te hestîyêd fil û kergedana yêd înay. Min j’te d’vêt qesrê jî bo min çêkey dirustkey kevlî bavêye ser.” Hindî got: “Bextê te da eman û zeman ez dê ku hestîya keme qesir filan û bêhvan.” Go: “Çênabî an dê çêkey an dê serê te birim.”

Rabû çu mal hindekêd dî l’dayka xwe dadan bêhnekê bo xwe kirne girî go dê spêdê lihêf û doşekêd xwe avêyne ser pišta gîyanê hespê xwe hindî me navê axa vî mamleketî, vî hakimî, vî mixtarî gulêbû em dê bo xwe çîn hêj nebûye roj. Berê spêdê

hespê wî rabû serê xwe l'binê pêd wî da. Go: "Rabe Ehmed Çelebî." Go: "Te xêre heywanê Xwidê tu yê têhnî yê bîrsî yî te kuwe?" Go: "E ney têhn im ney yê bîrsî me." Gotê: "Rabe here nik hakimî bêjê hakimê xweşbîtin!" Gotê: "Rabe min derbêxe û em dê b'rîyekê çîn go e dê bote hostayekî bînim."

Rabû l'hespê xwe sîyarbû qederekê b'rîyekê çon çon çon çon gelek mixdarê çon. Çone ser kevne mixberekê berê xwe d'denê kevne mixber e, bêserûber e ya d'tarîxê da ye. Go: "Silavke ser b'qewweta Xwidê navê filan mirovî bîne bêje rabe min xilmet ya b'te hey. Ew jî d'çît silav d'kete ser dia j'Xwidê d'xwazît b'qewweta Xwidê d'kete gazî d'bêjîtê ya hosta rabe me xizmet a b'te hey. Ezê ketîme têngaîyeka mezin da min hewara xwe ya înaye nik Xwidêw û te." Wextê ku wekirî ewî jî caba wî veda. Go: "Te xêre te ez rihetsiz kirim, te ku bû?" Go: "Willahî min avahîyek yê hey tu dê bo min çêkey j'hestîyêd fil û kergedana. Hosta b'dest me nakevin min ê qesta Xwidêw te kirî." Go: "Dê herê herê!" Gotê: "Xwidê mala pîrê xirabketin!" Gotê: "Pîr eve heft sale berî nihe go b'min ve bû ez bo xanyekî bo çêkem go ez neçome tana xanyê wê go ya hatî halatêd min hemî yêd birîn agê heftê behra ber wêve yad nîveka behrê da halatê min dezgahê min yê birîne wêrê. Bêy halat û bêy dezgah ez neşemê çi qesra çêkem. Heke ew hatibana wila e da bo te çêkema heke ew nehatin ma e dê kusa çêkem." Go: "Be ew l'kîrê ne." Go: "Wila hal û qesêd pîrê eve ne. Yêd birîn pişt heft behra êxistîn dezgehêd min yêd birîn. E jîk yê mirîm, min emrê Xwidê kir."

Zivirî dev hespê xwe. Go: "Ew ku d'bêjît?" Go: "Ho." Go: "Were sîyar be em dê çîn." Yanî hespê wî yê behrê bû. L'hespê xwe sîyarbû yella tîrek çow ço agê heftê behra d'çîte nik mala pîrê. Hespî gotê: "Berê xwe b'dê ew torbekê he yê b'ser derê wî xanîkê henê ve ew dezgehên wî ne. Here şîrê xwe bavêjê benkê wê bibire bîne were sîwarbe hêj pîr b'me nehessay. Heke pîra sehrewan meb b'hesît go tê willahî ew dê me hêrîted navekê."

Ew jî ço wesankî şîrek avêtê benkê wan halata birîw l'hespê xwe sîyarbû tîra xwe hate ve def mirî. Go: "Te înan?" Gotê: "Belê." Go: "Ka hema dane wêrêw û here. Here heta şevkadîtîrê roje dinya bûye roj em nagehîn çêkeyn heta şevkadîtîrê." Tiştêd wî danane wêrêw zivirî hate mala xwe tena runişte xarê. Şeva paştîrê careka dî ço wêrê. Go: "Here binve."

Heta spêdê rabû d'berexweddetê qesreka j'hestiyêd fil û kergedana l'karişî qesra paşay çêkirî mirov dilnadet berêxwebdetê sentenetê teşkîlata danay tê da. Kurik jî rabû çu kevil avête ser serê qesrê. Gote paşay jî: "Aha eve bo qesr û eve bo te..." Gotê: "Ka ribkeka dî ya garisî b'dene feqîrî b'dene Ehmed Çelebî bila bo xwe b'betin." Her neqlekê ribkeka garisî yê d'detê. Wila eqîldarêd xwe cemakirin paşay dest avêtê go: "Werin ka ev qesre ku çêbû, eve kusaye, çu kêmasî lê heye, çu tiştî bo diruskeyn û?"

Hemî cemabûn her êkî tişteke got. Mixtarî gotê: "Paşayê xweşbît! Paşayê xweşbît!" Go: "Qesra te hindî tu bêjî ya law e hindî tu bêjî ya can e û kevlê wê hindî bêjî yê taze ye bes tişteke j'te kême bo vê qesrê." Go: "Çu ye?" Go: "Kîça papa yê freng ya l'pişt adê heftê behra." Gotê: "Heke ew bo te înaba l'te mehr kiriba tu runiştibaye xwarê d'wê qesrê da şinuka tu da hakimîya xwe bînî ka da ku bît?" "Kuro go ew çu sihbete tu d'key? Ma kî dê wê înit, ma ew l'kîrê ye? Ma kî d'zanîtin?" Go: "Tu Ehmed Çelebî gazîke heke ne çoyê serê wî bibire. Bêjê dê serê te birim. ew dê çit bo te înitin. Ewê kevil înay û ev hestîye înay û ev qesre çêkirî go ew nik kolayî ye." Go: "Tu here mal." Mixtar çu mal caba Ehmed Çelebî virêkir. "Ehmed Çelebî" Gotê: "Belê." Gotê: "Dê were mi j'te d'vêt tu kîça papayê freng pişt adê heftê behra bo paşay bînî." Hindî go: "Eman deman bextête da ez ku çimê? Dê ku zanim filan bêhvan bela xwe j'min veke." Got: "Vêt herê te d'vêt jî dê spêdê serê te birim."

Çu mal hindekêd dî jî b'dayka xwe dadan. Gotê: "Hemî binasêd te bûn. Eve hemî kevilî înane serê min. Te nehêla ez bo xwe b'firoşim. Ez dê ku kem dê kusa çime kîça papayê freng adê heftê behra. Herê herê! Go em dê spêdê berê spêdê rabîn tiştêd xwe avêyne ser piştî giyanê hespê xwe hindî ku me navê vî mamleketî gulêbibît em dê bo xwe çin."

Serê spêdê hespê serê xwe l'binê pîya da. Go: "Ehmed Çelebî" Gotê: "Belê." Go: "Te kuwe heywanê Xwidê tu yê têhnî yê bîrsî yî te xêre." Go: "Rabe ney têhnim ney bîrsî me û neyê çime rabe here def paşay silavkê û bêje paşayê xweşbît ezê hatîm dê bo te çime kîça papayê freng. Tu dê şertêd min b'cih îni e dê çime bo te kîça papayê dê bo te înim. Dê bêt şertêd te çine. Tu dê bêjîyê min çil zelam d'vên hemî l'tîpekî l'hînekî, l'rengekî. Min çil jinik me d'vên hemî b'tidareka êk bin hiştî êk bin.

Çil kur me d'vên hemî hiştî êk bin, çil kiç d'vên hemî hiştî êk bin, çil biçûk d'vên hemî şitî êk bin.” Gotê: “Hemîçka çil çile jê bixwaze û gemîyek jî min d'vêtin cihê va însana hemîçka tê de hebîtin. Hemî j'kîs û malê mixtarî û mirovêd mixtarî bîtin. Hun bo min dirustken dê çimê bo te tu dirustnekey şertê min eve ye e naçimê.” Go: “Tu here mala xwe.”

Ew ço mala xwew caba mixtarî virêkir. Go: “Mixtar aha aha eve lîste.” Hindî xwe hilavêt hêreve wêve go ew tişt hemî nîne. Dê an tu jî dê îni an jî dê serê te birim. Eve qirare nav beyna mew wî. Mixtar jî rabû heyamekî pêra ço ew eskerat hemî bo lêk da. Çi b'kirîn û çi j'kîse çi filan û çi bêhvan kêşane ser lêva behrê gemî bo diruskir û mesrefeka qewî bo kired gemîyê da. Hespê xwe kired gemîyê da yalla. Berda ser behrê da here ku tu d'çî. Çon û çon û çon hindî ku çoyne rexê behra adê heftê derket. Berexweddenê bajêrek dît. Rengê bajêrî, erdê bajêrî, tiştê bajêrî ne hiştî rengê erdêd dîtirê yêd ku dinyayê ne. Gotê: “Eve adê heftê behra ne cihê papayê freng e.”

Lêva behrê dana hespî gotê: “Hun l'vêrê danin. B'ordî herin. Kes b'çi erda ve neçin. Ew dê nîke me bînin heta bêhneka dî heta êvarê heta çi wextê heyî dê me bînin. Ew dê hên qesta me ken. Wextê hatin qesta me kirin Ehmed Çelebî tu bêjê em qewmîyateka geleka boş in b'rêketîn. Me b'hizaran însana yê j'êk û du kuştî û em ev çanda yê d'ketîne vê gemîyê xilasbuyn û me yê qesta te kirî. Me mihavzeke. Wextê te wegote dê keyfa wî jî hêt. Ew jî dêbêrê hun b'xêr hatin û ser çava hatin û dê teklifa he we ket dêbêjîr da b'çîne nav şehîrî. Hun bêjinê ne b'Xwidê em nahêyne nav şehîrî. Em dê hema l'vêrê lêva behrê bîn. Heta hun bo me cihekî xalî d'ken, mihelekê xalî d'ken cihekî bajêrî, filanekî d'bînin. Ê hema em binecih bihêyn b'runînexarê tê da. Em dê hema l'vêrê bîn vêgavê.

Eynen wesankî çone wêrê. Papayê freng jî spêdê berê xwe dayê ew eskerat ê l'wêrê. Go: “Eve kîye pay teyrîna xwe ser van behra ve neşet bihêt em çengêd wan d'birîn. Ho bê minetî hatî danaye vêrê da. Eve çi însane berê xwe b'denê.” Wila hinde qasid virêkirned navda. Ewa jî hemî yêd keyfê hebûn. Yêd dawetê hebûn. Yêd filana hebûn. Hema gel j'xewê rabûn dest avête dawetê, keyfê.... çi yê d'ço nav wa da jî d'ma b'wî sine'tî ve jibîr d'kir paşa yê d'virêkirîne ewê dî yêd virêkirîne wêrê

qiralî filan. Dêy dê dêy dê du sê qasidek virêkirin qet nezivirîn. Ew b'xwe rabû d'çît berêxweddenê ku b'wî halî. Go: "Eve çiyê çî nîne?"

Go: "Ez benî ya paşayê xweşbîtin! Em ê d'vêkktîn me gelek ne'zayî yêd dîtîn. Me gele kuştina dîtî. Em ev çande yêd xilas bûyn. Em jîk êd xemêd xwe vedrevînîn û meraqêd xwe derbazid keyn û me yê qesta te kirî." Gotê: "Hun b'xêr hatin. Dê rabîn da b'çîne nav şehri cihekî runine xarê." Go: "Bizore me cihe xwe yê girtî em dê l'vêrê runîne xarê heta deh roj dî heta heyveka dî da tu bo me cihekî me'lum cihekî bibînî paşê em dê j'vêrê rabîn." Go: "Dê ew jî baş e." Go: "Belê wila em d'bê sebrîn em d'xerîbîn kuştî filan bêhvan me gelekêd dayn em d'xemgîrîn. Em hezdkeyn hero destekê gencê tolaza bihêne vêrê bo me keyfekê biken heta êvarê êvarê b'çineve." Gotê: "Ew jî baş e." Dest avêtê hero destekê tolaz û genca d'çone wêrê bixwe keyf fikir, sihet d'kir, dawet d'kirin heta êvarê dest bo destî dest bo destî rojekêw duya sêyaw çara. Kiça papayê firang jî zanî. Go: "Eve çiyê, çî nîne?" Gotê: "Babo hal û qesêd qewmîyatekê eve ne. Yêd mihacir bûyn hatîn l'rexê me derketîn yê qesta me kirî. Em jî dê bo nêrîne cihekî hêdî hêdî da j'wêrê bînîn. Û hero jî millet d'çîte wêrê bo keyfêd ket da dilê wa xweş bibît." Gotê: "Babo be ez jî dê çim sibehî go ez jî dê çim." Go: "Tu jî here."

Kiça papayê fireng rabû çend hevaley dane l'gel xwe û ew jî kete l'gel hevalêd xwe ço qesta wan. Gotê kiça papayê freng ço wêrê. Ewa zanî hespî gotê: "Eve hat." Gotê: "Nehêlin b'rûnîte xarê. Destekê belbuka kiçka filana bila b'çîte ber sîngê wê dawetê b'ket heta adiz d'bin. Ew bila bihên destekê dî, ew bila bihên destekê dî nehêlin b'sekinît heta êvarê heta mexrep em teybîrekê lêbikeyn." Ew jî çone wêrê dest avête dawetê filanê heta hindêk zivirîn cab da papay go: "Em hesdkeyn heta sibehî bo me keyfê biket." Go: "Bila heta sibehî l'gel hevalêd xwe bît l'wêrê."

Mane l'wêrê dest avêtê heta bûye direngîve kiçik welê hat ket û hêdî hay j'xwe nebû. Piçe dermanê nehişyarîyê da ber difnê û avêted tabûtekê da û avêted barxanê da gote eskeratî b'rêkevin da b'zivirîne ser behrê. Be şevib ser da hat. Ketine gemîya xwew û zivirîn xeta xwew yelah ku tu d'çî. Hatîn ka çî qeder behrê da hatîn rojekê du roja jinik hişyarbû. Xwe vedhejînît berexweddetê ya asê ye. Got: "Eve çiyê ez dê vê gemîyê xerq kem eve çî ye hewe kirî?" Gotê: "Bextê tew Xwidê da mi l'gel

te kir tu l'gel min neke. Mesleka geleka geleka mezin a hey. Ev mesele dê b'te hel bîtin. Em ê d'hatîne te dê tu deyn nekey heta em d'zivirîne ve." Gotê: "Dê here."

Welhasil heta hatin careka dî j'behrê derketîn. Rexê behrê derketin. Go: "Dê vêca were ka eve çiyê?" Kurkî go: "Hal û qesêd min û paşay û mixtarî eve ne." Go: "Haynene" Gotê: "Belê." Go: "Vêca dora min û te ye jinkê gotê." Gotê: "Ke j'me naçîte nav şehri naçîne nav mala. Dê l'rexê behrê bîn. Cabê b'dene paşay bêjinê min kiça papayê freng bo te îna û dahol û zirna bila bihêne vêrê dawetê biken û kar û kuyê me biken ew jî bila l'wêrê karekê law ê dawetê biken. B'dawet ve em ê j'vêrê wê çîn." Go: "Willahî xweş şol e." Wila cab da paşay. Go: "Paşayê xweşbît! Dê vêca were me bo te kiça papayê freng îna." Gotê: "Dê hema werin." Gotê: "Em nahêyn." Gotê: "Em dê hîngê hêyn ku tu karê dawetê bikey, malê duristkey, b'xemilînî, siyaretê wî i'lan key. Her du bihêne vêre şevêkê bibine mêhvanêd min. Ê Spêdê şinuka em dê dawetê keyn." Ê gotê: "Ew tişteke law e." Ewa jî dest avêtê aynen wesankî karê xwe kir û paşaw mixtar jî rabûn wê şevê çone wêrê heta êvarê millet l'wêrê dawet kir her êk d'hête ve mal. Ewê d'wê gemîyê da wî erdî ew hemî d'mînined cih da.

Gote hakimî û mixtarî: "Ivşeve mêhvanêd me ne hun jî naçin." Jinkê gotê: "Ka here bo min du şivkêd hinarê bînin gote Ehmed Çelebî." Çon du şivik înan danane dev tenişta xwe cihê xwe çêkir. Hatin danade dev teniştasihbetêd xwe kirin heta bûye roja paştir spêdê. Dest avêtê şivkek hilgirt nav guhêd hakimî da. Go: "Bibe xezaleka mê." Ê êk l'nav guhêd mixtarî da. Go: "Tu jî bibe xezaleka nêr???" Ê her du b'duvekê ketin yella here ku tu d'çî. Gote Ehmed Çelebî: "Eve çon dora min û te ye." Ehmed Çelebî jî hate ser qesra hakimî dest avêtê ew qewmîyeta dî jî benê hemî bû piştta wan û dest avêtê daweta xwe kir. Kiça papayê firengî l'xwe mehr kir. Ço runişte xarêd wan qesr û qusurê da. Min jî qesek hêla rihme l'dey û babêd te."

Vebêjer: Sıddık Duran

2. SERÛRK

Go zelamekî sê kur hebûn. Go wesîyetêd xwe û şîretêd xwe l'kurêd xwe d'kirin. Go: "Babê xulam go çi cara neçine aşêd xirab. Emanetê min l'hewe bît û çi cara jî neçine çiyayê spî û çi cara jî şevê nemînine lê heke bila hûn biçinê belê b!şevê nemîninê. Çi cara jî neçine derê şîv û nihala jî. Ne danine d'nava nihala ku b'şev ve we bît hûn nava nihala bin, derê şîvka bin." Go: "Dê baş e." Babê wî jî emrê Xwedê kir. Go birayê mezin go: "Em dê rabîn çîne seyrane filane bêhvanê." Her dukêd dî jî birn û ço. Go wê şevê ço go: "Wilahî em dê cihêd xwe l'vêrê çêkeyn derê şîvê." Go d'çin nêrinê karwanekê hatiye danaye derê şîvkekê. Gotê: "Em jî dê l'vêrê bîn." God birayê biçûk gotê: "Ne b'Xwidê em l'vêrê nabîn." Go: "bo çi em l'vêrê nabîn?" Go: "Ev riyekê zû da babê min ev wesiyeta ya kirî, ev şîret al me kirî. Benê her tiştêka j'bo hey lewa." Go: "Eh camê ca hema tu jî gotinêd miriya jî bo xwe d'keye aqil, ca her kesek dê bo xwe axivîtin." Go: "Ne em l'vêrê nabîn." Çi halê heyî û neyî wê şevê xwe da serê girkî ve. Hindî gote wê alemê jî j'wê nihalê derkevin, werin ew nehatin. Man şev kevin bû wextekê şevê go qirên kete ewra lehyek hat ser wê însanî da hemî birin j'wa her sê ka pêve xwe da ye serê girkî. Go çone mal go: "Aha wila eve dirust e."

Go neqleka dî çêbû go çoneve çiyay. Go çone go: "Wila hema em dê çîne çiya spî ka eve ev gotinêd rastin an ne." Çone çiyayê spî go hindî gotê: "Dabiçîn j'vî çiyayî wesiyeta babê me ye yê gotî nemîne l'wî çiyayî." Go: "Ne wila em dê l'vêrê bîn." Go ew rabû go vêca ew kurik li'wêrê ma hişyar heta ku ew lehî b'ser wêrê da çoy. Go tîla xwe birî xwê kirê heta nenivist. Ew jî çon bo çiyayê spî, hindî gotê: "Em dê iv şeve l'vêrê bîn" kurkî go: "Em l'vêrê nabîn." Go radbîtin ew nivistin. Nivist birakêd wî, ew ma hişyar. Tilya xwe ya dî jî birî hinde xwê kirê heta spêdê nenivist. Go berê xwe d'detinê sê siwarên j'wê ve t'hên hespê wan ê spî ye, cilêd wa spî ne, hemî taqîma wan a spî ye. Go hatin da hêna j'talbey wan go ewî da ber ewêdiya kuştin, ewî her sê kuştin. Ço cilêd wa j'ber kir û sîlehêd wan û tiştêd wan û hespêd wan vêca nîza ka êk bû an sê bûn. Rabûn veşartin û spêdê rabûn go: "Dê ku l'me hat. Tu yêd bêjî bila em l'vêrê nabayna ehh! Mala te yo tu bo xwe d'keye, qesêd babê bo xwe d'keye aqil." Go rabûn hat. Go: "Dê bîra hewe înim."

Caraka dî we çêbû çone aşêd xirab. Aşêd xirab bûne mêhvan. Go: “Wila hema ev aşed xweşin û em dê l’vêrê bîn” û hindî go: “Da biçîn ewîdî ya babê me wesîyeta babê me ye babê me ye gotî nemînine l’aşêd xirab.” Go: “Nexê manê em mayne l’çiyayê spî çî l’me nehat em dê l’vêrê bîn.” Go: “Dê baş e.” Go mane l’wêrê wê şevê tilya xwe ya sêyê jî birî û tilya xwe xwê kirê û heta spêdê da xewa wî nehêt kurkê biçûk, birayê biçûk. Go nabeynekê berê xwe d’detê dêwekê j’wê ve têt dêwêd berê yad guhrîşî yê l’ser pişta hespekî , dareka d’destî da her çeçekê dara wî gurzeka ewîdîyeka agirî ya pê ve û yêd hêt. Go wila wî jî durve qewlê gotinê tifek avêtinê agirê wî temirî. Agirê wî temirand û ew jî kuşt û hespê wî jî hilgirt û guhêd wî jî birîn yêd wan jî ewêl çiyayê spî guhêd wa jî kirne d’berîka xwe da, yêd dî jî kirne d’berîka xwe da. Spêdê rabûn go: “Dê xwelî b’serê te were aqlê te jî bo xwe j’dinyayê girtî. Ma ku l’me hat?” Go: “Çi l’te nat ku l’te hat.” Qewlê gotinê go hespêd xwe birin kirned axurê kê ve erdekî ve her çar, yê wî jî û guhêd wa jî yêd berîka wî da guhêd her sê çareka. Ka du ne kuştî sê ne çar in çend in.

Go radbîtin, go ewîdîyek l’bajêrî çêbû go hinde cara kiça padîşahê wî bajêrî dît eskerek yêd hêtin, sûwarek. Hespê wî yê spî ye, cilêd wî spî ne, kullî tiştêd wî spî ne. Yêd hêtin yêd gerhîtin. Go kiça paşay zanî. Go careka dî da çîtina keteved wê axûrêve, wê ewêdiya dewarave. Êrkek şîştîbû ew êrik dana ser serê xwe. Vêca niza ka berî hîngê gote birayêd xwe an ne. Go çoned deşteke da, go tîremarek dît. Vêca ez d’bêm hesp nîşa da bû. Çinku go her sê sîyarbûn û çoned deşteke da go marek dît. Go birayê wî rahêlayê, wî rahêlayê, wî rahêlayê go wan gotê: “Tu jêvebe.” Go ew tîremar erd kun bû hema çu d’erdî da. Go: “Werin vêrê bikulin.” Go çu ewder kulo, go bû şkevt bû mexare. Go: “Dê werin werîsî b’kene min, min b’kene d’vêrê da.” Go ew kur jî çu d’wêrê da ew birayê biçûk. Çu d’wêrê da go radbîtin berê xwe d’detê pîrhevîyeka l’wêrê. Go hêdîka go pîrhevî kuşt. Go ka b’çî qeder ma heta pîrhevî kuştî. Pîr hevî kuşt go her sê kiçik serêxistine serî. Sê kiç hebûn. Kiçikêd wê serêxistin û zêr û zînet û tiştê wê serêxistin û go gote kurkî min jî b’serbêxe. Bira jî b’serêxistin, çu her êkî kiçkek dayê êk jî bo xwe hilgirt.

Axirkî go çu xwe l’dewarê sîwarkir û gotê çu her neqlekê ewêdîyek d’hat ser wî bajêrî da ku d’bêjinê ceblek ewêdîyeka insanî d’hate ser da bo şerî. Çod hema taze kufrû kûna wa d’îna radhêlayê hemî d’çon. Go careka dî da heta hespê xwe keta

d'govê ve neqla paştirê go yê sor bir, neqla paştirê êkê reş bir. Go kiçkê jî ya d'bînîtin û yê d'çite d'wêrê û d'kete d'wêrê ve û têtin serûrkê xwe ûrkê pezî b'serê xwe d'dadetin û têtin nav xelkê d'gerhîtin.

Go paşay gote milletî: “Werin hûn hemî cemabibin ka kiça min sêva xwe l'kêş hewe d'detin dê demê kiça xwe demê.” Go serûrkî jî b'ûrkê xwe ve ço wêrê nav wa hema go be kiçkê yê dîtî berî hîngê ka çî zelum e. Ew jî sêva xwe, xwe l'sîngê kurkî d'det. Heylêl wî go nexê avête min û birayêd wî hema go avête min û neavêtiye te, milletî careka dî avêt. Axirkî sê cara kiçkê sêv avêtê. Avêt xwe l'sîngê wî da. Go babo eve eve. Go ewî jî hema destê xwe l'ûrkê xwe da avête wêra henê. Go bila yê we bîtin. Dayê. Go da wê kire girîw, xwîşka kire girîw, b'serê xwe îna go wey gotê hewe xwîşka me da serûrkî. Ew jî ço mala xwew ûrkê xwe avêt û pal û koçê xwe kir û l'dewara xwe sîyarbû eynî d'dewsa xwe da ço. Go ewan go wila em dê rabîn çîn nêrinê ka hişkû ew çî d'ket. D'çin nêrinê 'egîdek e zelamek e mirov dîlnadet berê xwe b'detê. Vêca şinû keyfa dey babêd wê hat û xwîşkêd wê hema. Mî jî qesek hêla rehme l'deybabêd guhdara.

Vebêjer: Rukiye Duran

3. TEYMEMILDAR

Hebû hebû ke j'Xwidê mestir nebû. Go zemanekî babê kurkekî mirîbû. urik bû êtîm. Kurik bû êtîm, kurik êtîm û sêwî herduk bû. Kurik jî j'bê fehmî rabû b'dinyayê ket b'erda ket bê xudan bû vêca êtîm jî gelek bê dewletin. Çi kes hindî êtîma yê bê dewlet nîne. Go ew jî rabû dinyayê ket çi erdê çoyê tiqek l'wê he da, şeqek l'wêhe da, pêhnek l'wêhe da tepanêd kir axirkî çi hal neddane eyalêd xelkê û xwe û eyalêd xelkê. Go camêrek rabû j'mala xwe ço rex mixberekê go hema her nalaneka têt, her qêrîneka têt, her ewêdîyeka têt go hema her l'wê ewêdîyê ço ço ço ço ser mezarekî go silavkire mezarî. Silavkire mezarî go Rabbê alemê we hezkir însanek j'mezarî rabû, go j'mezarî rabû go: "Da bo te bêjim ya evdê Xwidê! Xwidê tu yê înaye vêrê da bo te bêjim. Min kurek yê hey eve niza çend sale ezê emrê Xwidê kirîm ev kure çi xweşiyê nadete ez ehlê cennetê me ev kure nahêlît ez xweşiya bibem. Îlla min d'dete tezîbê ka vêca xwezî ji xêra xwidê ra te emelek l'vî kurî kiriba, te şîretek lê kiriba te kirba ehlê xêr û xêrata, te kirba ehlê xwandinê fisebîlîllah d'rîya Xwidê da ew kurik bila bo te bîtin." Go: "Ca ya însanê Xwidê ma ez dê ku bêjimê ez biçime kîrê lê bigerhim dê ku naysim?" Go: "Hema here nav biçûka l'filan cihî, filan gundî, filan şehîrî, filan erdî here nîşada. Gotê hema çi eyalê bêqambît eyalê alemê biqutîtin go ew e."

Go ew jî jorda ço çow ço, ço erdekî nêrîtinê ku biçûkekê l'nav biçûka yêd bezît ber pêhnekê ber pê wêhe didetin, pêhnekê l'wêhe det, şeqekê l'wê didet, kaşoyekî l'wêhe d'det.(vêca wan sala, wî zemanî top nebûn aha hosankî hirî d'kire nav tiştê durû durû vêca kaşo jî çêdkir aha serêd wad ho bûn, topanêd kir pê.) Go gelek b'serê xelkê tîna. Go: "Bedê kurik hêreve were vêrê." Gotê: "Te şolep min nîne. Ma tu babê min î, mirovê min î?" Go: "Erê ez tiştê te me." Axirkî sê roj bû xwe l'ber wî kurîd vena, kurkî xwe nedida destî. Roja sê go: "Were lawê min were vêrê dê bo te bêjim." Go ew jî çow ço def gotê destê xwe b'serî da bir. Çavê wî maçî kir, yê bîrsî, yê têhnî, yê rûs, yê pûç. Gotê: "Were babê te yê hatiye xewna min. Go ne gotê hal û qese evene go biçûkê go dê bistîtin. Yê hatiye xewna min babê te ehlê cinnetê ye tu nahêlî xweşiyê bibet, tu yê dideye tezîbê. Tu boçî we l'eyalê alemê dikey? Babê te yê gotî êmanet kurê min." Go: "Babê min l'kîrê we gotîbû."

Go dê hove hove axirkî kurik elimî. Gotê: “Be ez ku bikem?” Roja paştirê xwîşka wî mirovî gele kete dilê wî kurî. Go careka dîtirê ew çö l’wî zelumî gerha. Go sofî filan kes ka çî zelum bû. (Ew bû go teymemildar bû, navê wî teymemildar bû) gotê go: “Dê rabe da biçîn here were l’gel min da destêd xwe bişö dê te virêkeme meclîsekê Quranê bixwîne.” Go rêkire meclîsa, xwand go ew kurik wesa zîrebû her Xwidewo tu d’zanî. Hema baş bû.

Cara paştirê ew zelum d’çîte wê rastê silav d’kete wê mixberê ser mezarê wî zelumî go hema berêxwedidetê radbîtin ku serê wî we yê spî, we yê spî xwe hiştî kulya hindikê. Rabû gotê: “Da biçîn.” Rabû gotê: “Were ez hevalê te me, ez dê l’gel te l’dinyayê gerhim.” Go: “Ya Rabbî eve çî kese, eve çî tişt e?” Ne go ez ew insan im. Go bûne ticar û bûne karwan û bûne filan û bêhvan l’gelekê çon, çone cihekî, hekû b’çine cihekê an hiştî Êraqê an hiştî va şehrêd evraz. Berêxwedidetinê alema ketiye derdê davekê çon go êkî lê kire gazî: “Hey bira! Hey bira! bo xetra Xwidê l’wê rêkê neçin ew rê tehlike ye.” Gotê: “Xêrbîtin?” Go: “Marekê heft ser yêd wê rêkê da hema çî insanê dît, dewar bît, hespa d’xwet. Go werin neçin.” Ya? Go: “Xwidê.”

Go wî zelumî go: “Were qet netirse, guhê xwe nedê.” Wî jî nezani ku ew însan e yê kurê wî ewêdî kirî, kurê wî şîred kirî, daye ber xwandinê, kirye ehlê başiyê. Go rabû çö go: “Were da biçîn. Em dêçin heft minêd xwê înin, du-sê meşkêd doşavê dê înin. Em dê keyne va erda korkeyn û xwêyê keyne binî û doşavê keyne ser. Bila bihêtin ev ejdehare bihête ser bixwetin.” Ewan jî we lê kir û go rûbarekê l’binî hindavê wî rûbarî go we lê kir. Rabû go ew ejderha hate ser wa gerkêd doşavê her xwar û xwar û xwar. Berêxwedidetê rûbarekê l’xarê. Dil lê sot, jorda qirişî darban şikand û çî tişte l’ber wî diket xwe ser ra diavêt û şikand. Çö çö çö ser wî rûbarî. Têr ava xwe vexwar û jêlîl hat. Vêca adiz bû, hindî betilî, hindî av vexwar go Rabbê alemê we heskir gotê mar neşeta çîta go wan jî xwe l’bervena çiv û çiv û çiv da ber tîra, da şîra da ber ewêdîya şeş ser go jêvekirin go marî go: “Eve ne serêd min bûn.” Wî camêrî jî go: Ew jî ne zerbê min bû.” Go heta serê dumahîkê jêvekir go: “Aha ew serê min bû.” Go: “Aha nê ew jî şinû zerbê min bû, tîra min bû.” Hinç hinç kir û pirt pirt kir û bire serekê agir berdayê ewê ku rabûy. Go: “Dê rabe here bike nav

kaxeza pîçik pîçik b'ke nav kaxeza em dêçîn.” Bir û çö. Go hindek wî bi xwe jî niza ku lêkir serê wî reş bû.

Çon bi dinyayê ketin û çon l'paşayê wî gundî bûne mêhvan. Bûne mêhvan şîv bo çêkirin filan û bêhvan û go her yêd çined xanî ve d'hên û nîznîzeka j'xanî têt û giryekê j'xanî têt. Go: “Hewe xêr e?” Go: “Willahî derwêş (xwe bi derwêşînî xemiland.) Go derwêş eve heft sale kiçek min ya hey tu ku bêjî kiça min ya we ye hind a nazdar e, hind a spehî ye. Go êşek ya lê eve heft sale ne tişt xwarîye ne çavêd xwe vedket. Ew jî her yêd bên hema vê gavê ne êkadî, her nîvsietê êk ji me yêd çîted xanî ve kanê rih ser da çoye an ne.” Go: “Heynene.” Go: “Belê wila.”

Go ew jî çö wê rastê niza pileka ji wê xwelîyê çî go: “Ma hekû em sax keyn tu dê çî deye me?” Go: “Hewe çî bivêt ser tayê dinyayê dê deme hewe.” Got çö wê rastê dest avêtê pileka ji wê xwelîyê ka çî kire nav çî tiştî go axirkî da kiçkê niza an avête ser çavêd wê. Go kiçik radabît her dibîte gorgora wê filana wê bêhvana wê go dîn dibû go her êkî betanîyeka b'serdaday çar zelumêd ser lêva betanîyê. Êkê ser lêva ve betanîyê êk vê, êk vê. Go nabeynekê kiçik rast û rabû go da go xwe vejenî go ew zelum hemî gêjbûn ketine wê derê ji tirs û heybetêd Xwidê da xafilbûn ya j'wa ve ka kiçik dê nihe mirît. Go: “Da bo min zadî.” Go: “Dayê gorî bo te tinê zadî nainim dê bo te hemî tišta înim.” Rabû zad bo bir û da kiçkê go: “Da wila min têr nexwar.” Ka ji kengî were zad nexwaribû. Têr zad dayê, kiçik rûnişte xarê cab bo paşay çö go were willa kiça te ya rabûy ya zadî d'xwazît. Ewî benê wey ewêd kiça min bo min sax kirî ewa çî bivêt ser darê dinyayê ez dê demê û kiça xwe jî dê keme hedîye demê. Go ew jî rabû yê kore ba yê şil ba, yê seqet ba l'dinyayê digerha hemî tişt danê. Her çêleka leng ba pileka wê xwelîyê ka ku lê dikir d'dayê go saxdibû.

Go jî j'wî şehri çon kiçka xwe jî bir û çon, xatira xwe j'wan xwast û çon. Çone erdekî nêrinê ku yê daweta zelamekî diken û rexeke şînî ye rexeke girî. Go wan jî gotê: “Eve çî ye rexeke şînî ye êkî girî ye?” Go: “Nê vî kurkî b'dilî nîne bo xwe jînkê bînît me b'xurtî ya bo îrandî. Eve birayê sêyê ye yê bo xwe jînkê tîntin yêd spidê radbin zavayê mirî û jînik ya sax e.” Go: “Heynene!” Go: “Belê willa.” Go vêca kurik jî gelek tirsê sünd xwar go e jînkê bo xwe nainim belê gundîya ya bo înay. Kurik jî yê bêxwidan bû. Go wî jî gotê: “Nene ez kefil hema bila qaweta xwe biket mirin jî emrê Xwidê ye, man jî emrê Xwidê ye.” Go gotê: “Dê bila.”

Wila rabûn daweta wî kir û mêrik nabeynekê xwe d'kete nav mezela wan ve erdekî xwe vedşêrîtin. Ew jî d'runine xarê tirs û heybetêd Xwidê da heta berê spêdê. Xewê dilê her duka girt û ketine wêrê. Ketine wêrê berêxwedidenê marekê j'wara têtê ejdeharek e, ejdeharekê hindî, hindî hizîmeta. Jorda hatê rasta serê kurkî esmanê xwe dirîşka xwe go ewî kir çireq şîrek l'serê wî da, serê wî jê birî ço wêra he bû qursekê zêra serê wî. Ku jê birî xwîn tê hat b'xwîn ve ewêdî ve hema ew bû bû qursekê zêrî. Go vêca her gêrîyêd jorda hatin û wî her hur hur kir da ber şîra her jorda hatin û wî her da ber şîra heta girekê şin zêra kirye wêrê. Kirê wêrê û jinkû mêrik jî d'xewin, hay ji xwe nîne.

Go sipêdê radbîn jinkû mêrik radbin û karê xwe d'ken û dê têtê xwen go gotê: "Eve cîrana bo me tiştêkê înay danaye vêrê perdeka l'ser. Cîrana yê bo me înaye vêrê ya Rabbî şîkur be heke me bi xwe çî nîne." Go berêxwedidetê hinde tiştêd binve hema j'dir û yaqût û ewêdîya yêd biriqin û yêd teyisin. Go gotê: "Ya Rabbî Xwidêwo gote êk û du. Go hindî mêrik bû gote kiçkê: "Hema jêvebe hema ne bo xwe b'deyne çî ne taliqê xwe gehîninê. Ka çî tişte ka înaye danaye wêrê dê hên bene ve. Eve ewê ewêd birayêd min kuştîn wan ev zêrêd danadîne vêrê da b'hilgirîn da me jî bikujin." J'wa tirs û heybetêd Xwidê da destê xwe nekirê heta ku sipêdê xelk hate sera filan bêhvan û go: "Wila kurê filan paşayî yê saxe çî lê nehatîye û yê l'ewêdîyê." Go ewan jî gotê: "Dê baş e." Radbît çît xelk têtê sera. Ewa jî nêrayê ku ew girê zêra yê l'wêrê. Go: "Willa eve gotî ka eve çî ye, kê bo me înaye danaye vêrê ev rizqê xwarinê. Zanî em bêxwidan in min çî tişt nîne ev zêrêd înayne vêrê." Go berêxwedidetê zelumî got: "Netirsin min êd înandîn." Go xwe tê werkir û çavê wan maçîkir û ewêdîkir û go: "Eve çî ye?" Go: "Hema j'hindê vebin. J'hindê vebin manê Ezraîl hatibû riha hewe belê Xwidê nehêla riha hewe bibet. Xwidê nehêla û ez jî bûme sebeb. Eve şivêdîtirê ez ê l'vêrê bûm hal û qese eve ne. Eve jorda j'ber kujîka hatiye hindava serê kurkî da pêvedeta go min şîrek l'serî da avête wêra he. Heke hûn bawerneken berêxwedene devê şîrê min û xwînê hêj xwîn a b'devê şîrê min ve."

Berêxwedidenê heqîqet we ye. Berêxwedenê ew kursê zêr û zehra mezin eynî hema çavêd pêve, guhêd pêve, devê pêve, tîrêşka pêvew hema eyna Xwide ka serê marî yê kuwe ew mar yê we ye. Willahî hema eve rast e. Berêxwedenê ew zêr go wesa hişî bin zîkê marî nîne perasî perasî ye. Gotê: "Aha ew zêr ê we ye." Ew jî

rabûn kirne telîsa hemî hindî ku herduka rabû bo xwe bir. Yêd dî jî mane l'mala kurkî xêr j'xwe bibînin.

Cardî b'dinyayê ket heta xweliya xwe ya wî marî, marê ejdeha mezin hemî xilas kirî. Yê korew, yê ker û yê keçel û yê gurî, yê bîrov lê bît, yê kulik lê bît çî lê bît qirîjinine go hindek ji wê xwelîyê lêdida, av d'dayê ku lêdkir go pê saxdibû. Go ew jî rabû gotê: "Dê em dê rabîn ku keyn?" "Ma dê ku keyn hema dê rabî çîne ber betenekê erdekî malekê têr zadî xweyn çîn taze tiştêd xwe l'xwe lêkvekeyn." Go: "Em dê jinkê ku lêkeyn?" Go: "Hema hindî me tişt şîrîkatî pêkve kirî em dê lêkvekeyn. Em çî tişî nahêlîn." Hiştî xelkê bêjît ha eve bo te, ha eve bo min behsê xeberê eve ye başbîtin dê keyne du ker êk bo te êk bo min. Eve yê bêxêrbîtin kerekbo min êk bo te. Go ew jî radbin tiştêd xwe hemya lêkvedken. Serekî d'danine wêra he, êkî wêra he, êkî wêra he kit kite. Go: "Bedê jinkê ku lêkeyn jinka may." Go: "Bila jînik bot bît" ewê biçûktirê, ewê j'qebrî hatîye derî ne yêdîtirê. Go: "Bila bo te bît". Go: "Ne wila ma bo çî bo min bît bila bo te bît" yê dî gotê. Go: "Bira bila bo te bît Xwidê da ma e dê ku lê kem. Em neşêynê be jinkê keyne du ker gotê êk bo min êk bo te". Gotê: "Ne b'Xwidê hema jînik jî eynî ya l'ser. Min jî ya dîtî te jî ya dîtî b'Xwidê dê jinkê jî keyne du ker."

Go: "Dê bila go mêrkî gotê ez dê çim heft mila l'ber te nepenî bim. Çiku dilê min dê suşît bo vê jinkê." Go: "Dê kerkeyn heta pîya rexe bo min êk bo te. Hema dê kerkeyn nîvîkeyn." Go: "Dê baş e." Hema bila bira destebirayê ezîz bila wesankî bît. Ew jî rabû ser nişîv bû çî j'wêrê çî pişt heft mila ket go ewî nabeynekê şîr hilgirt û da danîta jinkê go l'nava serê wê hindî şîyay go: "Nihê hişyarî xwe bî go dê te kujim. Nebêje eve dê dilê xwe b'min ve sojît. B'Xwidê dê te kujim." Go wesa tîrsa jînik go hema hindke şîr j'serê kiçkê bilind bû go marekî xwe j'serê wê avêt. Go marî xwe j'serê wê avêt go ew gehîşte marî şep û rep û şep û rep taze marê xwe qet qet kir û kuşt û avêt û kiçik rast rabû kiçik her Xwidêwo tu dizanî çend a jêhatî bû.

Go: "Dê birayê min da biçîn." Go: "Te jînik ne kuşt" (qêryêd jinkê heft mila ber wêve bû qêrî çone guhêd wî mêrkî.) Go dilê wî sot go hema b'wê bezê ve hat go heta ez d'çim dê xilas bît, dê riha wê xilas bît. Tête wê berêxwedidetinê ku jinka sax e. Qedêt marî jî jî hemê l'wêrê. Go mêrik bista go: "Eve çî ye?" Go: "Eve hema eve ye." Go: "Te biriba eyn da holêhêtave şîtî berê lêhêta." Çone wê rasta ewêdîya xwe

gotê: “B’xatira te tu here rasta mixberê.” Her go: “Em d’wêrêra naçîn” yê tirstirsoke bû. Go eseh e hema dê ew bît bila l’gel me bît hindî ev zelame yê baş e. Go: “Ne b’Xwidê dê d’rêka xwe ra çîn. Ez çî xelefê nabêjim, ez çî tiştî jî b’serve narisînim ez dê hema wê bêjim ewa ku me dîtî û me kirî.” Go d’ser mezarê xwe ra çî go hema dêrê mezarî vebû çî tê ve. Go ew çî tê ve. Yê dî jî kete hizra û ewêdiya heta kurik çî şêşt heftê saliya ew zelumê j’ewilî çoye wêrê pîrbûy, serê wî jî sipîbûy. Go wila jinka xwe bir û zêr û zînetê xwe bir û çî qesta mala babê xwe kir. Go wan destavêtê daweta wî kir û ew jinik lê mehr kir û min jî qesek hêla rihme l’deybabêd hewe...

Vebêjer: Rukiye Duran

4. FEQÎ

Feqîyek hebû. Ew û xwîşka xwe bûn. Dayka wî û babê wî mirbûn her tu tene bê xweyî û xwidan bûn. Wextê babê wî mirî gote jinka xwe, gotê: “Ya ebda Xwidê! Go heke ez mirim go kurê min hinêre ber feqîtiyê.” Malume hinkê kurik hêj d’zikê makê da bû, malume Rabul Alemîn hêj kurik nehatibû dinyayê. Piştî mirna babê kurê wî hate dinyayê. Wextê kurik hatiye dinayê, dayka wî jî heke salekê du sala xwidankir dayka wan jî emre xwidê kir. Kurik ma êtîm. Daykê jî gotibû kurkê xwe gotibû babê te ev weysîyete wa kiri.

Kurik rabû malume hinarte ber feqyîtiyê. Hinarte ber feqyîtiyê xwîşka wî tine ma l’mal. Heke salek du sal deh sal çoy kurkî xwand. Kurkî got ez dê çim sera xwîşka xwe dem. Kurik jî mezin bû, xwanda bû malume zivirî hate ve. Ew jî hat berê xwe d’detê b’rê d’çît serkekî d’bînît sere mirova, hestiyê kûloxkekî d’bînîtin. Kurik yê xwanda bû bere xwe d’dete kûloxkî, ya Rabbî go eve çî serke l’vêrê, kûloxê mirova l’vê çola Xwidê. Bere xwe d’detê l’ser enya wî ya nivîsiya ev kûloxke dê heft qetil vî kûloxî hêne kirin. Heft qetil go dê b’vî kûloxî hêne kirin. Ew jî radbîtin d’bêjît ya Rabbê min bene tu yê pê alim û agih î. Hestiyê kûlox dê çawa heft qetila ket ev kûloxke. Ew jî radbîtin wî kûloxkî d’şkênît, şîdkênîtin heçkû pê xwe d’detê ho wê ve d’det. Berê xwe d’detê morkeka şîn dite l’wêrê. Nezanî ne j’serkî derketiye, j’kûloxkî derketiye, j’nav wan hestîya an jî hema l’wêrê bû.

Ew jî hema wê morka şîn d’kete berîka xwe da, ew jî d’hêtin wextekê şeve tik tik l’deri d’det. Xwîşka wî d’bêjîtê: “tu çî kesî”, D’bêjîtê: “ez birakê te me, ez ê hatî” Gotê: “tu birayê min î? Eve çend sale tu yê çoy?” Go: “eve hinde sale ez wê çoy” Malume tarif bo xwîşka xwe da xwîşka wî paşê der lê vekir Xwidê jê razî bît. Der lê vekir ew û xwîşka xwe d’çine ser û s’tihêd êk û du bo xwe sihbet kir hata wextekê şeve kur jî malume rabû nivist, kiçik jî rabû got birakê min yê b’rê hatî go ez dê rabim çilkêd birayê xwe şom. Ew jî cilka j’pişt sere birayê xwe radketin, d’betin , d’şotin. Berîkêd wî saldket bere xwedidetê morika şîn d’bînîtin. Kiçik jî d’kete d’devê xwe da gava kire d’devê xwe da berîkêd wî salkirin êdî morik j’bîrkir. Hedî daûrabîtin kul ê hatibîtin kiçkê nezanî.

Siharê jî birayê wê radbîtitin bête xwîşka xwe: “Ka cilkêd min, ka gomlekê min?” Go: “Wila gomlekê te min wê şuştî bira.” Gotê: “Te berîkêd min salkirin an

ne?” Got: “E.” Got: “Te çi nedît?” Go: “Morkeka şîn tê da bû. Got min kire d’devê xwe da min nezani ka kulêhat. Hindî ez lê gerham l’min berzebû.” Malume bene kurkê xwanda bû Xwidê jê razî bît. Ewî jî hema ew siet nivîsî not kir. Ma heke heyvekê du heyva sê çar heyva ma bere xwe d’detê xwîşka wî zikê wê gir bû.

Wextê zikê wê girbû gundiya go willa xwîşka feqey qese jê ço. Feqey jî gote xwîşka xwe go: “Eve çi hale?” Gotê: “Wella b’filane sundê roja Xwidê ez dayim heta vê saate jî ez ya we me. Zikê min yê girtbît hekû tiştekekê b’rih yêd zikê min da” gote bira.

Bira jî sebir ser kêşa, d’zanî tişteka hey û şika wê morhkê jî her a dile wî da bû. Ma dê heta qewlê timam bûy. Bira jî d’ço cotî. Ma’lûm e birayê wê jî her ro d’ço cotî d’hate ve .Êvarê xwîşka wî qewlê wê timam bû, nisaxbû. Feqe jî rabû ma’lûme li gundî gerha dûv pirejinkekê pîrejink îna. Gotê xwîşka min nesax e li dev xwîşka min be. Û ew ço cotî. Ço cotî piştî çoye cotî ma’lûm e Xwidê kerem kir Xwidê kurkek da xwîşka wî.

Wextê Xwidê kurik da xwîşka wî kurik hate dinyayê gote pîrka go: “Dest bi min nekin ez wê bi destnivêj im.” Wextê gotî ez wê b’ destnivêj im, pîrik biêcîn. Wan jî go em dê kul ê keyn go em dê ku lê keyn eve Xwidê şînûka yê xwidêday yê d’bêjît dest b’min nekin, b’xwidê em dê beyn avêjîn. Radbin ben d’kene d’hafirê hêstirê da, d’hafirê dewara da.

Ma ma’lûm e êvarê feqe jî d’hetin birayê wê bêtê: “Ka xwîşka min çawa ne?” Gotê: “Xwîşka te wa baş e. Go wila Xwidê kurkek daye hal mesele eve bû. Go ez ê destnivêjim me jî bir avête d’hafirê da niha mirîya.” Kurik jî feqe jî jema qesta axûra dewara d’ketin, qesta kurkî diket ka ku lê hatiye. Diçîte derî d’bêjîtê: “xalo tu hati?”

Wextê gotî xalo tu hati, kurik d’çît berê xwe didetê hêstirê helma xwe wa dayê ji qudreta Xwidê da kurik necemidît. Xarzakê xwe rakir îna def xwîşka xwe pêça xwidankir. Xwidankir gote pîreka vêca hûn herin. Pîrik rabûn çon. Çon ew û xwîşka xwe man. Xarzakê xwe xwidankir dê heke salek, du sal, sê sal pê çon biçûk bû. Qralî xewnek dît, qralî xewnek dît, dît zadî l’gel seyê reş d’xwet. Wextê dît zadî l’gel seyê reş dixwet. Qralî rimildarêd xwe gazîkirin, ewên xewna tarifname d’ken, gotê werin xewna min tarîfa wê bidin kaç i xewin min dîtiye divêt hûn bêjin. Ma’lûm

e hindî hatin kesê nazanî. Gotê çî kê nezanît ez sere wan lê d'dem. Êk hat go xewna te ne ew bû, ma'lum e got ya ho ye ho ye nezanî sere wî lêda. Êkê dî hat sere wî lêda, êkê dî hat kesê dernexist. Sere çar penceka lêda.

Kurkî gote xalê xwe, wey biçûk gotê, gotê: "Xalo!" Gotê: "Çi ye?" (qiral jî wextê serê wa lédida gotê çî kê xewna min derbêxît ez dê xirzîneka zêra demê.) Kurkî gote xalê xwe gotê: "Xalo?" Gotî: "Çi ye?" Gotê "Tu min bibe def qiralî tarîfnama xewna qiralî go ez dê dem, gel min da ez dê mirim jî bes ew dê xirzîna zêra ew dê dete te, hindî zêra b'dete te bo xwe wergire bîne. Gava min tarîfnama xewna wî da jî ez dê mirim da tû bizanî."

Xal jî radbîtin gotê ewil gotê: "Ez te nabem" Got: "Willa tu dê min bey." Rabû ma'lûm e xarza bir çî dîwana qirali: "Qiral beq!" Gotê: "Çi ye?" Gotê: "Te'rîfa xewna te xarzakê min dê det." (Bi rêve jî xarza gote xalo go nihê bêjê bêje qirali heke xarzakê min xewna te neda sere min û xarza wê min herduka bibire go wê bêjê.)

Ew jî me'lûm e xalê wî çî runiştê xarê. Gotê: "Ha qiral beq!" Gotê: "Ho." Gotê: "Dê te'bîra xewna te xarzakê min det. Heke xarza wê min te'rîfa xewna te neda sere min û wî lêde." Gotê: "Ev kurkê dê te'rîfa xewna min det?" Go: "Belê." Go: "Eve dê ku te'rîfa xewna min bidet! Rimildara nedaye eve dê ku zanît." Go: "Me'lûm e heke neda eve serê min û wî her dûka lêde." Go: "Bila serserê xwe."

Dê l'gel kurkî axift go: "Dê te'rîfa xewna min dey?" Gotê: "Belê." Bes kurkî jî got: "Qiral beg bele nihê ez çî bême te lazime ez ku bême te tu we bikey. Heke tu we nekey eve xewna te dernakevît." Qiralî jî go: "Wey serserê xwe." Go: "Here bo min zabeşekî bîne." Go: "Serserê xwe." Rabûn be me'lûm e qiralî zabeşek îna. Gotê: "Sênyekê jî bînin," sênyek jî îna. Zabeş go kire tê da. Go: "Kêrkekê jî bo min bînin." Kêr jî îna deyna wêrê. Me'lûm e got: "Jina xwe bîne" jina xwe îna. Got: "Kiça xwe bîne" kiça xwe jî îna. Gotê: "Xidama xwe bîne" xidam xwe jî îna.

Wextê îna xalê wî jî gotê: "Em dê çîne d'odekê ve." Çî d'odêve gotê derê odê asêke derê odê jî asêkir. Berê xwe dayê. Gotê: "Qiral beg" gotê: "Çi ye?" Gotê: "Jina tew, kiça tew, xidama te ew sê, ez û tu û xalê min em jî sê go ma em şeş d'vêrê ve nînin?" Go: "Belê" Go: "Ma kesekê dî jor ve heye?" Gotê: "Ne." Gotê: "Ew çî ye

l'ber pencerê?" Wextê ewa ho berê xwe da pencerê ewî kurkî hema destê xwe girt kêrê da rep û kired zabeşî da berzekir. Wextê berzekirî zivirîne va. Go: "Me çi nedît." Go: "Temam."

Ho berê xwe dayê go: "Ew kêr kêr ku lê hat, kêr d'vêrê da bû" Gotê: "Nexê." Go: "Êkij me kêr dizî." Go kêra çi go nexê hewe dizî. Qiral beg, gotê te dizî. Ma em şeş wê d'vê odê va. Êkij me va her şeşa wa dizî. Lazim e ev kêre derkevît. Hindî gotê filan bêhvan go çênabît. Jinkê gotê: "Eve çi ye? Kêr hema te wa dizî kal kî ve ye." Go: "Ma hem eve ne şeş in ma kes derve hatiye hema em eve ne." Jina qiralî înkâr kir.

Gote qiralî: "Wila hûn dê xwe rûsken. Ez dê te areme kem." Qiralî xwe rûskir kîlote xwe hêla d'pê xwe. Gotê: "Kîlotê xwe bêxe." Qiralî kîlotê xwe êxist. Xwe rûskir. Gotê: "Tu here kuncê he b'sekine." Ew da wî kuncî.

Dê gote xalê xwe: "Dê veca dora te ye tu xwe rûske." Gotê: "Xalo min nebîr" Gotê: "Na b'xwidê ez dê te areme kem tu dê xwe rûskey." Me'lûm e rabû xal jî rûskir kîlotê wî jî j'pîya kir rûskir ew jî deyna def tenîştî qiralî.

Gote jina qiralî: "dê yellah tu xwe rûske." Jina qiralî kiras ser milê xwe da îna xarê. Go: "Yellah xwe rûske" jina qiralî jî bê sitarkir ew bir dana pişt qiralî.

Gote kiça qiralî: "Dê yellah tu jî xwe rûske." Ew jî wê îbaretî xwe rûskir ew jî da pişt qiralî.

Gote xidamê hindî jina qiralî û kiça qiralî bûn. Gotê: "Bela xwe j'xidama me veke b'filane sundê xidama me hay jê nîne." Me'lûm e go: "Yellah çênabît xidam jî dê xwe rûsket." Xidam jî Me'lûm e rûskir pîçamê wê ma d'pîya. Gotê: "E naêxim" Gotê: "Yellah pîçamê xwe jî bêxe."

Xidamê pîçame jî êxist berê xwe d'denê çi berêxwedidenê xidam ji qiralî zelamtir. Gotê: "Qiral" Gotê: "Çî ye?" Gotê: "Ew xwarna te l'gel sey veca te'rîfa xewna wî da." Gotê: "ew xwarina te l'gel seyê reş dixwar aha seyê reş eve bû te l'gel xwarin dixwar."

Gotê: “dê vêrê bikolin. Nîveka xanî bikolin got bere xwe bidene bodruma bini.” Kola berêxwedane bodruma binî berêxwedidenê sê biçûk yê ji kiça wî bûyn yêd kuştî avêtined wêrê da. Ew her sê biçûk jî derêxistin. Qiralî got dê, qiral rabû Me’lûm e cellat îna jina xwe kuşt, kiça xwe kuşt, xidam jî kuşt. Wextê xidam jî kuştî zêr jî ji qiralî sitandin dane xalê xwe û emrê Xwidê bicihhat. Ew jî me’lûm e wefat kir ew jî timam bû.

Îlhama Rabul Alemin eve jina qiralî, kiça qiralî, xidama qiralî, sê biçûk jî yêd xidama qiralî ew bi xwe jî eve heft eve herf heft berêxwebidê ser enya wî kûloxkî nivîsîbun eve heft qetil bi vî kûloxkî hatine kirin. Hizar rihmel deybabên guhdaran.

Vebêjer: Tahir Timur

5. HEFT XWÎŞK³⁵

Malekê heft xûşk hebûn. Rojekê van her heft xwişka gote dayka xwe: “Em ê çîn bo xwe hindek leyizîn û em ê paşê bihêyn.” Dayka wan jî go: “Temam herin bes xwe direnk nehêlin.” Gotin: “Bila. Rabûn ji gundî derketin çûne nav dar û baran bo xwe leyistin qederekê wext borî xwûşkeka wan gote xwişkên xwe: “Em biçîne malê niha dayka me dê me mereq ketin.” Wan jî got: “Welleh tu rast dibêjî divêtin em zû biçîn hêj nebûye şev.” Rabûn rêketin dabiçîne malê hindî tên nizanin ka ew ê kîj rexê ve herin ji ber şevê rêka xwe berze kiribûn. Xwûşka wan a mezin got: “Divêtin em bo xwe cihekê bibînîn nexwê belkî belayek bihêtine sere me.” Xwûşkên dî gotin: “Tu gelek rast dibêjî divêtin heta sipêdê vêt em bo xwe cihekê bibinin.”

Rabin diçin diçin wextekê dinêrinê ji dûrve lempeyaka malekê teysîtin tine wî gundî de ew mal hebû. Xwûşkeka wan got: “Em herin ez tirsim, te nevêtin miroveka xirabîtin belayekê binîtine sere me.” Xûşkeka wan ya dî got: “Welleh ez gelek têhnîme divêtin ez av ê vexwem heke ez ê têhnadan bimrim.” Xwişka wan ya biçûk got: “Ez gelek birsî me ez xwe nagirim birsan da hema em herîn belkî miroveka baş bîtin.” Welhasil xwişka qerera xwe da gotin: “Em ê biçîne vê malê.”

Rabûn rê ketin nêzîk malê bûn. Pîrhevokê got: “Bêhna mirovan ya têtine min kaca ez binerim ev kîne.” Rabû derkete ber derê malê dinêrîtinê ev e heft kiçik nîk wê ne. Keyfa wê hat rabû li ber wan ve çû gotê: “Hûn xêr hatin ezizên pîrka xwe ka hûn ji kîderê tên ka bêjin hûn birsî ne yan têhnîne ka werin def pîrka xwe da ez hewe maç bikim.” Xwişkeka wan got: “Dapîrê em berze bûn e heta sipêdê em dişeyn bine mêhvanet te yan ne.” Pîrhevokê jî got: “Erê berxê min werin em biçîne malê.” Rabûn çûne malê. Xwişka wan ya biçûk gotê: “Dapîrê ez geleka birsî me.” Pîrhevokê gotê: “Bila berxa dapîra xwe ez ê bo hewe zadî înim.” Pîrhevok çî te mitfaqê keyf keyfa wê ye bo xwe strana bêjîtin û dibêjîtin ez ê wan ivşeve bixwem. Pîrhevok zadî hazir diketin dibêjîtine wan heft xwişka werin zadî bixwen. Ev xwişk radibin xwarinê ew ê bixwen dinêrinê xwarineka bitaameka cuda ye. Xwişkeka wan dibêjîtin: “Dapîrê ka xêra xwe bo min tu şey avekê bînî.” Pîrhevokê got: “Çewa

³⁵Erdal, Taş. *Motîfên Sereke Ji Çîrokên Gundê Serispiya Colemêrgê*. Teza Lîsansê, Zanîngeha Bingölê. Bingöl, 2017. r:24

neşêm berxa min.” Dema pîrhevok avê înitin wan xûşkan got: “Dapîrê ev çi ave ya hosa.” Pîrhevok jî dibêjîtin: “Welleh ava me ya hosa ye.

Welhasil xwarinê xwen piştî xwarinê çine ser cihê xwe da ku birazên xwişka wan ya Mezin got: “Aqlê min qet ji vê pîrejinê nebirt ka hûn çidibêjin xûşkê min.” Xwişka jî got: “Welleh em jî eynî hiştî te fikirîn.” Xew neketa çavê wan bes hindî wext çû çavê wan êdî tate girtinê dinava wan xwişka da ya biçûk neraza. Pîrhevok rabû çû mitfaqê satora xwe hûlîsand û bo xwe stran digotin got: “Ez ê wana hemûyan bikujim û goştê wana bixwem.” Di wê navberê da xwişka wana ya biçûk rabû got: “Ka ca ez rabim binêrime vê dapîrê ka kut ketin.” Rabû çû dinêrîtinê pîrhevok satorê hesûd û dibêjîtin: “ez ê wan hemûyan xem.” Dema van axiftina gulet bîtin kiçik gelek tirsîtin bixeletî deng jê derdkevîtin pîrhevok jî gulet bîtin û çîtin vê kiçkê girîtin. Kiçik dibêjîtin: “Min nexwe ez ê bo te şohlên malê bikem tu bes xwûşkên min berde bila biçin.” Pîrhevok dibêjî: “Bila wesa bî.” Her şeş xwûşk rê kevin çine malê dayka wan bîne keça wê ya biçûk gel xwûşkê xwe nîne dibêje: “Ka xwûşka he we ya biçûk.” Keçê wê dibêjin: “Welleh dayka min xwûşka me got ez ê mîni me def vê pîrhevokê min gelek hejê kir paşê ez ê bihême mal me jî got tamam.” Dayka wan got: “Hûn lêbandîne vê pîrhevokê ew ê keça min bixwetin rabin em ê çin lêgerîn hêj xwişka he we nexarî.”

Rabûn ketine rê lê hindî hatin mala pîrhevokê nedîtin êdî bêhêvî man hatine malê. Pîrhevok her roj vê kiçikê dibetine şohlî û şohla pê detekirinê. Rojê kiçik qesta revandinê ketin dibêje: “Dapîrê ez ê çi me hindek hejan bo sobê darên me ne mayine.” Pîrhevokê got: “Here belê zû we re heke ez ê te bukijim ha.” Kiçikê jî got: “Bila ez ê zû bihêm.” Ji xwe pîrhevok fikirî got ev e neşê ji min birevî ma ew ê biçîtine kîderê. Kiçik rabû kete rê hindî qûwet lêy direvî wextekê gihişteke ser kaniyekê tam ew ê hindek avê vexwetina hirçekê xwe lêda û girt bire şikefta xwe. Gelek sal derbasbûn ev kiçike û hirçe gelekê şû kirin û tîjî têjkên wana çêbûn. Dîsa piştî wexteke hirç mirîtin û ev kiçike mînetine tinê. Ev kiçike jî wekî hirçan lê hatibû te nedizanî ku mirove.

Rojê têjkên wê gelek birçî bin radîbît ew û têjkên xwe xwarinê gerhin. Dibînin ku dûrve birekî pezî yê têtin çavê wan teysitin û keyfa wan têtin. Radîbin çin xwel pezî den bes şivan tifenga xwe derdixetin hemûyan kujîtin tinê ev kiçike û

têjkeka wê mînitine sax. Şivan tam dê wan jî bikujîtina ev kiçike ya hiştî hirça dibêje: “Şivano me nekuje bextê Xwidê.” Şivan şaş dimînîtin dibêjt: “Ev e şibetî hirçaya bes hiştî mirova diaxivîtin ecebe ez ser hişê xwe me yan ev çi ye.” Hirçê(kiçik) got: “Şivano ez te nasim tu şivanê gundê me yî ez kiça filankesî me te ez nasîm nihe.” Şivanî got: “Erê min tu naskirî bes ev çi halê te ye tu çewa ketiye vê halê.” Hirçê(kiçik)got: “Hal û mesele ev in şivano.”

Şivan hirçê û têjka wê betine gundî mala wê ya berê dema ku diçine berderê malê dayka kiçkê dibêjtine şivanî: “Ev e çine te înatine mala min.” Şivan jî dibêjtin: “Ev e kiça te ya ewa berze bûy.” Daykê got: “Keça min a biçûke qatî ev e şivano.” Şivanî got: “Erê keça te ya biçûk e.” Dayka kiçkê, xep keça xwe werînitin û wê maç ketin. Radibitin kiça xwe baş dişûjtin û paqij ketin. Pişt wê dayka kiçkê bo kiça xwe goştî çêtketin dema ku wî goştî kiçik û têjka wê xwen pê mirin ji ber ku ne elimtibûne goştê kelandî yan ye bijartî ji ber hindê jehrê pê girtin û mirîn.

Vebêjer: Hanife Taş

6. HESEN LAWÊ HEKARÎ

Go carekê zelamek hebû. Êkî d'gotê Hesen. Hesen hema milekî şebkî hebû yêdî wekê dî rûs bû. Kurik bû, rûs bû. Bo xwe ho d'gerî l'şehran willa ço heçku d'bên şehrekê wekî Cilemêrgê. Berêxwedidetê xelkê çoy qehwê go ka jî da biçime def wêd he çayê vexwem. Willa ça vexwar, nê nerabû ji wêrê xwidanê qehwê êka dî jî bo îna welhasil du sê şûşêd çayê we vexwarin. Piştî hingê ew jî(xwidanê qehwê) hat gotê: “ma tu narabî pare min bideve.” Go: “bira min takekî şepkîye rexe pêve nîne, ne şele ne derpiyew min takekî şepkî yê hey.” Îna zelamekî heçku ji cihekî hatî gotê: “pare te çiyê ez dê deme hedî çayê nede vî. Ma tu d'bîni çi pêve nîne rûs e mad ê ku lê key dê kujî?” Îna rabû ser xwe piştî hingê go: “Ma te çi kesê xwe nîne” Go: “hema ezê rabûy kolana ra min xwe yo hoy dîti. Min hema fam ji xwe kir ez gerime. Ez nizanim ka day heye, bab heye ka çi kes heye ez nizanim. Hema ezê hosa bûm.” Go: “Dê were da biçîn nik min, l'gel min were cihên me dewam walîyan hakimana, mezinan pêdivîyê biçûkekî ye. Ez dê te bem belki te b'helgirî bo xwe.”

Willa rabû bir mal û destekê kir berda. Ew jî feqîr bû bes cilkek daye. Be rûs e dê. Cil kirne ber û gel xwe bire heke waliyek, heke hakimek heke mezinek l'wêrê bû. Îna bir wêrê silavkirê silava wî veda go: “Te xêre?” Gotê: “Hal û qesêd min û vî kurkî eve ne. Vêca ev yê bê xwidan e d'rêya Xwidê da tu jî xwidanke. Go te ji min çêtir pêçêdbîtin.” Gotê: “Dê şet çi şol ketin?” “Kuro tu çi şol key?” Go: “Willa ez nizanim min heta nihe şol nekiriye belê heke şolekî nişa min biden ezê kem.” Îna gotê: “Min çîçku baxçe ewêd bo lawînî diken tu dê şey bo me lêkey e dê nizanim heyvekê yan salekê zêrekî dem te.” Wî jî got: “Belê wila e dişem. Xwarina te vexwarina te boy neşem.”

Îna rabû ser xwe spêdê bir leşê wî şuşt, destekê cilên law kirne ber û nîşa da go heke xurtomek heke gumgum tişteke we gotê: “Rojê du cara tu dê van dera reşînî û êvaran jî heke xelk hatine dîwana min tu dê çayek bît, qehweyek bît dê îni gêrînî” Got: “Temam e.” Mal l'wêrê heke deh salan heke bist salan ew jî tam hat ser xwe, zelum bû, mezin bû berêxwedidetinê şehre wan zelamek spêdê zû ye hekû derkevît j'derve nêritinê hespekê sor e d'çît serê bajêrî jorda l'wêrê hespê xwe carek dî radkete didudanê d'çît binê bajarî. Wey gotê xwelî b'serê min were ya ez d'jim ma ez hepsî me? Nexwû ma her evê he dê dinyayê bo xwe helînî û xweşiyê betin. Ma bo e

jî nabiçim webikim. Îna rabû ser xwe, xwe pîçe posîdekir. Go: “kuwe te filankes?” Go: “wila heke tu izna min bidey ez dê bo xwe derkevîm dinyayê.” Îna rabû parêd wî hisap kirin gotê: “Ha eve parêd te. Ma kuwe, kesekê deynkirye te?” Go: “Ne wila kesê deynnekirye min hema keyfa min nahêt.” Axir ka deh zêrbîn sed zêrbîn çendbîn parê wî dayê.

Ew rabû çu hespek kirî eyn yê wekî wî. Çu nik seracî destek zînî û berzînî û çu tiştê wî helgirtî ku bît wî jî hiştîyê wî hilgirt bo xwe. Parê wî hin ma hespê xwe betin xanê ew jî biçîte otelê çu parêd dî neman. Wila rabû ser xwe şîr û rim û ew jî bo xwe helgirtibûn. Rabû ser xwe hespê xwe bir xanê ew jî çu otelê spêdê hat zû hespê xwe serê wî girt bir lê sîyar jî nebû. Bir serê bajarî şîrê xwe înaderê her ho bada hesp rakire dûdane. Wila çu binê bajarî hinde dê bajar xilasbît berêxwedidetê jinkekê l’ser balkonê gotê: “Hesen ma tu dê min hêlî?” Baxçîkek d’destî. Îna go: “Ne wila” Wî hespê xwe dûvpişt îna nizanît sêba wî eve ka dê têştî mirovêd xwe bete nav cotî çu. Wila wî jî dûvpişt îna ewê xwe avête pişt û boxçka xwe da destê xwe destê xwe avête nîveka wî girt û gotê: “Min bibe dê lez e.” Her çu go lezke, her çu go dê lezke, her çu go dê lezke. Go: “Herê qence heta kêrê tu dê hêy?” Kuro gotê: “Ma tu min bo xwe nabey? Nê eve çand roje, çend zemanê ezê her tîm wêrê firset min nedîtiye ku tu da min bibey.” Ewî bo yê berê daxwazt wedkir(zelamê berê) j’ber wê bû. Navê her du ka jî Hesen bû. Îna rabû ser xwe go: be “dêmek Xwidê ez kirme nesîbê te. Min be erdekî nik mîrekî, nik ewekî da b’’îşe me biaxivin.” Kîçê go: “Min çu kes nîne, çu xelat çu xebat nîne min ne xanye ne male ne min çîye.” Be wila got: “Be ez neşêm çim ve. Dê mirovên min min kujin. Hema ez bo teme. Tu bo xwe ku îdare d’key min jî we îdareke.”

Wila rabû çu nik cihekî wekî Amêdiyê rexê wî bajarî beden bû. Heta çon wêre dergeh lêk da, qepatkir. Go wila sieta dergehî xilas hêdî hema yesax û negirîn nabe. Dê mine l’pişt derî. Ew jî rabû ser xwe hespê xwe hêla l’wêrê û jinka xwe. Go e da hinde bera danime rexê bedeni, hinde dar û ber û pûşk û agirekî b’helkeyn heta sibê b’keyn îdare. Wila ew jî rabû l’wara gerîya milek dara bo xwe tînit hêtin berêxwedidetê ne hesp l’wêrê ye ne jî jinka wî. “Ka dê nobetçî ku lê hat?” Dibêjî: “Eve ez l’pişt dergehî min hay jênîne, berderi ez nabînim, wila e nizamim.” Dê axir ku b’ketin. Şev e tarî ye nizanît kîve çon. Îna sibê der vekir, zelam êk neqil çu nik

mezinê wî cihî, heke paşa heke çi kes. Gotê: “Hal û qesêd min eve bûn. Ez mirovekê yebancî bûm min jinkek revabû min qesta nik te kiribû. Heta ez hatîm dergehê girtî pişt derî yêd berzebûy. Vêca mentîqa te ye tu d’zanî.” Kuro go: “Benê serkaniya me ya dideste dêwî da. Vêca ew kê şîva dêwî nebirîye ewê hatî sêbawî ew şîva wî ye.” Her şev kiçek û sîngêkê pelavê bir d’dayê da b’bet bixwetin. Da ava wan berdetin heke ava wan ya embarkirî bin çîyay nahêlît bihêt. Îna rabû ma deftera xwe îna hisapkir bû gera paşay. Paşay şîv nebiribû. Îna gotê wî jî gotê: “Herê qence ma ew dêw kîrê ye ma hûn nahên nîşa min biden manê madem esseh hûn d’zanin ewî birye an e dê b’rih bim an ew. Bo çi jina min birye xwarîye.” Îna paşay jî gote êkê dî: “L’gel here erdê lê da nîşa b’dey. Qewî belawî jî j’te vedbît. Ma em dê ku lê keyn.”

Wila pišta bajêrî ho dolek lêbû, çîya bû. Yêd dî rexêd wê gelî bû çinar û bî yû filan û ew dehîlbû. Ço nêzik bû kuna wê ji dûrve dît go: “Nihê wahe ye.” Hindî hatê gotê: “Were” Gotê “Willa ez ne wêrim hêm b’Xwidê min cisaret nîne e newêrim.” Gotê: “Be pišta xwe bide vê çinarê.” Wî jî pišta xwe da çinarê. Wî jî destêd wî d’çinarê alandin û girêdan mukim. Wila ew ço. D’çît berêxwedidetê kiça rûniştî xwarê kiça dêwî rûnişte wêrê kiça wê xwe hiştî hûrîyê ye. Dêw yêd xewçoy. Kuro go: “Tu çi kesî pêşi reşko tu hatî?” Gotê: “Wila şîvêdî hewe jinka min ya înay babê te ya înay xwari, babê te ye çi yê te ye? Ez yê hatî dê kujim, tola xwe vekem.” Gotê: “Dê b’çi kujî?” Gotê: “B’vî şîri.” Go: “Ew şîr serê babê min nabirît.” Go kiçê jî piçe keyfa xwe birê. Go: “Ba b’çive kujît.” Gotê: Ka şîrê xwe dane vî bagurdanî mibliq e heke şikand dê serê wî birî heke ne şikand da bizanî tu neşey serê wî birî.” (Be dêw jî şevêk û rojeka d’xewdçin. Êk d’bête êkî xewa dêwa.)

Îna ewî jî şîrê xwe d’bagurdanê mibliq werand. (Mibliq asin e, binkêd aş a wana zerin, tirk dibên sarılık em di bên mibliq) îna tê werand şîr parçe parçe bû şikest. Berêxwedidetê yê dêwi yê şikevtê ve teqê şikevtê ve. Wila ço yê dêwî j’wêrê vekir, j’kavlanî kêşa d’bagurdanî werand hekû xîyar e bagurdan qetkir. Wila wî xwe da paş û navê Xwidê pêxembera îna ew şîr girt xwe d’geha sitihê wî werand. Serê wî firî ço wêrê nirînek we vêket he toz j’çîyay rabû heku birusî heldkevît. Ewê dî ewê b’çinarê ve girêday hema kir diring çinar heland û bir. Wila ço go vêca go bajarî da ço ket xanyan û ket mirovan vêca rukumek biribû yê qulipandî birî kuro go xelkê go:

“Kuwe te, filane tu çi kesî?” Wila piştî rawestay sama wî şikest rawesta çon jê vediken. Piştî hîngê hindî tînê neşetê çi bêjît. (tirs we zexm e.)

Îna ew jî rabû gotê: “Kanê kilîlka deve. Erdê hûn avê lê bardket babê te ka l’kîrê ye? Da ez avê berdem bajarî xelk gunhe ye, xelk mir j’têhna da.” Kuro go: “Te şolep hindê nîne.” Dumahiyê go: “Ka du bide min.” Nişa da wila ka çikulê kevirî bû, çibu av çikkiribû, sêhr lê kirbû, berda vêca yê dî pîçek berdda hema wî xilasî j’ber çiya rakir. Vêca berêxwedaya sê mihelal’bajêri avê birin. Her man dê ava wan hişkbît û her man dê ava wan hişkbît û hema her gava boştirê boştir e. Gotê evî mirovî ku kir? Go: “Da bo te bibêjim” Gotê: “hê” Gotê: “me j’êre nebe heke tîn ew dê hên dûv te da. Gotê dê paşatiyê bo xwe helgirî. Heku tişt Xwidê b’qismetkir sanahî ye. Heke te em j’êre birîn ew dê sêhwarekê l’te girin dê te kujin tu bê piştî bê mêrî bê ewî te min jî ji te wergirin.” Gotê: “Bila.” Wila heyvek pêve çon dumahiyê paşay û wezîri gotê babo benê evî qencî l’me kir ka da biçîn bînîn. Gote wî mirovî ka were ewê bi çinarê ve girêday. Hindî hatinê b’xurtî b’çi terza go: “E newêrim.” Wila rabû ser xwe îna da berxwe b’xurtî îna l’erdê lê girêday gotê: “Nê wara wî ye.” Wila ew rabûn çon berêxwedidenê yê şikevtê şeveq veday kiça dêwî ye çend zêr û zînetêd dinya d’pêve dilnadet b’nêritê. Wila gotê: “Navê te çi ye?” Gotê: “Hesen Lawê HEKARÎ ye.” Gotê: “Wila tu dê hêy def me te qencîya l’me kirî. Tu d’çiya ra ku dikey, d’binê vî bîşî ra were da biçîn.” Hindî gotê: “Lêre jî bo min baş e.” Go: “Ne.”

Wila rabûn mala wî barkir bir dana xanyek bo girt dana têve. Heke heyvek heke du heyv çon gotê teftêşa bajêriye go delala bang heldêran kes agirek ronahiyek helneketin. Wila wan jî ronahî helnekin rabûn ser xwe çon ho berêxwedidenê pencera wî şeveq vedidetin. Be dirr û mercan û tiştêd dexterlîd pêve. Îna gotê çon dûrve nêrayê ronahiya helbû. Me gotiyê ronahiyê helneke wêhe ronahiya helkirî. Wila tişteke îna dana çon ber pencera wî. Wezîri got: “Çi ye?” Gotê: “Tu jêbigere.” Go paşa rabû çon paşê hat xarê. Gotê: “Bo min binêrine çarekê. Evî pilanekê lêbgêrin, evê dîvêtin bo min bînîn.” Îna gotê: “Tu xwe nexweşke em dê bêynê dermanê vî tiryê biheştê ye dê tiryê biheştê ji kîrê înin dêçît û nahête ve. Heftiyekê an dûyan dê deyne navbeynê paşê hekû nehat dê hêyn jinka wî bo te beyn.” Wila rabû ser xwe paşay xwe nexweşkir jiqesta. Xelk d’ço sera, millet d’ço sera go kuwe ku nîne paşay çiyê wî jî gotê hindî jinka wî got neçe got: “Ez mecburum ez dê çim. Ma em vehewhayêd

wî ne.” Îna rabû ço gotê: “Dermanê paşay çi ye?” Gotê: “Willa dermanê wî tiryê biheştê ye, heke ne înin eve dê telifit em dê mînin bê xwidan.” Vêca wî paşaw ewêd xwe dirustkirbû go: “Babo ma kê serê kanîyê berdaye, dêw kuştîye ew dê înit manê em yêd dî yêd çi nînin.” Îna rabû ser xwe û gotê: “Te bivêt heta sibehî bo min peyda ke tu vehewhayê me yî, tu yê l’ser cihê me. Te nevêt jî hêdî jî mala xwe xeber nede.”

Wila hat ve dilnexweş û posîde. Got: “Kuwe te?” Got: “Hal û qese eve ne. Ez Hesên Lawê Hekkari, Mîrkê Badina bo xwe va teybîran û van ewan l’ser min girêdiden.” Gotê: “Xeman nexwû ew jî dê Xwidê qetînît min gote te neçe, tu boy çoy? Gotê tu her l’ser keyfa xwe be hosta necar, binive wekî her car, Xwidê êk e dergeh hizar.” Îna rabû ser xwe nivist û ew bû belê belê her dilê wî ew e. Hizrêd xwe diket ev mirove ez êkê b’tinê ev mirove bihêned hewara min, xayîntiyekê l’min biket e dê ku kem. Ew jî bo xwe d’herifînît û nijînîtin.

Îna sibê rabû ser xwe sertêşt xwar û îna rabû kilîlk jî da vê go: “Here filan derê şikevtê. Tu dê avêyê navê Xwidê pêxemberan bîna der dêvebît. Dê hizar le’bû sêhr û sine’t û gurg û şet û tiştêd nesîbet l’rîya te tu dibîni hema pê xwe dane ser û here. Qet sexe sole çep û rast berêxwenede. Tu wê çî deştêkê re derkevî wê deştê de heyamekî dêçî go dê berêxwedeyê kanîbirkekê wê deştê du bişeng yêl gel. Here l’wêrê xwe veşêre du kotir dê j’esmana firin hên ser wêrê dê bêhnekê te bînin dê xwe ho kewveden vêca ew kotir nînin perî ne. Gotê dê perkêd xwe werînin çin xwe avêne avê. Gotê tu perkêd êkê b’hilgire b’ke kefa xwe. Go dê ew bêtê ya ebdê Xwidê tu ins î, cins î, çi yî? Ka perkêd min berde da ez biçim ve ez mam nav vê ava tezî. Tu bêjê daxwaza min tiryê biheştê ye. Tiryê biheştê bo min bîne e dê perkêd te dem te. Heku we’de kir ew dê bote înit.” Wila wî jî go: “Bila.” Rabû ser xwe piçek keyfa wî hat.

Wila ço ew mergene bada dergehek vebû berêxwedidetê tarî û tarîsan e, zilmat e, gurg in, şêr in, ejdehar in, çi tiştê d’dinyayê da b’sam yêd riya wî da, behr in, hema pê xwe d’danîte ser û d’çîtin. Wila ço heyamekî ço heçku tunêlek ji bin derket berêxwedayê keraxek dî dinyayê l’wêrê deşte hiştî deşta Geverê duz e hema bihar e, d’kemplana xwe da, giya û çîçek û filan û ew e. Wila ço nivka deştê ew bişeng û kanîbirk dîtin. Wila l’wêrê wî jî xwe l’giyay veşart. Wila ço nivro berêxwedayê du kotir j’esmana hatin xarê. Wila perkêd xwe werandin û çon xwe avêtin nav avê hatin û çon. Ew ço deştê xwe dayê perkêd êkê kirne kefa xwe da ya dî

firî ço. Ewa perkêd wê hilgirtî gotê: “Tu ins î tu cins î tu çi yî bo xatra Xwidê perkêd min perde ez mame nav vê ava tezî te çi mirad heye ez dê bo te hasilkem.” Îna rabû ser xwe gotê: “Mirada min tiryê biheştê ye, îna gotê tu jî bo min we’de ke.” Gotê: “We’de bît.” Îna rabû ser xwe ço perêd wî da vê ço. Nîv sie’et nekêşa wila ûşîyek tirî nikilê xwe ve îna. Gotê: “Ha bigire belê hişyarbe destê te b’nikilê min nekevîtin dê sêhra min betalbîtin.” Wî jî go: “Bila” Wî jî dîlneda destê xwe bavêd tirî hemyê destê xwe avête biska bi nikilê wê ve. Boy destê wî qirp û b’nikilê wê nakevît.

Tajî bû bû perî. Wila gotî: “Hêdî ez neşem çimve. Tu dê min jî l’gel xwe bey. Be e dê ku kem vê çolemê.” Wila rabû ser xwe ew jî da dûw xwe bo xwe înat hat. Tirî timbisek jêvekir go: “Eve bo me dê carca devê xwe pê ter keyn yêdî jî here bêjê heke nesaxbît bixwet dê pêçêbît heke nesaxnebît ji qesta we bêjît gel xwar ew mir. Heke bawer jî neket evî dane nav tepsîyekê deh sevîyêd tiryê baxçeyan bînin ken wêrê alemê nîvekken nîvekê eve bixwen nîvekê jî ew ka dê kî berî xilasbît. Hindî tilyekê jêveket du tilyêd dî çon şûnê.” Îna ew jî ço bo xwe ka j’kiş rêhlî înaye tiryê biheştê dê j’kîve înit. Go min jî gotê: “Hal û qesêd min eve ne. Hûn dê bi vî terzî cerbeken. Heke hûn bawer neken xwar jî paşay derewan biket derhal dê mirît. Yê dî jî bîne tiryî dane nav tepsîyekê deh sevyêd tiryê tarîfi, yê bêsrane, tixmekî bînin b’kene nav milletî jî gaziken ka kîj dê berî xilas bîtin.” Wila welêkir yêdî hema her êkî ûşîyek bir xilaskir yêdî her tilyek jêvekirin welêhat hêdî xwe l’nav wan negirt. Îna got: “Wila tu rast bêy, gotina te dirust e.”

Wila ço salek dî carek dî got tefîşe bajêrî ye bila ke agirî hilneket delala bang heldêran go tefîşe bajêrî ye. Îna ew jî dîrek êk neqil d’çine wêrê. Çin berêxwedidenê hindêdî runahiya wî geşbû ya ew bûy. Nîfkê da yê rûniştiye xarê vêca dev û şefeq veday şefeqa way didete xanîyêd dî jî. Paşa serket ço nêrayê pişt ra got: “Wezîr hey te hal û heday min kiryo ev paşatî, wezîratiya te ya çi ye. Eve Hesên Lawê HEKARÎ gotê eve ye paşa.” Îna gotê: “Çarekê bo min.” Gotê: “Paşa” Gotê: “Ho.” Gotê: “Çarekê e dizanim. (Gotê hiştî filmê Kemal Sunal ewêd bêtê bo zêran be firoşe, niza bibe veşêr e) gotê ez dizanim çarekê.” “Çi çareye?” Gotê: “Tu xwe koreke em dê bêynê derdê koratiyê **biska çil awaz** e. Biska çil awazê ya l’adê heft behra. Dê ku çît?” Îna piştî hîngê gotê paşay derhal xwe kore kir. Xelk çon sera wila sal çend heyv çon wî got e jî dabiçim yêd mihela wî hatin gotin: “Ma tu jî nahêy l’gel

me em biçîn, sera paşay deyn? Paşayê me yê kore bûy, yê kore bûy hitmale bimrît.” Nîherê hindî jinêd wî got neçe gotê: “E dê çim.” Go: “Dê çiy?” Gotê: “Herê.” Wîla rabû çö wêrê, silavkir û dîwan hatbû girtin go: “Ka ew paşayê me ku lê hatiye?” Got: “Wêy kor bûy.” “Derd, derman?” Gotê: “Derd û derman d’bênê biska çil awaz e. Zanyarêd me ya we goti. Biska çil awaz dê têden go dê çavêd wî rohnbin.” Vêca gotê: “Be kî dê înit?” Gotê: “Ma kê bo me çoye wêrê pêrî înaye, tiryê biheştê înaye, dêw kuştiye ew dê înit be yêdî em yêd çî nînîn. Got te divêt xuşkokî, bêzikrolîj here bîne, te nevêt jî hisaba xwe baş bike.” Dê ku ket feqîrî. Ne keseke ne eskere ne millete dê ku ket?

Wîla wî jî l’nav serê xwe da hat ve mal jinêd wî ku bû? Got: “Hal û qese eve ne.” Got: “Xemê neke camê eve çî nîne. Dê qetît ew jî. Me d’gote te neçe te b’xeberê me nekir.” Wîla rabû ser xwe. Nivist sibê rabû gotê: “Ha dê vê kilîlkê b’be pavê filan dergehî veke go tu dê derkevî çî. Gele sêhr û sine’t û nesîbet û ew dêhên rîya te da guhê xwe nedê hema dîrek here. Hekû tu çoy destekê serkeftî dê tîmilekê bînî coyekê l’wêrê. Pîremêrêkê l’ser wê cokê. Heku tu çoy devê xwe bavêje pêlava wî bêjê ez bernadem daxwaza te çî ye? Bêjê daxwaza min biska çil awaz e. Ew bo te bêtin.” Îna wî jî wekir. Heçku min bo hewe gotî wekir.

Çö dergeh vekir û nesîbet û ew hatine pêş çava guhê xwe nedayê hema çö. Çö wîla pîremêrê xwe l’wêrê dît ser cokekê rihêd wî hatî l’erdî. Yê wî deravî d’girît wî vedêxît hiştî keraxa. Wîla çö silavkirê hema devê xwe avête pêlava wî. “Hay babê min te xêre, te şole b’mine, ez rezîl û sewda.” Got: “qetî’yen vêgavê tu dê bo min rêya biska çil awaz bêy.” Kuro go: “Gelek yêd çoyne nehatîne, tu j’riha xwe vêzarî? Tu gencekê temîz û lawî, tu j’hindê b’gere babê min.” Gotê: “Çênabîtin.” Îna rabû ser xwe lixavek davê, pîremêrî j’berîka xwe îna davê gotê: “Tu dêçî heku te dêmî xilas kir tu dê gehîye behrê. Heku tu gehîştiye behrê navê Xwidê pêxemberan bîne vî lixavî bavê behrê go dêçî serê kurî behrekê go dê xwe lê sîyarkey berê wî dey rexêdî. Go hekû çö rexêdî destêd xwe danan dêmî nedanan go dê tu xwe l’ser avêy lixava xwe nehêlî serîve nexwû dê asêbî. Serê kelbîne û here. Wî jî qesra wî tine y’lê. Çî tişt, çî ava y’dî lê nînîn. Vêca yêd dî sêhr û sine’têt wî dê te sojînin an jî tu dê bêy.”

Wîla wî jî rabû eynî lixav jê wergirt û çö hindî dêmî xilaskir gehîşt behrekê wî jî avêt behrê navê Xwidê pêxembera îna go kurîbehrekê serê xwe hilanî ser dana

hema ling tê danan û heku jetê behr şeqbir bir rexêdî. L'wêrê xwe serda avêt û lixava xwe ser kelîna da îna pala xwe ve ço. Ço berêxwedayê revîyêd dewara dîtin. Go: "Eve yêd kênê? Got: "Yêd biska çil awaz." Ço wêvetirê hêwan dîtin yêd kênê yêd biska çil awaz. Ço wêvetirê yêd pezi dîtin yêd kêne yêd biska çil awaz. Yêd dîtir yêd golkan, bêçiyar hemiyar jî got eve yêd wîne. Yêd hêştirean go: "Eve hemî malyata wîne."

Ço qesra wê dît. Ço d'qesrê ve hindî lê d'gerît nabînît. Babo eve dê nîke sêhrekê l'mîn ket eve t'kîrêra ye. Wîla rabû nivînêt ê wergêran û vêca gele tiştêd mal û milkê dinyayê hey. Hemi têkveda nedît. Go ew jî ço d'kunçekê ra xwe veşart heta bû êvar li. Êvarê hint hay jê bû ew û xidama xwe çobû balavê eve jî balavê hatin. Gava jî balavê hatin Îna heta nav xanî ra hatbû nê nivînk û baxçkû hemî l'nav xanî werkirîn, bêserûber kiri. Wîla hat û piçek nav xanî ra hat û kete ser qunêd xwe gotê: "Wîla ez westiyam were binê pêd min perixîne." L'ber van givişkan û hatina mal. Vêca pêd wê perixandin û ew kir hokirê gotê: "

Wîla bêhna mirovekî ya d'hêtin. Eve êkê hatît xaniyê me ve. Ka rabe dabinêrinê." Ew rabû ser xwe kire diring wî da b'dûv ve da b'dûv ve vêca sêhr û sinê'tû, mar û, dûpişk û gurg û hemî hatinê. Ew her revî ço vêca gotê ewa wî ew e heke tîbla wî berê şa vêket dê sêhr û sine'têd wê betalbin heke vênekevt ewêd dî vêragehiştin eve ya wî ço. Wîla ço erdekî hindî we d'bezî deşt hinde xilaskir dûv devê xwe l'erdî d'kevît. D'nêrîtê kulavkekê berira ço wî jî go kuro babo da tîbla xwe dirêşkemê belkî ew bît berê şadê ma çi dizanim berê şadê kîşke. Tîbla xwe ho l'berî da heçkû pîfdiket şadekî hemî pûçbû. Îna ço milê wî gêra gotê dê rabe Xwidê ez kirim qîsmetê te. Gelekî d'hatine mi, gele xweşmêr yêd hati, gele law yêd hati belê pêçênebûye min ê berê j'wan sitandî belê te j'mîn sitand.

Wîla rabû hat. Biska xwe ya çil awaz jî îna hat. Hema b'i hemî ve înat. Îna hat vêca xidamê go: "Be ez dê ku kem tinê go mal bo te bî tu bo xwe malî lêkde. Hat yê xwidanê pezibû go: "Be pez?" Go: "Pez bo hewe." Axir we bi rê ser diçît dewran got: "Tu dê ku key?" Go: "Vî ez bo xwe birim hema mal bo hewe, cih bo hewe." Vêca heyli li wî xwe teştana qesrê diken, zêrê zînet û imbarad peqînin û dir û yeqûta bo xwe d'helînin û wîla ew hat go: "Ma tu dê me ku bey? Benê behr e." Gotê: "Dê delîlek hebît camê tu were." Wîla çon navê Xwidê pêxembera îna lixava xwe avête

behrê kurîbehra wî hat. Lê siwarbû belê gotibûyê heku tu d'zivirî têyve rihêd wî b'tiraşe ewê pîremêrkî. Wila wan jî herdukan xwe avête ser piştê behir şeqkir hate rexê hove xwe l'ser davêt û hatin melayê bin ezingê go: "Xwidê kir qismetê te te îna?" Go: "Herê" Go: "Dê baş e xêrê jê bibîne." Îna rabû ser xwe gûzan helgirti rihêd wî tiraşîn û gotê: "Zehmet bo te" Go: "Nê ewa mine we bo minêd gotî." Rihêd wî, ewêd tiraşîn, karê wî kir û wila helaw hatin.

Hatin berêxwedidenê yê kolanan û xirab diken. Go: "Eve çi ye?" Go: "Wila qewlê wî hinde timam bû nehat vêca kolanan û xirab diken dê paşa b'hivyê biçît jinêd wî malê wî bo xwe bînîtin da cihê faytonan û ereban rê xweş bîtin." Gotê: "Direwkiye." Wila bir mal û du mû j' biska xwe vekir davê. Gotê: "Here bêjê heke korebît, çavêd xwe bidet dê çêbît heke kore nebît gel lê da dê hutim bin. Heke bawer jî neket ho bade dê çil awazêd miqama bo bêtin. Hema tu neşêy kêşî hema ew xwe biska çil awaz e." Wila wî jî bir eynî gotê hat ve.

Sal wextek dî pêve ço. Îna piştî hîngê çove ber pencerê berêxwedidetinê yêd danane nivka xwe da hêdî mihele hemî ber şeveq veddet. Vêca got ewa dî jî destêd xwe biskêd xwe dida te kîşk miqam bivêt ya wan miqama d'bêt. Ewî go: "Xweli b'serê me were, paşatiya hukmê em pê d'beyn." Îna vêca gotê: "Teybîr çi ye?" Teybîr? Gotê: "Herê." Go: "Em dê bêyn milletî bila dar û dep û wan ben b'kene ber kelê. Dê bêynê tu jî were gel me em dê agirî berdeynê her wezîrek ji me dê milekê wî girît dê wî danî pêşîya xwe gava kurya agirî ser dararu wan hat silal pûş û pelaşan ra go dê em dê milêd wî girîn tu jî heku me bire ser kevrî dê pêhnekê l'pišta wî bide dê avêyn nav da. Her êk ji me êk, êk jî bo te." Gotê: "Eve baş e."

Îna rabû ser xwe sal wextekî hiştî filmê Nemrûdî got milletê xwe dara bînin b'kene ber kelê, tîrkên xwe bene wêrê, daquçîkên xwe ben wêrê. Axir we lê kir kevir heta serê kevirî tuji dar û dep kirin. Îna rabû caba wî jî rêkir gotê: "Eyala hinde pûş û pelaşê kirye ber kelê dê agirî berdenê tu jî were gel me." D'zanîtin meselê. Jina wî got: "Îna eve dê te ben tu ewê dizanî hîla wan çi ye." Mûyek ji biska xwe kêşa dana d'berîka wî da go: "Heku agir xweşbû dê te havên hema tu bi xwe xwe bavêje netirse." Îna rabû ser xwe ço wêrê gotê: "Te xêre paşa?" Gotê: "Biçûka hinde dar û gilêş û ewêd kirye ber kelê. Em biçîn agirî berdeynê te jî gele qencîyêd me kiri tu jî l'gel me were. Me we hisêbê heçkû tu jî wezîrekê me. Hem te avê bo me inay, hem

ez ketime ber mirinê te derman bo min îna, hem jî hin bû ez kore bûy te biska çil awaza înay min çavêd xwe day.” Halboçî ténadaye.

Wî jî go neyse rabû l’gel çò wêrê gotê tu mirovekê ji me meqbûltirî kursiyê pêşiyê bî l’vêrê ez dê l’vêrêbim gotê: “Tu paşay” Gotê: “Ma te çî şol pê tu afûw hema tu l’ber sîngê min be, ez gelek te bo xwe meqbul d’bînim.” Îna rabû ser xwe dana ber sîngê xwe û agir berdayê. Berdayê heke sie’tekê gurya agiri hat rast wan wîla paşa livîn kevtê ew livîn kevtê, wezîrî hêştta destê xwe nedaye milêd wî hema wî kir pêkir û xwe l’nîvka agirî da. Toza agirî çò ber esmana. Wîla bêhnekê man d’nêrîtê eve d’binîra derket vêca rutbe û nîşanêt generala, yêd ewan gotê: “Thi ewêhenê sax bû wêhe d’wêra hera derket.” Wezîran gotê b’Xwidê ew erdê xelkê dar jê inay ka darêd milyaketan bûne, yêd mişayîxan yêd çî. Em dê bêynê bo me hindek dî bînin b’ken wêrê hekû bû gera ma em dêçin rutbêt mestir bo xwe înin.

Îna rabû ser xwe wîla carek dî salek dî pê çò. Dar pêtir înan kir wêrê. Got: “Her berê hewe dar j’kîş cihî înane, çî erdî înane j’eynî wêrê bînine ve b’kene wêrê belê pêtirê.” Xelkê jî benê zanîn mesele dar înan kirne wêrê ew jî rabû ser xwe caba wî carek dî rêkir ve belê vê neqlê dana pişt xwe. Ew vêca got kevt pêşiyê. Piştî hîngê rabû ser xwe agirê wan xweşbû, xweşnebû destek da wî wezîrî êk da wî wezîrî çokê xwe jî da paşay birne ser kevrî her sê pişt nişîvkinin dûvser avêtin têda gurya agirî çò ber esmanî. Her man dê derkevîn, her man dê derkevin, hindeka got: “Ew cilêd eve pêrazî bûy ew pêrazî nabin dê rutbên wî dêpêtirbin.” Wîla dûmahîya heyva sêyê çò xwelî jî veda ne rejîya hat dîtin ne çî. E jî hatim ve rihmel deybabêt hewe. Xwidê j’hewe razîbît.

Vebêjer: Kasim Şêro

7. HEYRANÊ EREP

Carekê j'cara rime l'deybabên gularan. Rabbe Alemê hemî însana efûbiket b'rihme xwe inşallah. Carekê go êkî d'gotê Feysel Paşa, paşayê bajarê Qeyseriyê bû. Ew radbîtin ew çend sale yê bêjinke. Babê wî emrê Xwidê kiribû ew jî bibû paşa. Ew jî radbîtin got hevalêd wî filan û bêhvanêd wî go dê were dabiçîn bêhnekê l'dewara sîyarbîn bajêrî da biçîn ka hiç ku çi kesê em nabînîn bo te. Hindî go nexê bila webît go ne dêçîn. Rabûn ewan jî xwe l'dewarên xwe sîyarkirin çon paşa hatine xarê go: "Hema em dê b'pîya çîn." Her du ka milêd xwe dane êk û jorda çon. Got çone erdekî kanyeka avê d'rêda kiçkêd çine ser avê. Go hevalê wî go: "Em dê çîne ser kaniya avê û em dê geleka bînîn."

Got çone wêrê berêxwedidenê sê çar kiçkin. Hindî sê bûn gotê hema ewa berêxwedidayê wila: "Wêhe Feysel Paşa jorda têt em dê berêxwedeyna ka dê ka belkî Xwidê dizanît belkî êk ji me bibîte nesîbê wî." Hindî kiçka dî bû go: "Dê herin be hûn ehmeq in. Werin serê xwe b'çemînin da biçin hûn kiçkin ne berêxwedene zelama." Go ewê serê xwe çemand û çon mesînkê xwe d'avê hiland û amanê xwe bir û çon. Çon ewan jî got b'Xwidê em dê dûv wahe da çîn. Dûvra çon gotê: "Kiçik sekine." Kiçik jî sekînî piştî xwe dayê. Go: "Hewe xêrbîtin?" Gotê: "Tu çi kesî,te şûkirye, neşûkirye, xwastîyêd te hene nînin?" Go: "Nînin," go: "Ne." Go: "Tu kiça kê yî?" Go: "Kiça govanî me." Go: "Babê te çi şoldiket?" Go: "D'çîte ber hêwana." Go: "Dê baş e." Go: "Wila be heke Xwidê hezketin go em dê hêyn te j'babê te xwazîn." Go kiçkê gotê: "Nexê ez ne ya qesra me, ne hejî paşay me, kurê paşay me." Go kiçik çon mal.

Babê wê hat go caba babê wê virêkir, gotê: "Bila govan bihêt." Govan bista, go: "Willahî min emelekê, qusurîyeka kirî ew dê paşa rihêd sitêhê min bistînîtin. Vêca ez dê ku kem." Wila çon wêrê gotê paşay gotê: "Govan tu yî?" Go: "Herê." Gotê: "Te kiçkeka hey, ka kiçka te xwastîyêd wê heye an ne." Go: "Nexê." Go: Be em telepdarêd kiçka teyne, em dê xizmanîyê keyn û kiçka xwe tu dê deye min." Go ewî go: "Paşa estexfîrullah" destê xwe da singê xwe, xwe paşveda. "Were rûne xarê tu dê bîye xezîrê min." Go: "Estexfîrullah em feqîr in, min biznek ya hey ya b'saxekî ye. Ê çi tiştê ser darê dinayê nîne min ev tiştê hey. Ne min male, ne min hale, ne min çi ye. Dê xelk hetka min bet." Go: "Ne ma te şole jê ye, min kiça te

divêt.” Go ew jî ço kiça wî xwast û go sipêdê xelkê gotê: “Bila govan bihêtin, boçî nehate nî hêwana.” Go paşay go: “Bikeve ser pişta xwe go çavêd xwe biniqîne û devê xwe veke hindî malê dinyayê dêvêtera têtin bêje dêdeme te.” Ewi jî go: “Tu û kerema xwe.” Rabû sipêdê xelkê û alem go: “Dê bila b’hête tana hêwana mane l’vara.” Go: “B’Xwidê rojekê jî naçime ber hêwana. Go madem go ez bûme xezîrê wî ma çî mecbûrum biçime ber hêwana.” Dê ew jî radbin kiça wî diben hatin daweta xwe kir heft şeva heft roja.

Navê wê Cemal bû kire Nazikcemal. Bir xelkê û alem, dinay alem hemî hatine seredana wîw, pirobahiya wîw jinka wî pîrozdikir. Go cab çö Heyranê ereb go gotê: “Wila Feysel paşay, paşayê Qeyserîyê jinkeka bo xwe îrandî hema Xwide d’zanît ka ya ku ye.” Go ew jî rabû l’hespê xwe sîyarbû hat. Hate wêrê hespê xwe l’hewşê girêda û çö. Go: “Pîroz û mimbarekî bîtin,” filan û bêhvan û niza ka çete şevêkê ma l’wêrê an ne? Go ewî jî gotê, derdkevîtin d’nêrinîte hespekê pîrpirîye, weyê jêhatîye mirov dilnadet nêrinîte. Gote xulama: “Herin biben def mahîna paşay.” Ew jî çö bire def mahîna paşay. Ew radbin hespê wî ina l’wêrê girêda, wî jî xatira xwe ji Feysel Paşay xwast û çö ser û sitêhêd êk û du û hatin. Jinka wî xwe nîşa neda.

Go hatin hatin derê hewşê berêxweddetinê ku hespê wî hindê terêf bûy, hindê pîs bûy her Xwidê tu dizanî. Guhêd wî yêd şorbûyn wekî kera ye lê hatî. Haşayî hizura hewe û melaîketên hazir. Go ew jî hema derket û careka dî gote Feysel Paşa go: “Ne ez bim ne seredana min ne tu bî ne paşatiye te.” Go vêca ew b’şerçon êk b’serê êk û du îna go: “Îlla tu xwîna hespê min bînî heke dê te kujim.” Go ew rabû cab xidama bir bo Nazikcemalê go: “Were willa Heyranê Erep û Feysel Paşa yên b’şer çöyn. Dê nihe êk û dû kujin.” Ew jî rabû hema jorda hat gotê go: “Bide b’xatira min Feysel Paşay ez hurmet im bide b’xatira min.” Go: “Dê baş e dê deme b’xatira te.” Go xatira xwe j’Feysel Paşay xwast û jî ho b’nik ve çö destê xwe da destê jînkê hejand û jînkê hilgirt û danade ser pişta hespê û yellah. Wî jî got: “Heyranê Erep, te bo çî bir ew nazika min bir, te mala min xirabkir, te bo çî Nazikcemala min bir, te jinka min bir.”

Go bir û çö ew jî rabûn gund ve millet ve hemî d’dûvda d’diçin. Hespê wî tovê baye, hespê behrîye kes çî erda veranegehiştin. Go: “B’zivirin babê min zivirin. Hindî hespê Heyranê Ereb’e ew tovê ba ye û hespê behrî ye yêd wan tovê kera ne

neşênê biçin.” Zivirîn go mane l’wêrê heta sala dî. Go mahîna wî jî sala paştirê firkbû canî mahînek ya l’ber mahîna wî bû. Çavê xwe lê kir şitî biçûkekî xwidandikir. Ew da l’serê wê girît û her dera gêrînîtin. Go rabû çend cihê tirkî hemî dane ser pêxwe. Go çi jê nezanî. Hêj lê nediyarbû jî.

Heta sala sê ço Musilê ço wêrê ber dikanekê ra ço berêxwedidetê nalbendê dewara naldket. Go gotê: “Nalbent ez xulam tu nalekê l’dest û pêd canîka min jî bide gele l’ber dilê min ya şirîn e.” Go: “Bila dê nalkem.” Bir go her destêd wê rakirin, pêd wê rakirin û ev nale ne wahe, eve ne wahe çi nal neketine pêd wê. Go: “Nalbent ez xulam ez ê b’lezim tu bo çi hinde gîrodikey?” Go: “Nê ez nizanim dê ku bêjime te. Nalêd canî mahîna te l’vê dinyayê nînin, gotê her nînin.” Go: “Bo çi nînin?” Go: “Ew ne tovê ewîdiya ne, mahîna te tovê hespê Heyranê Erebb e.” Go: “Ew çawa?” Go: “Belê wila.” Go: “Be yê l’kîve ye ez xulam?” Dest avêtê heft zêrêd zer kirne d’destê wî da. Go: “Bo xatira Xwidê bo min bêje ewî gelek qencîyeka mezin ya l’min kirî eve hinde sale eve sê kite sale ez ê lê digirim û ez nabînim.” Go: “Çi yê te ye?” Go: “Birayê min e.” Go: “Dê baş e.” Go: “Çend sala ez biçim dê çim gehimê?” Ew jî radbîtin çîtin go: “Dê çend sala gehimê?” Go: “Ne b’sala ye.” Go: “Dê b’çend heyva gehimê?” Go: “Ne b’heyva ye jî.” Go: “Be bi çi ye?” Gotê: “Tu d’bînî wê rêka henê ya we tarî û tarîsan, ya mij û moran aha tu dê l’wê rêkê çî. Vêca ya te hatî bo te. Mala wî jî ya l’adê heft behra. Ka tu dê gehîyê ka dê hêye kuştine ka dê ku l’te hêt.” Ewî gotê: “Hema dêçim b’izniha Xwidê.”

Rabbe Alemê we hezkir ku ew heywan kete rêy xwe ço pêş behra wî pêş mala wî ket. Got pêşket ço bo serkaniyê avekê hesp jî l’wêrê sekinî. Ho d’kete he berêxweddetê jinkeka d’hête ser wê avê hema Xwidê d’zanît ka çend ya cane. Go wî jî gotê: “Xatûnê xatûnê bejna te bilind e wekî zeytûne. Ez kurkekê bajêrîme, zihmet û te’da û îza min nedîtîye ez gelekê têhnîme taseka ava sar bide min bila b’xêra deyyabêd te bîtin.” Ewê jî amanê xwe d’avê hiland û da destê kurkî ewî zelamî jî çavêd wî b’çavêd wî ket. Go: “Hey mala babê te wêranbît! Eve tu Feysel Paşa yî eve tu j’kirê têy?” Go: “Xatûnê ez ê dûv tera hatîm. Were dê te bem û çim.” Go: “Nexê ez nahêm.” Go: “Bo çî tu nahêy?” Go: “,Vê jîna ne hazir du biçûkêd hey. B’Xwidê ez nahêm dê alem dê hetka min betin dê bên Heyranê Erebb tu ya birî tu ya hatîye ve

ez nahêm. Belê wî xwîşkeka hey. Ez kêr mizgînîya tileka wê nahêm e dê çim virêkeme vêrê hinde avê bo xwe bibe û here hema bê bela û miqader.” Go: “Bila.”

Ew çö navderê l’wêdirke xwe êxist. Pêwê şikest. L’wa dereçka ket pêwê şikest. Go goskê wê jî b’erdî ketin ew jî şikestin av jî rişt. Ewe ku bû ew da ewêdiyêd hespê xwe qilifketa qeydê wî û hilgirîna û kilîlk jî hemî wexta d’dane xatûnê. Go ew rabû gote xwîşka wî: Hilû Sitî tu here avê bîne bo birayê xwe b’Xwidê ew rabî û ava şîrîn nebîtin go ew dê me kujît. Hema rabe here avê bo bîne. Ez ketim pê min şikest ava min jî rişt.” Ew jî radbît çîte ser wê avê d’nêrîte zelamkê l’wêrê xwe pîçe veşartî. Hema zelum jî destê xwe l’destê wê didet û d’avête ser pişt hespî û yella. Go wey gotê: “Mala te killêso wila Xwidê dizanîtin tu ewî yê xwidanê vê jinkê.” Go: “Belê.” Go: “Bedê here te ev jina ne hazir l’te pîrozbît.” Go wî jî got: “Min ne pîrozbît. Min hîngê pîrozbît heta serê Heyranê Erebb jî jêvedkem û pişt xwe danim û te b’serê birayê te ve d’beme Qeyseriyê.” Go: “Dê hema here j’hindê vebe.” Go: “Ne qet ma ez d’zivirim.” Ew jî çö nav erdekî çîmekî rûnişte xarê. Go bû sîrêna şîrêwî û niza çi tiştêd wî. Axirkî rabû.

Ew rabû hat, b’hukmê tengî go ka kilîlêd wî bideve go zû nedayê. Go: “Hema qet dilê xwe xweşneke b’Xwidê gotê dê ew heft roja biçît e bêhnekê biçim dêvêragerhim. Hema zûka bideve ne serê min biêşîne ne yê xwe.” Go wê jinkê jî du biçûkêd heyn. Go rabû dûv ket û yellah. Dûv ket û çö dest avête şerî û filan, bêhvan, hêve hove vêca ka çi wextê heyî go serê Heyranê Erebb jêvekir, kuşt. Go kuşt û go: “Dê were hemca te ewîdîkir go jinkê go em jî mirada xwe hasil keyn.” Go: “Ne ez nahêm.” Go: “Bo çî tu nahêy?” Go: “Dê çim Nazikcemala xwe jî înim paşê dê hêm.” Go: “Nê du biçûkêd heyn.” Go: “Dê biçûkêd wî jî bem.” Hindî go: “Were filan e bêhvan e.” Go: “Ne e nahêm.” Ewî jî cehitkire mala wê. Jinik çö ser banê qesrê go: “Nehê nebe qatîlê sê riha. Hema here te pîrozbît te kivanê xwe kir.” Go: “Ne b’serê te keme hîngê j’vê axêd çim heta te jî gel xwe d’bem.” Jinkê jî destê xwe her du biçûkêd xwe kir go vir û xwe l’nîveka behrê da. Xwe avête behrê ew jî çö jinka xwe l’gel serê wî bire bajêrê Qeyseriyê bo xwe yarî pêd kirin serkê wî mêrkî. Min jî qesek hêla rihme l’deybabên guhdaran.

Vebêjer: Rukiye Duran

8. KEÇELOK

Carê heft cara rehmel day û babê gûhdara. Gotin zilamakê heft kûr hebûn û nav van heft kûran da yêk jî keçelok bû. Bû her şeş kûra jin înan bû lê bû keçelok jin ne îna got ev bêxê ye dîn e ez çî jinê bînim. Gotin wi zelami reza ti hebû wêca diz hûye bûna nav reza wi he şev çûne dizîya. Kûrên xwe her rojê du rêtkin ber reza nobeta reza. Hindî nobet rezê gêtin dîsa diz tatê neşêyan dizîyan bigirin.

Gotin rojekê keçelok gote babê xwe: “Babo ca wê şevê ez biçim ber rezi.” Babê wi gote keçelok: “Kûri keçeloko min şeş zilamên xwe rêkin tiştek nekin tê bikey, ti çî zani.” Keçelok gote babê xwe: “Dê babo ma dê çî lê êt ez wê şevê biçim ma ez ê lêye çikem.” Babê wê got: “Dê tijî here keçeloko ka dê ti çikey. Îşve ti here ber rez. Ka diz çanê tene rezi.” Keçelok jî radbît çîte ber razi. Xwe ser dayê güzê vetşîtîn. Got kû beyêxwedetê du diz hatin tek çû her du diz kuştin. Xwe ser dayê güzê tavejîte ser serê wan mirin. Keçelok sibê têt mal babê wê bêjît. “Keçeloko ka te ku ki.” Keçelok ser hemda xwe bêjît: “Wile min çî nekiriye. Herin bixwe bexedenê hinê zanin.” Babê bêjît: “Ma min negotibu te keçeloko, zilamên min çinekiririne tê çî bikey keçelokê jar.” Keçelok dîsa ser hemda xwe bêjît: “Ka herin beyêxwe denê ka min kûlê kîye.” Keçelok û birayên xwe çin bexedene rezi. Bêjin bexetkenê dû diz lêy kuştî. Gotin: “He keçeloko te deya me ki, te hetka me bi. Dê ka emê dê kû bèn babê xwe.” Gotin hatine mal babê wan got: “Heve bexdayê ka kilê hatiye.” “Wille dû zilam hatine kuştin, Keçelok deya me kiriye” Babê wan dilek keyfxweş got: “Hey ez xilamê te bûy. Ma min ne got we mêrê min eve ye. Ez xilamê te êdî ti kurê min î,êdin kurên min nînin”

Bêjin kebê her şeş birayan vedibin. Ev jî radibin plana xwe ken. Bêjin emê sibê rabin biçin bo me dara pişta Çîyayê Simbi. Emê çine lê wêderê “Zil Zemînet” heye. Emê êkû êk çine tê da ka çî tê da heye. Emê birayê keçelok jî danêne tê da dema çîte tê da emê verîsti kêşin bila bimîne tê da em ancaq wesa Keçelok xilas bibin. Hemiyar gotê bila. Ew jî sibehê radbin çin bêjine babê xwe: “Emê çine pişta Çîyayê Simbi daran.” Babê wan bêjît: “Dê herin bo me daran.” Bêjin Keçelok jî gel xwe ben pêkve çine daran piştîyên xwe tiji ken ten ser Zîlzenînê restin. Êk bêjît: “Ka veyîstekê bînin em çine tê da ka çî tê da heye. Me çîcara nedîtiye em neçûne tê da. Emê sirayla biçine tê da” Plana xwe çêkîne bêjine Keçelok tê dimahîka çî tê da emê

tê jî kêşin jêlêl. Wexa sirayle çî ne tida êkû du kêşin jêlêl. Her şeş xilas dibin yê heftê Keçelok e. Veyîsti navtenga Keçelok girêden rêtkene bîne Zîlzenînê. Keçelok çîte bini paşê bêjît: “Min pilkêşin min pilkêşin min pilkêşin , bes e min dît nava wê.” Keçelok bexedetê çî deng nayê kes wi jêlêl nakeşît. Birayên Keçelok, Keçelok wesa hêlayîne çûne. Bêjin Keçelok çîte dinyayek dî.

Wêca birayên Keçelok çine mal babê wan pirsît: “Benê hûn ka birayê heve Keçelok?” Ewan jî desten bêjin: “Wille lalê me bû paşê nişkê da beze bû ne hindî lêgerî me nedît. Wê ve lê ve lêgerî lê me çî tewza nedît.” Keçelok çîte dinyayek dî. Heşkû qatey dî çîte bin dinyayey dî. Çît çît bexedetê mehlek tê te pêşiyê bexedetê jinkek haşa hiziyê pê destnivêja zilaman hevî pê ket. Çîte lalê jinkê bêjîtê: “Ti bo çî wê ginehê key pê destnivêja zilama hevî key ma guneh nîne.” Jinik jî bêjît: “Be pê çî bikem. Wille birayê ezîz ez çî tê veşeyim me kanîyek heye ya gund. Lê “Heftîyay” seye wêca em rojê mirovekê deyne xwot heta bo me rojê carekê pişkey awê beddet. Em hindî têne me çî care peyda nekir. Wêca em mecbûr mînin çî biken.” Keçelok bêjît: “Mezine wê gundê heve kî ye?” “Paşa yê me heye mezinê gundi eve.” “Ka min bibe nik paşa.” Ew çît nik paşa. Çîte xizra paşa paşa bêjîtê: “Ka weye ti çî kesî?” Keçelok ser hemda xwe bêjît: “Wille hal û meselê min û birayên min eve ne em lêketin evan jî ez hawêtim zîlzemînê da ketime bin dinyayê. Ez jî hatim wê gundi. Belê min tiştê heve dît pêş çawê xwe. Min jinkek dît pê destnivêja zilama hevî kir.”

Paşa bi xemgînê bêjît: “Ê me kanî heye lê ser kanîya me Heftîyay seye.. Em hero mirovek denê heta bo me piçekê avê beddet. Wêca kî wê Heftîyay bikujît ezê kiça xwe demê lê min got hêj çî çare nabîne.” Keçelok bêjît: “Ka hûn şîrekê dene min.” Keçelok şîr dete destê xwe çîte ser kanîyê. Beyê xwe detê heftser rabû. Heft ser pêve bûn. Keçelok çîte nêzî heftser,heftser jî keçelok bînît bêjîtê: “Kanê mirov te bo min mirov neyna. Da ez bo heve avê bedem.” Keçelok jî bêjît: “Mirovê çî.” Heftser aciz bît bêjît: “Ma ti nizani heta ez rojekê mirovekê nexwem ez avê nabadem.” Keçelok şîrê xwe derxît bêjît: “Dê reste ezê dersek baş deme te.” Heftser serê xwe tînît Keçelok şîrekê serê wê det jêtket. Heftser bêjîtê Keçelok: “Ma ti nizani ez heftser im. Heta ti seyek min jêtket ezê seyek di derxim.” Dema heftser serê xwe yê dî derxît Keçelok şîrekê lêddet wi seyî jî jêtket. Wextê heta heft seyên wi qetkin. Heftser mîyît tiji gund av bît êca av bîte xwîn .

Kiça padişah jî destê xwe nav avê det paşê destê xwe yê xwîn pişta Keçelok det. Keyfa hemîya hat paşê her êkê got min av berdaye. Ev wê got min kanî bedaye yê dî got min kanî bedaye şerek derket. Kiça paşa rabû got: “Ka ravestin eyê ku kanî bedayî min destê xwe yê xwîn pişta wi daye yanî pença destê min pişta wi ye. Ka lénir pişat kî we heye kanî bedayî ev e.” Bêjin dema beyê xwe denê pişta Keçelok da ye. Padişah jî gazî Keçelok ket bêjîtê: “Ka eve te ava me beda ezê kiça xwe deme te. Ti weye bibe mezinê wê gundi.” Keçelok bêjît: “Ne wille min ev newêt. Min ev tişt wêtin min ser heft tebeqên dinyayê bêxe em biçeme mala xwe.”

Axir bo Keçelok dia kirin. Paşê tiştê çêkin wekî melemê baş têvedan çawên Keçelok hesûn gotinê heta ti heft tebeqên dinyayê derbas nebi çawên xwe neveke. Paşa jî kiça xwe dayê gotê: “Dê herin rêya we vekirî be.” Axir hatine mal Keçelok çû dev babê xwe babê wi got: “Keçeloko ev e ti yî ti kîyê derketi. Ka bo min bêje çi çêbûye çi ne çêbûye.” Keçelok jî bêjît: “Hal û meselê min eve ne. Birayên min ez têkime zîrzmînê min vesa hêla çûn. Ez jî çûme gunde kê min kiçek bixwe îna hatim.” Babê Keçelok gotê: “Wille kurê min ti yî êdin kurên min nînin. Xweş mêrên mala me jî ti yî.” Hizar rehmêl day û babên heve

Vebêjer: Abdullah Sever

9. XWÎŞKA HEFT BIRA

Go kiçkek bû heft birayêk wê jî hebûn. Jinbabekek hebû jinbaba wê jî kiçkek hebû. Hindîke ew kiçka xwîşka heft bira gelek û gelek ya can bû. Ya dîtirê go ya çivêl bû hiştî heledîna bû. Go ew jî radbin ewa derdiêxin. Çav pênarabûn ew derêxistin. Çon erdekî bo xwe xanyek çêkir çone têve. Her carekê ka da çina şolî ka dî çone rav û nêçîra kîved çon birayêd wê. Birakê biçûk d'mal def û yêd dî d'çon.

Ew jî rojekê d'nêrîtinê ku agirê wê kiçkê nemaye. Ho berêxweddetinê j'dûrve dukêleka j'erdî d'çît û go ew jî çö go: "Wila ez dê çime wêra henê wî agirî qesta wê mala he kem bo xwe hinde agirî înim." Go d'çîtin hêdîka derî vedketin d'nêrîtê pîrhevîyeka d'wêrê ve ya nivistîye d'xewe. Hay ji emrê dinyayê nîne. Ew jî radbîtin du sê peleka bo xwe d'kete ser devê hestûka xwe hêdîka derî d'girîtin. Hekû j'mal hat go gulolka wê ya armûşê ya d'berûka wê da bû.

D'çîtin ew gulolk hildbîtin û herdiçît heta çoye mala xwe. Çö agirê xwe hilkir û zadê birakêd xwe çêkir. Go ewa dî radbît, ew pîrhevî radbît bêhna mirovad d'çîtê. Ho d'hêt û ho d'çît û bêhna mirovê bîyanî ye. Go l'wara d'gerhîtin l'ber serî berêxwedidetinê aşareta serê tavê yê maye l'ber derî û gulolika xilas bûy.

Go ew jî rabû hema ew gulolik hilkir û her hat û her hat û her hat û heta hatiye mala kiçkê. Hekû hatiye mala kiçkê go: "Derî veke dê hêmê d'wêrêve." Kiçik tîrsa go ew dêhêt min û birakê min herduka xwet. Go derê xwe asêkir hindî go veke go: "Ne wila ez navekim." Ew rabû go: "Bedê tilya xwe bîne derî." Tilîka xwe ya qilîçkê go d'kunîka derî ra bir. Go tilya wê mêt mêt, mêt, mêt heta bêhna xwe pê îmandî, bêhna wê hatî wê pîramirovxwer. Go careka dî çove. Got ew pîr hurbibû her bêhnekê da hêta tîla wê kiçkê mêtîta ber tîrka derî ra tilîka wê ya qilîçê mêtît û daçîta.

Go vêca kiçik we rezîlbû we lê hat go birayêd wê got: "Eve te ku ye bira benê çi j'te nemaye, te xêre?" Go: "Ma e çi l'Xwidê veşêrim û çi l'we hal û qesêd min eve ne." Gotê: "rojekê ez a çome bo xwe agirî filan erdî." Go: "Heynene?" Go: "Benê ew mala pîrhevîyê ye, ke ne wêrît çîte wêrê." Go: "Wila e çom." Gotê: "Dê baş e." Gotê: "Be dê heke ivroke hat go hema derî lê veke bila bihête jorve, em jî dê xwe dirustkeyn bila bihêtine jorve em tena lêkeyn." Ewê jî got: "Bila." Ewê jî tenûra xwe

xweşkir û pîrhevî hat gotê: “Tilya xwe bîne derî” hema der lê vekir hema got were. Hemca ez hera d’destê te da çoym. Hat go birayêd wê her şeş lê hatinê. Ewî zerbek û ewî tîrek û axirkû heta pîra xwe bêhêzkirî, wergêrat tenûrê da. Wergêrat tenûrê da ber jî kêşa ser. Birayêd wê jî gotê: “Bira Fatma rabî vê xwelîyê taze çî yê nehêliye l’vara hemê bike torbekî, ke tişteki bibe bike zêy bike avê da av bibet.”

Go ew jî radbît kete tişteki hindek b’rêve dirişt. Hindek dirişt. Heta ji wê te têt nêrîtê hemê d’bûne silk û pîvaz û kulund û tiştê we. Go ew jî rabû bermilekî înanî û hat bo birakêd xwe d’kete şîv. Ew jî qet tam nakete şîvê. Dest avêtê xwar go zad danade ber birakêd xwe destavêtê ewan xwar go hema kewçik kire d’devê xwe da go hema kir bee çî wêra henê, bûne pez. Go: “Eve çiyê?” Go vêca kiçik rabû ka vêca çend qeder ew rabû vêca birakêd xwe d’birin da beta erdê xweş û çerînîna, l’ber sekinîta lêlat û lêlaka bo bêjîta da keta girî heta êvarê tînadeve.

Go nabeynekê berêxwedidetê sîwarekê j’wê te têtin hindê jêhatîye her Xwidê yo tu dizanî. Go ew siwar têtine wê rastê nêrîtê kiçeka hind delal ya l’ber wî birê pezka wed jêhatîne b’wa pezka ve çî Xwidê wo tu dizanî. Go ewî jî gotê, heta wêrê go: “Tu çî kesî?” Gotê kiçkê kire girî. Go: “Tu çî kesî? Bo min bêje tu l’vê deşta bê xweyî xwidan digerî, tu l’vara d’gerî l’gel va pezka.” Go: “Birînêd min kûr û dûrin û birînêd min gelet kul in. Birînêd min neherêfe.” Go: “Ka bo min bêje, qet netirse, bo min bêje.” Go: “Willahî ma ez çî j’Xwidê û çî l’te veşêrim. Hal û qesê min eve ne.” Gotê: “Hal û qese eve ne ez a çome filan erdî agir minê înay, pîrhevî hinde b’serê min înay birayêd min yêd hatîn ew pîrhevîya kuştî. Min xwelîya wê ya birî rêhtî çî tişt l’wara nebû. Go ez j’wê ve hatîm hemî silk û pîvaz û kulund û tişt in. Eza hatîm min hindekêd înadîn bo me kirne zad. Go min jî tamnekirê.” Go: “Te tamnekirê?” Gotê: “Ne.” Gotê: “Ku tu zadî çêdikey tu tamnakeyê?” Go: “Wila hema xasyata mina wesa ye.” Go: “Xwidêkir te tamnekiryê heke tu da b’bira ve berzebiya çiya, kî dizanî ka hûn kî ve çone.

Go ew sêhr e. Ew xwelîya wê gotê ya bûye kulund û tişt û pîvaz û silk te yê kirye zad. Sêhr ya l’birayêd te hatiye kirin. Go belê here ber ava henê, go heft şivkêd hinarê bo min bîne kata hinara êk salî.” Wê jî got: “Bila.” Înandine wêrê go: “Tu jî here ber heft mila bikeve. Ber heft mila bikeve û rohndika girî jî j’çavêd te nehêtin paşê heta wextekî were.” Jinik jî rabû çî şivik bo înadîn û dane destê wî camêrî û ew

ço. Ço go ber heft mila ket. Got vêca ew jî lê rawesta şip û şip û hindîku mayne b'şivkê ve ewî lêdan. Heta heft şivkê xwe xilaskirîn yê heftê ma. Go ew jî sê çar şivkek l'wî berxkî da yê biçûk dan go rexek bû mirov yêdî nebû mirov. Go kiçkê hindî dilê wê sot kire girî. Go: "Yêd dî dê xwe l'ber girin ber şivka belê birakê biçûk dê ku lêhêt?"

Go piştî hîngê Xwidê we hezkir careka dî jinik, kiçik hateve wêrê û ew jî çone ser û sitêd xwîşka xwe filan û bêhvan. Gotê: "Ya zelum ka te çidvêtin ser darê dinyayê em qencîya te neşeynê l'ser xwe rakeyn." Kiçkê gotê. Go kurka jî gotê: "Willahî heke b'te razîbibît birake em dê te deynê." Go: "Keyfa hewe ye." Ewan jî xwîşka xwe l'wêrê dayê. Ew jî kurê paşayekî bû. Xwîşka xwe dayê go: "Belê ez terka birayê xwe yê biçûk nakem hûn neşên xwidanken. Ew dê l'gel min bitin." Go: "Bila." Birakê xwe yê biçûk l'gel xwe îrand û hatine mala paşay.

Mane wesankî heta rabbê alemê we hezkirî heta sala paştirê Xwidê kurkek da wê jinkê, ewa xwidana biray. Go ew jî radbîtin nav gerha filan û bêhvan û ewadîtirê zanî ku hind caneka jêhatî ya bo xwe îrandî wî kurê paşay. Go ewê go: "Nedûre ewêdîtîyame nebîtin, jin bira me." Go: "dê çîne sera" go te kiça xwe. Ew radbin d'çine wêrê. D'çine wêrê go xwe b'wa înaderî go ez xesya te me eve jî gotê: "Kiça mine." Go: "heynene?" Go: "Belê. Dê heyamekî ma l'wêrê negote kiçkê. Ne wa gotê ne paşay. Go ew jî radbîtin d'bêjîtê: "Em dê rabîn mala hewe ya mala paşaye mala paqij û bijûne em dêbeyna ser avê em dê balava hewe hemîya keyn û dê paşê hêyneve." Go: "Dê bila."

Kurik hêlat lehnkê ra û vêca niza ka kiça xwe ya dî l'kîrê veşartibû û kiça xwe jî bir û ew jî ço. Go ewa cara ewilî kiçik danade ser ava serî go: "Dê te şom tu here tana mala xwe." Gote wê kiçka xwidana eyalî. Ew jî radbîtin hema j'hêreve şeyekî l'nîveka serê wê d'det û pêhnêkê lêdidet û bîreka l'wêrê avêted wêrê da. Avêted binê bîrê da û rabû ço. Ka balave xwe kir nekir kusankî çêdbîtin nizamim çone mala paşay. Dê vêca "eve kurê te ye haşay kurê paşaye êd hatîn" gote paşay. Cilkêd wê jinkê d'kete ber kiça xwe. Ew kurik, ew birakê wê yê biçûk hema her êd hêt û d'çît, her êd barît, her êd hêt û d'çît. Ya rabbi vî bexxî çî car ho nekiryê he. Hinde nebarîye eve wî xêre. Go nabeynekê paşa yê l'male yê rûniştîye û palê wî yê l'balgiha go teyrkekêd hêt, çûçkek hera a xwe l'pencerê d'det. Herê d'ket

tîrûrîrî
paşa l'male,
palê l'pale,
belê ka lehndika sava l'çi hale

“Eve çi ye, eve çi avaze d'xwînîtin?” Go wê gotê pîrê ewa dê bîte xesya wî gotê: “Ehh ca heywan e.” Axirkî ka çi halê heyî çûçka xwe bela xwe j'wa vekir. Ka kuşt, ka girt ka ku lêkir. Kurik herê d'girît û du sê şev û rojane kurkî şîr nexwarîye. Her ê d'çîte ser darê lehndikê: “Tu bo çi şîrî nadeyê tu bo na tenakey û?” Çi şikla axiftinêd xwe yêd hêlay serê xwe naraket. Mêrik lê şûphelî bû. Belê ew sêhr nedizanî. Go kurik herêd çîte ser derê bîrê l'gel xwîşka xwe d'axivît. Be b'ezmanê xwe bît barbara wî, filana wî, bêhvana wî. Ew jîk yad bîrê da caba wî didet.

Dê hêve hove jinik pêhesa ku ew berxkê wediket. Jinkê xwe nesaxkir, da wê go nesaxke bêjê dê becxê sor bo min serjêkey. Ewê ji go: “Wila dê becxê sor bo min serjêkey heke e dê mir im û çi çêbûna min nîne.” Go: “Hey mala te ye, dê ku serjêkem, nê birakê te ye ma dê ku berxka te serjêkem te gele ew berx divêtin.” Go: “Ne, ne îlla tu dê serjêkey.” Ew jî rabû gote wan ewêd pezî serjêdiken go bînin kêrêd xwe bihesûn dê becxê serjêkeyn. Benê ya d'bêt îlla tu dê serjêkey. Ew jî radbîtin berx dikete vir û vir û vir diçîte ser derê bîrê. hindek dûvre çon. Herêd dikete gazî:

Dêdê dêdevanê yê kêrê d'hesûn l'gel gûzanê

Dê serjêken serê kehrk û berxanê

Ew jî ya dibêt:

Ma ez ku bikem, dîda jar e ya l'binê ava sar e.

Hesen û Huseyn serbar e.

Go ya rabbi dê kulêkeyn. Diçîne wêrê berêxwediidenê ku insanekêd binê vê avê da. Înande derî paşa b'xwe jî çon nerînitê ku jinka wî ye. Hêja şe yê di nava serê wê ra çikilî ye. Şe ji serê wê înande derî, qapîtê xwe l'ber ewîdîkir û hat. Hatin go: “Eve bo çi hewe ho kir?” Ma da ku lêken revîn çon her du kuştin û jinka xwe jî danande def xwe becxê wê jî ma l'wêrê min jî qesek hêla rihme l'deybabêd hewe.

Vebêjer: Rukiye Duran

10. MÎRZA MIHEMED

Paşayekî çobû go d'nêrîtinê sê kiçêd feqîrekî yê l'ber berojkekî yê bo xwe ewîdiya d'ken. Go êk a d'bêjîtinê: "Xwezî ji xêra Xwidê ra kurê paşay ez bo xwe biribama ez da bo şîlanê bema kolanê ji dintkekê." Go ya dî jî gotê: "Xwezî j'xêra ra Xwidê ra kurê paşay ez bo xwe biribama e da bo mehfûrekê çêka j'biskekê." Go ya dî ya d'bêjîtin go: "Be xwîşka min be heke Xwidê hezkir l'gel heskirna Xwidê, Xwidê we hezkirba kurê paşay ya biçûk ya d'bêt ez bo xwe biribama Rabbê alemê da du biçûka deta vê jinkê da kurkî zêr jêvebina, kiçkê zîv." Go ew mane wesankî go radbîtin wa jinka bo xwe d'bet. Ka hevalêd êk bûn, ka xwîşkêd êk bûn, ka çi yêd êk bûn. Be ewa bêbextî lê kirî xwîşka wê bû.

Go d'betin bo xwe heta sala paştirê xwe lê girt gote ya mezin go: "Benê te gotibû e dê şîlanê bo kurê paşay beme kolanê j'dintkekê." Go:"Hî e camêro ew qesêd binve berojkabûn." Gote ya dî: "Benê te jî gotibû e dê bo mehfûrekê çêka j'biskekê." Go: "Wê jî gotê ew qesêd binve berojkabûn." Go ya sêy gotê: "Dê hema raweste l'hivya Xwidê be heta ku Rabbê alemê we hezkir me biçûk hebin Xwidê heke hezkirbît, Xwidê heke kirbîte nesîp îşallah dê çêbît."

Xwîşka wan Xwidê we hezkir du biçûka d'detinê. Ew jî heb lez û bez d'ben serê wan biçûka d'şon kiçkê zîv jêvedbin, kurkî zêr. Go ew jî rabûn ev biçûke birin kirned pêçolka da avêtine rûbarî. Her êkê hintke şekir dana ser devê wan avêtine rûbarî û xwîşka xwe go kired kevilekî da, kevilekê hirçê go p'ser derê xanî vekir. Go kevilek nav dera xanî ve hilawîst go xwîşka xwe kire tê da haşa du kûçkêd seya jî îmandin danade def jinkê go eve eyalê wêne. Heta zelumê wê hatî. Zelum têt berêxwedidetinê ku hal û qese evene go: "Eve çi ye?" Gotê: "Nê hema willahî eve eve ye." Be çav xwîşka xwe nerabû go we lê kir. Go ew jî rabû go dê baş e. Go rabûn go ha iha vêca niza wî an êkî e d'bêm zelumê wê bû. Hûn ha iha dê j'wêrê înine derî ben û kefikên û ewêdîken û wa kûçka jî hûn na kujin dê ben berdene çolekê hêlin û hên. Ha iha min eyalê ê ji hewe d'vêt. Eve çavêd hewe pênerabûne.

Go ew berê xwedidenê j'malêd wan û wêve pê da avahîkekê çêkirî bo xwe du biçûkêd tê ve. Vêca ekî bo xwe girtibûn. Aşvanekî pêçolka wan girt du biçûkêd tê da. Gotê qurmê darî ye. D'bet danîte piştî agirî go têhna agirî ho lê da (be yên j'abvê girtîn) bu nîze nîza însanî tê da. Nûze nûzek jê hat. Go: "Willahî hurmetê vî qurmî

hema wesa nasojim e dê bem bivirekî lê dem kirmkêd tê da guneh in.” Go ew d’betin l’nav derê bivirê xwe hildgirît go derê wê vedbît. Go berêxwedidetê du biçûk in. Go kire qêrî were gotê: “Xwidê mirada me hasil kir. Me çi biçûk nînin Xwidê mirada me hasil kir.” Birine mal. Go: “Dê rabe hêj zû wan b’ava gerim bişo.” Feqîr in yê l’ber aşî ne eyal e ne çi. Go ew jî radbît destavêtinê serkê biçûka d’şotin. Kurkî d’şotin zêr jêvedbin, kiçkêd d’şotin zîv jêvedbin. Go: “Ya Rabbî me gele j’te minnet e, eve çi ye. Go ya Rabbî eve ya te ya me te nedaye kesê.” Radbin wan biçûkan xwidandiken. Spêdê, êvarê û nîvro serka wan d’şon bo xwe tijî wêrê zîn û zînetê jê tînin. Ew jî fehmakdibin d’çine nav eyalî, hindek dibênê: “Dê here, day teraşêd bab gûnî, herin gotê hûn l’vêrê nabin hûn j’kîrê hatîne, hûn ê j’avê girtîn.” Go biçûkî kire giri herduka go hatin û gotinê: “Em l’vara nabîn û dê bo me bêjin ka em j’kîve hatîne?” Go hindî dilê wan ma pêve go: “Willahî hûn neku Xwide hema hûn êd dayne me. Me hosa hûn êd dîtîn, em nizanîn hûn ji kîve hatîne. Me hûn ê j’bo xwe j’avê girtîn. Em çiddî jî nizanîn.” Go: “Wila em jî dê çîn l’dûv qedera xwe gerhîn.”

Go vêca rabûn û çon. Çone ka j’mamleketê wan wê ve kî ve. Ew radbin bo xwe xanîkekî çêdken û her ro destê êk û du d’şon û bo xwe tiştê lêkden û zêr û zînetî. D’ben dene alemê. Qesrek çêkir bo xwe, qesra wî j’ya babê wî pêlil. Tê çin dinêrinê eve çi qesre? Eve qesra filan kesî ye. Ya Mirza Mihemed e. Ew jî go jinka xaleta wî go ya bîj bû. Gotê te nevêtin eve ew bin ho lê hatîne he. Radbîtin çîtin lê dibîte mêhvan, lê dibîte mêhvan kurik ji wê ve têtin bezîtine xwe d’ketine ewîdî ya malê, filan û bêhvan avê l’destê kurkî d’ket gir zêr jê dirîşin. We li kiçkê diket gotê wey be b’Xwidê wekîle eve ew in. Eve xarzeyêd min in. Go ewê jî her ro hindek bo xwe jê ewîdikirin û îlaw hat û cab gerha go ew qesra kê ye l’wêrê yê biyanî hatiye wêrê ew qesir çêkirî ca ka çend zeman pêve çu hatiye rasta ya paşay. Ew jî d’çite wêrê benê ew bizanîtin eve eyalê wî ne ben dayka wî ya l’def zalamê xwe. Dê bêjîtinê eve biçûkêd min êd holê kirîn.

Go ew jî d’çite wêrê d’bêjîtinê: “Qesra hewe xweş qesr e belê vê qesrê tiştêkê jê kême e.” Go: ê çiyê? Xarza wê gotê. Gotê: “Şaxêd fil û kerkedana ne.” Go: “Vêca şaxêd fil û kerkedana çi ne?” Go: “Ewêd eve çêkirî, ev qesre çêkirî ew l’wî sanahî ye ew dê çit înit û hêt.” Go ew jî rabû go: “Be ku bikeyn?” Rabû hinde nan bo pat û teniştêd wê werkir û kired nivîna ra go hekû têtin derî lê neveke bêjê tu dê vê miradê

bo min hasil key heke ez dê mirim. Go birakê wê jî rabû j'nêçira d'hêtin û keyfxweşiya xwe têtin dê derî veket. Bira derî veke ho d'zivirît qir qira nanî ye, ho d'zivirît qir qira nanî ye. Go: "Bira perasiyêd min hemî şikestî ne neşemê derî vekem. Ka çi bû avête ber wî bo xwe der vekir û hat." Go: "Te xêre?" Go: "Bira hal û qesêd min eve ne. Belê heke tu miradeka min a hey heke tu mirada min hasil key e dê çêbim." Go: "Çi mirade?" Go: "Tu dê çi şaxêd fil û kergedana îni bo vê qesrê." Bira şaxêd fil û kergedana l'kîrê ne bo xatra Xwidê, ez nizanim, ez biçûkim ez tizanim dê kîveçim. Ne ne îllah tu dê çiyê. Ew rabû ço.

Go ço nik pîremêrekî dîted rêka wî da. Gotê: "Dê ku key?" Go: "Wila xwişka min a nesaxe, hal ûqesêd wê eve ne. Yê gotî şaxêd fil û kergedana ne îni bo qesra xwe e dê mirim." Wî jî gotê: "Willahî eve sêhre êk l'vê d'ketin. Hema guhê xwe nedê dê telifî dê te kujin mala te, hizarêd çoyne rêka nehatinaveyê ye. Yêd çoyne nehatîneve." Go ewî gotê: "Benê çenabî." Go: "Dê here, here heft dewara j'xwê barke û heft dewara j'doşavê barke bibe û here. Herew herew herew wêrahenê binê wan bîya. Tu d'bînî wê sehra yê, wan bîya, wî çîmî, wî şewrî, wî bîşa, gotê herê. Go dê bey dê quleteynka çêkey, dê ji wara ewêdîkey, radey radey radey axê, dê xwêya xwe keyê û dê wê doşavê jî her batmaneka xwêyê keyê meşkeka doşavê keye ser. Go wara çêke vêca hekû hatin fil û kergedan dê hên, cihê wan e. Dê hêne ser dêxwen, dêvexwen, dê wê xwêyê xwen wê doşavê xwen, dê dil lê sişît neşên çi l'te biken. Tu dê kujî ka do bo xwe şaxêd wan ku îni." Go: "Dê bila Xwidê ji te razî bî." "Belê rêka nehatîneveyê ye bo xwe gele dua bike."

Go ew jî radbî û d'çîtin wetket hekû zelumî we gotîyê. Go d'çîte ser dareka bilind hindavî wan berêxwedidenê go hatin aaa! gamêş hatin, hemî hatin ketine ser wa xwê wa ewêdiya û her xwar û her xwar wergerhane wara hemî. Go ew ço b'nav ket hindek kuştin û şaxêd fil û kergedana jêvekirin û îandin. Îandin û hat gotê: "Tu hati b'silametî?" Go: "Herê ez hatim." Go: "Dê here belê çi carêd dî nehêye vê rêkê. Çimkî ev rêke yerer tê nîne, rêka mirinê ye, dê tu pûçbî, dê te xwen, dê te kujin." Go: "Ew çawa?" Go: "Belê wila." Go ew ço kired wêrê da, şaxêd wa b'wêrê vekirin û go ço.

Go ço heyamekêdî jinik d'çît nêrîtinê wey babo! Benê yê hatî ev qesre deha j'yadî lawtir bû, j'yaberînihe lawtirê lêhat. Go: "Da bo te bêjim cana min." Go: "Dê."

Go: “Dê rabe eyn tu dê wel xwe keyeve tiştekekêdî ye j’qesra hewe kême.” Go: “Çi ye?” Go: “Teştka reqasker e, kirasê reqreqî.” Go: “Ma l’kîve ye?” Go: “Heyy ewê eve îrandî ew l’wî b’sanahî ye.” Go ew jî radbîtin d’çîtineve têtin eyn we d’ketin b’wî sîfetî birayê wê d’bêjîtê: “Eve çi ye?” D’bêtê: “Willa miradeka min ya hey heke tu ne çi bo min teştka reqasker û kirasê reqreqî bînî b’Xwidê gotê ez neşem e dê mirim.” Wila gotê Xwidê ya înaye serê min. Benê ez bêxeberiya xwişka xwe nakem.

Rabû çove pîremêrek têtin yê serê wî ya spî hate nava rêkê go: “Eve tu dê ku keyeve?” Go: “Dê ku kemeve?” Go: “Herê.” Go: “Willahî dê çim yê gotiye min dêçî teştka reqasker bo min îni û kirasê reqreqî.” Go wî jî gotê: “Willahî eve rêka nehatinaveyê ye. Hema b’zivire guhê xwe bide min.” Go: “Ne dêçim.” Go: “Dê baş e dê here. Belê willahî hekû tu çoy dê dehil û dir û gurg û hirç û nehundir dê kevine d’rêka te da. Hekû tu çoy ewilî dê çî gehîye gurgî û mihê. Gotî dê çî nêriye gurgî û mihê. Go hindî mihe goşt êl berdevî, hindî gurge gîya yêl berdevî. Tu dê wî gîyay rakey danîye ber serê mihê, goştî danîye ber serê gurgî. Tu dê çiyê erdekî dehl û dir in, tu dê taze wî dehlî hemê tiraşî, hemmê dêbirî. Tu dê çiyê erdekî kahniyek e dê kevîtet rêka te da ew kahnî hekû tu j’wê ve hatî dê bîte behir. Kanîyeka kêmandavê ye (haşa yê hizûra hewe), ya zehîrê ye. Go tu dê sê mista j’wê avê vexwey û dê here yexera te xêr bît vêca ka tu d’hêy jî an ne. Tu dê çî hekû te wekir ew hemî sêhr in, ewêdî ne dê vebîtin hema dê çî ewêdîyek êl wêrê, dêwek êl wêrê d’wê qesrêve. Wextê tu pêşdikevî dê sîrên kevînte şîred wî. Be ma şîrê wî yê hazir e dê serê te birît.”

Ew jî radbîtin d’çîte def mihê gîya d’danîtine ber û bo gurgî goştî d’danîte ber û d’çît wî dehlî hemê d’tiraşî û paqijdket û d’çîte wê kahniyê sê mistêd ava wê vedixwet ew jî çîtin yê b’wêrê ve dê îni û hêy. Ço teştka reqasker û kirasê reqreqî j’wêrê vekir û hat. Go wextê îrandî hatî go sîrên ketinê, go sîrên ketinê yanî ku em birîn. Têtin rê l’ber vebû hat, l’hespê xwe sîyarbû hat, dêwî da dûw da behrê gote behrê: “Bigire.” Go: “E nagirim.” Go: “Bo çî tu nagirî?” Go: “Eve hinde sal û zemanê ezê d’vê rêkê da însanî av ji min nevexwarîye evî însanî av a jin min vexwarî.” Go behir nebû behir. Go ço go: “Dehlo bigire.” Go: “Willahî eve hinde sale ev dehle yê diruste go çî kesî nebirîye gotî ewî ez ê tiraşîm, nûjenkirîm e nagirim.” Ço ber go: “Mihê gurg bigirin.” Go gurgî go: “E nagirim eve hinde sale

goşt ê l'ber serêw mihê gîya yê l'ber serê gurgî te goşt nedanaye ber serê min da ez bixwem willahî ez nagirim bila b'xêr û şahî biçît." Ew jî çò ew camêr çove serê wî. Go: "Hêdî nehêy eve dûmahîk bît." Go: "Bila." Ew jî çove mala xwe xwîşka wî gotê: "Tu hatî bira?" Go: "Erê wila ez hatim." Go: "Be bira ez jî çêbûm." Go: "Dê baş e tu çêbûy ew jî emrê Xwidê ye." Teştka reqasker pêvekir û kirasê reqreqî jî yê reqasê d'ketin yêd strana bên û ...

Go ew jî rabû carekadî ka çî middet pêveço xaleta wî hateve j'talbey kiçkê. Zanî ku kurkê çoy j'mal gotê: "Aha eve xweş qesr e û eve xweş e belê tiştêkê dî jî yê jê kême." Go: "Ew çî ye?" Go: "Ew jinkeke navê wê Milhem e." Go: "Aha ewa jê kême e." Go: "Ca Milhem a l'kîrê?" Go: "Ya l'adê heft behra." Go: "Be ew ê l'kîrê ye dê ku şet çîtê, birayê min dê telifitin b'Xwidê ez navirêkemê." Go: "Virêke her bo hewe baş e. Rabeve eyn hiştî berê l'xwe bike û bêjê tu dê çî." Ew jî radbît carekadî hinde nanê tîrkêd pêjît û tavêted teniştêd xwe reqdibît û hodket qir, hodket qir qir: "bira willa vê neqlê e dê mirim." Go: "Ew çawa?" Go: "Belê miradeka min a hey heş nihe heta ku hindî tu yê sax bila ez bimirim jî sed gorî rehma Xwidê tu bo min hasilke." Go: "Çî ye?" Go: "Mirada min ew e ku biçî piştta berê ker, pişt adê heft behra bo xwe vê jinkê tu bînî." Ewî jî go: "Bira nê me yê gulêbûy çî kesê çò wê rêkê nehateve, însan d'bite ber, b'milyara yêd çoy yêd bûyne ber." Go: "Ne tu dêçî".

Ew jî radbît singekî l'dîwarî d'kutît, şîrê xwe go d'kete dîwarî ra, dîwarê qesrê. Go: "Çî gava çipka xwînê ji vî şîrî ket tu bizanî ez çom" gote xwîşka xwe. Ewê jî go: "Dê baş e." Ew jî rabû çove nik zelumê xwe ve. Go: "Eve tu hatiyeve?" Go: "Erê wila ez ê hatim." Go: "Eve çî ye?" Go: "Wila hal û qesêd xwîşka min eve ne." "Kuro willahî go eve êke we lédket. Xwîşka te b'xwe wenaketeve. Yê l'telaftina te d'gerhin êkî tu nevêy lewa yê ho l'te d'ken." Go: "Ma ez ku b'kem, xwîşka min ezê xûdankirîm heta vî yaşî mirada wê ew e dê mirît û çît." Go: "Bila bimirît, dê her mirît." Go: "Be tu dê her çî?" Go: "Belê." Nihê gotê: "Ewêd he du rêkin. Du rêkin êka rohn e êk ya tarî. Ew rêka tarî ew rêka nehatinaveyê ye e bawernakem tu bihêy belê here Xwidê d'zanît tu nahêy. Belê heke ewêdîyek bo te hebîtin baş e, tiştêk l'te miselletbibît go heke tu yê çoyî yî rêka te ya tarî ye." Go: "Ê dê ku kem?" Go: "Dê çî filan bîşî, go dê çîye bîşekî gotê kahnîyeka avê ya l'wêderkê kahnîk e ha heywanet û filan û bêhvan têne ser û rêvingêt wê rêkê jî d'çine ser wê avê, avê l'wêrê vedixwen.

Tu dê çiyê wêdirê cihekî bo xwe çêkey, cihekê law çêkey xwe keyed xîzî ra û tu dê nişterekê jî bo xwe bey. Nabeynekê şêrek dê hête vêrê eve hinde sale pê wî yê arha ye pê xwe dikete wê gerê da. Tu jî dê j'hêreve wê nişterê l'binê pê wî şêrî dey peqînî, dê derkey. Dê derkey û vêca b'hivya Xwidê hey şêrî tu xwarî hey nexwarî. Be eve dê çî ye wêrê jî benê e b'xwe d'zanim heçkêd çoy nehatîneve.” Go ewî jî gotê: “Dê b'hivya Xwidê.”

Ew jî çî şertêd wêrê jî nîşadan camêrî rabû çî çî wêrê bo xwe cihekê nepenî çêkir xîz û gil û gîya filan kulo çêtêra belçem û filan û bêhvan xwe da kirin zixtê xwe jî çêkir hinda kaniya avê. Go şêr têtê wêrê pê xwe d'kete d'avê da horonêd wî yêd çine esmana ber pê wî. Go pê xwe d'kete d'avê da nal nala şêrî ye her Xwidêwo tu d'zanî. Go ew radbîtin hêdîka j'ewêdîve be şêrî pê xwe yê dirêjkiryed avê da wekî yê wergerhaye wêrê pîreşêrek e. Go radbîtin wî zixtî we nişterê l'binê pê wî det go ewî qêriyek rahêla wî jî gotibûyê j'qêriyêd wî netirse hekû d'kete qêrî tu dêbiçî baş ê l'ser hemdê xwe be. Ewî jî şehdeda navê Xwidê û pêximbera îna gotê: “Ya Rabbî benê ez ê b'hivya te ve.” Piştî hîngê bêhna şêrî hat quleteyna wî tijî xwîn bû tijî kê m û adav bû şêrî pê xwe hilkêşa bin xwe haa yê ewêdiya jê d'avêjît. Heta bêhna wî hatî bêhnekê nivist rabû kire qêrî. Go gotê: “Ew Îsanê hatî ev derde bo min l'min derman kirî derkevîne meydanê were pêş min ka tu çî insanî eve hinde sale pê minê arhaye l'vêrê eve min nedîtiye çî kesê ev qencîye l'min kirî tu derkeve da ez qenciya te l'ser xwe rakem.” Go du, sê cara lêkire gazî derket û go: “Eve tu hatî dê bo xwe çî ye filan tiştî?” Go: “Belê.” Go: “Dê here yexer bît bo te. Rêka te ya vekirî bît belê ez bawer nakem tu bizivirî belê hema tu jî here.”

Go Rabbê alemê rêka wî vekir çî çî çow wêrê beneşênê xwe bigehîninê be biçîtin derê wê veket ya kere, ya l'pişt berê ker. Go ew jî d'çît hindî lê d'kete gazî caba wî nadet. Lêkire gazî heta çoka bû ber, lêkire gazî heta navkê bû ber gazîya dûmahîyê xilasbû berê jinkê l'şîrê birayê wê çipka xwînê ket. Go jinik rabû hespekê dî bo xwe diruskir û ew jî rabû û çî. Çî nik wî şêrî nik wî zelumî go: “Eve tu yî ho d'keye he, go eve êke ez lomeyêd te nakem, êkê ho l'te d'kete he. Heke tu b'xwe niza.” Go: “Dê here dêçî filan erdî, filan cihî, dê çî b'izniha Xwidê tu dê zivirî. Tu dê gelekan jî l'gel xwe î nî. Go birayê te jî şînu yê ewêdî kirî, hêj berê wî nihe yê germe. Yêd dî nilxwe girtîbûn, hema şexsiyeta wî nihe yê baş e.” Go ew jî rabû çî ni wî şêrî

go: “Tu xwîşka Mîrza Mihemedî?” Go şêrî jî dengê nekirê hema ço. Go ew ço ço derê mala wê “ooo! Melhemê, ooo! Melhemê!” Go Melhemê cara sê gotê: “O”. Vêca heta navkê bû ber. Go: “O qurreder û jehremar, Xwidê qehr l’te kiryê, Xwidê tu kuştîyê tu derkeve vêrê berexebdê vê heyhetê vê senteneta Rabbê alemê daye vêrê. Go çi heqê Xwidê ye?” Go wila jinik derket go: “Min hay ji çi tiştî nîne.”

Vêca go jinik rabû menceleka avê kelkir go çipik l’wan beran reşandin hemî go rabûneve. Go rabûn wî go wila Melhem bo min e, wî go bo min e, wî go bo min e. Go jinkê go: “Willahî we billahên Xwidê ne ez bo wî me ye xwîşka wî hatî. Çi kesî j’heve xwîşkêd hewe dûvda nehatîne daykên hewe nehatîne hema hûn da d’we jî bina belê hema min ne hema bila j’vê ezabê derkevin.” Sêhr lê kirbû, sêhr bû. Ew jî rabûn û sîyarbûn û hatin hatine hatine def şêrî, şêrî rê dayê, hatine def ewî sofî gotê: “Dê herin nê eve dumahîk bît çi ca ho nekenehe. Go dê gelekêd dî hêne sera te hay j’xwe hebî. Go eva l’gel te ya b’aqile” şikra wê jinkê.

Ew jî rabûn çone wêrê dê hêvew dê hovew daweta wî kir û go: “Eve çi daweta babo l’wêrê eve çi ye” paşay go. Eve ku d’bêne vî, eve çi tişte? Go jinik agir berbû bin dest û pêd jinkê û xwîşkêd wê. Go benê eve hemî wê jina he ya kirî wê jina nehazir ev tişte yêd hatîne vê sevîyê. Û heke paşa jî bizanît dê wê kujît. Go ew rabû dê hêvew hove go wila daweta wan kir û nav gerha go wila kurê paşa ye. Be zanî. Jinkê û xwîşka mêrkî go: “Em dê rabîn paşay gazîkeyn.” Go ew jî radbin paşay gazîdken go: “Belê dê jina xwe ya biçûk întin. Dê b’jinik ve hêtin.” Go: “Bila.” Go gazîdken û çin û bo zadî dirûstken û filan d’ken û bêhvan d’ken niza an paşay berî ew gazî kirin e dibêm paşay berî ew gazîkirin.

Ew jî radbin û d’çin û gotê dê em dê çîne wêrê gote kurê wî: “Em dê çîne wêrê belê tu hişyarbî kewçkê xwe l’zadî nede heta e dibême hewe. Go: “Bila.” Go: “J’ber tişteki em êd gazîkirîn.” Go: “Hişyarbî go zadî nexwe hata ku e d’bêjim.” Ew jî radbîtin têşka kêtkê d’kete berîka xwe da û d’çîtin. d’çine wê derkê zadî d’înin û xweşbej û xweşkêş filan û bêhvan êk û dû naniyasin. Nizanin ka çi kesin. Dest avêtê zad bo îna go: “Dê keremken.” Gotê: “Dê hûn berî zadî bixwen edetê me nîne îlla mêhvan berî me b’xwen.” Go: “Mêhvan berî bixwen” go hema kêtkê j’berîka îna derî berda ser zadî. Ew zadê kêtik lê gerha, lê gerha her êkê hindek jê xwar û çi lênehat, hat ji ya kurkî xwar kêtik hema vetezî kete erdî. Go ew jî rabû go: “Nihê hûn

ev bêbexte ne.” Go: “Bedê rawestin e dê hewe gazîkem.” Ew rabûn çon cara pâşatirê filan bêhvan ew gazîkirin. Go werin da biçîn zadî bixwen.

Ew jî rabû gazîkirne zadî go: “Belê hûn dê b’qas û amêd xwe, b’jinikve, b’kiçve hemî dêhên.” Go ew jî rabû çon eyn dîsa têjkaka kêtkekê d’hilgirîteve ew jinik. D’hilgirîtin ew jinik. Wextê hatîn go: “Dê keremken û zadî bixwen.” Wan dest avêtê keçkêd xwe hilgirtin newêran bixwen. Go zadî bixwen go wan destavête keçkên xwe kêtik jî berda kêtik ho hat, ho çon, ho hat, ho çon ne çon ser çon zadî û çon ewan jî destavêtê têr zadê xwe xwar. Bêjin ka eve çon ye? Vêca her gavekê da bêjiita jinkê: “Aha be eyalêd te çon bû te gavekêd go ho ye ho ye.” D’go: “”Camêro xwe l’ dumahîkê bigire. Xwe l’ dumahîkê bigire belkî Rabbê alemê tiştêk d’erdekî ra derkevîtin.” Go ew jî radbîtin: “Ka teştêka avê bo min bînine vêrê wê jinkê ewa bo xwe înanî kurkî.” Înanê wêrê go: “Dê were dada min destêd xwe bişo.” Go destêd xwe şotin go hema zîv jêketine erdî. Got zelamê xwe: “Destêd xwe bişo te zadê xwarî.” Ewî jî destê xwe şuştin rexekî zêr ketin rexekî zîn. Go: “Eve çon ye?” Go: “Aha eve eyalê te ye.” Jinik jî hekû d’bêjin miroveka Xwidê bû Melhem. Go ewan jî destavêtê ewî jinkêd xwe her dukêd dî niza ku lêkirin, kuştin. Ew b’eyal ve, b’ewêdi ve vêca jinka biçûk bû ewêdi ya wî. Vêca wextê b’pêşketi her gavekêd go: “Ooxx bêhna day û weleda ya d’hêt.” Wextê da hêna mala wan.

Wextê da hêna mala wan hêj ew jinkad wî pîstî da bû. Go hatine wê rastê go her ya d’bêt ooff bêhna day û weleda ya d’hêtin. Ew yêd çon şunkekî lêdiden çon day û weledin weledêd te ewin gel te. Go ew radbîtin bêjinê ka ew çon kese b’wêraheve j’wêrê veken. Vêca wê jinkê eslî ya birî şuştî û veşuştî cilêd xatûna û ewêdiya yêd kirîne ber înay danaye nava dîwanê. Vêca l’pêş wê kêtik berda ser zadê wan kêtik pêmir. Axirkî pêk hatine derî ew ewladêd wên e. Vêca min jî qesek hêla hizar rihme l’hewe û deybabên hewe.

Vebêjer: Rukiye Duran

KURTEJİYAN

Agahiyên Kesane

Nav Paşnav: Yasin DURAN

Cih û Sala Jidayikbûnê: Çel/Colemêrg. 1989

Perwerde

Lîsans: Zanîngeha Marmarayê Beşa Mamostetîya Erdnîgariyê/Stenbol

Lîsansa Bilind a Bêtez: Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê Enstîtuya Zimanên Zindî yên
li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Zimanê Biyanî: Ingilîzî

Tecrûbeya Kar

Mamostetîya Erdnîgariyê:

2013-2016 Lîseya Anadolu Îmam Xetîb a Hîzan Saîd Nursî

2016-2017 Lîseya Anadolu ya Bitlis Tahsin Barutçu

2017 heta niha Lîseya Anadolu Îmam Xetîba a Kîçikan a Gürpınar Necip Fazıl
Kısakürek

Têkilî

Telefon: (0) 531 695 45 50

E- Maîl: yasinduran30@gmail.com

Dîrok: 20.06.2019